# HÎNKER

## Asta Duyemîn

Ronayî Onen | Samî Tan

ENSTÎTUYA KURDÎ YA STENBOLÊ

# NAVEROK Û PLAN


| UNÎTE | MIJAR | RÊZIMAN | ARMANC | PEYV |
|---|---|---|---|---|
| Destpêk | A- Alfabe r. **4**<br>B- Danasîn r. **6** | 1-Cînavkên kesane (xwerû/ tewandî)<br>2- Qertafên kesane<br>3- Qertafên nebinavkirinê<br>4-Veqetandek (binavkirî/ nebinavkirî)<br>5-Tewang<br>6-Heye/hene<br>7- Daçek | Bikaranîna mijarên rêzimanî yên mîna cînavk, tewang û veqetandekê ye. Bi vê yekê re dê karibin xwe bidin nasîn. | 1- Peyvên têkildarî hevnasînê |
| 1 Bibîrxistin | A- Jiyana rojane r. **12**<br>B- Ez dixwazim r. **18**<br>C- Tenduristî r. **20** | 1-Dema niha<br>2- Xwestin<br>3- Karîn<br>4- Gihanek<br>5- Divêtî<br>6- Raweya fermanî<br>7- Bilanî | Dubarekirina hin mijarên di pirtûka yekem de | 1- Peyvên têkildarî jiyana rojane<br>2- Peyvên têkildarî jiyana gund |
| 2 Plansazî | A- Tu yê sibe çi bikî? r. **24**<br>B-Tu yê havînê çi bikî? r. **29**<br>C- Tu dixwazî siberojê çi bikî? r. **30**<br>UNÎTE 2 - SPARTEK r. **32** | 1- Dema bê<br>2-Piştî ku<br>3- Berî ku<br>4- Dema ku | Bikaranîna dema bê | 1- Peyvên têkildarî plansaziyê<br>2- Lêkerên hevedudanî |
| 3 Pêşbînî | A-Siberoj r. **36**<br>B- Ez dikim…r. **40**<br>UNÎTE 3 - SPARTEK r. **42** | 1- Dema bê<br>2- Dibe ku<br>3- Heke / ku<br>4- Dema bê ya nêzîk | 1- Bikaranîna dema bê<br>2- Bikaranîna hevokên mercê. | 1- Peyvên têkildarî xweza û hawîrdorê<br>2- Lêkerên hevedudanî |
| 4 Duh | A- Te duh çi kir? r. **44**<br>B- Azad çû pirtûkxaneyê r. **48**<br>C- Geşt û seyran r. **49**<br>UNÎTE 4 - SPARTEK r. **50** | 1- Dema boriya têdeyî | 1-Bikaranîna dema borî | 1- Peyvên têkildarî çand û hunerê<br>2- Peyvên têkildarî geşt û seyranê |

# NAVEROK Û PLAN


| UNÎTE | MIJAR | RÊZIMAN | ARMANC | PEYV |
|---|---|---|---|---|
| 5 Serborî | A- Baran bariye *r.* ***54***<br>B- Tu qet çûye Wanê? *r.* ***56***<br>C- Dema ku *r.* ***58***<br>D- Dema em zarok bûn *r.* ***60***<br><br>**UNÎTE 5 - SPARTEK** *r.* ***62*** | 1- Dema boriya dûdar<br>2- Dema boriya berdest<br>3- Dema ku / Gava ku (demên borî) | 1- Vegotina serpêhatî û demên berê | Peyvên têkildarî xweza û jiyana gundan |
| 6 Rojên Berê | A- Serpêhatî *r.* ***64***<br>B- Bûyereke ji dîrokê *r.* ***66***<br>C- Kesayetiyek *r.* ***67***<br>D- Çîrok *r.* ***68***<br><br>**UNÎTE 6 - SPARTEK** *r.* ***70*** | 1- Ravekên rêzîn<br>2- Cînavka girêkî "ku"<br>3- Çîrokiya dema boriya têdeyî | Vegotina serborî, çîrok û bûyerên berê | 1- Lêkerên hevedudanî<br>2- Peyvên têkildarî şer |
| 7 Cih û War | A- Cîhan *r.* ***76***<br>B- Alî û bergeh *r.* ***77***<br>C- Bajar *r.* ***78***<br>D- Taxa me *r.* ***81***<br>E- Ravekirina cih *r.* ***82***<br>F- Avahiya me *r.* ***83***<br><br>**UNÎTE 7 - SPARTEK** *r.* ***85*** | 1- Daçek | 1- Bikaranîna daçekan<br>2-Danasîna derdorê<br>3- Ravekirina cih | 1- Peyvên têkildarî alî û bergehê<br>2- Peyvên têkildarî derdorê |
| 8 Ragihandin | A- Dîroka ragihandinê *r.* ***90***<br>B- Kompîtur û înternet *r.* ***94***<br>C- Weşana bi kurdî *r.* ***96***<br><br>**UNÎTE 8 - SPARTEK** *r.* ***100*** | 1- Avaniya tebatî demên borî<br>2- Avaniya tebatî dema niha<br>3- Avaniya tebatî dema bê<br>3- Avaniya tebatî Raweya merc û daxwaziyê | 1- Bikaranîna avaniya tebatî | Peyvên têkildarî ragihandinê |
| Pêvek | Lêkerên xwerû *r.* **104**<br>Lêkerên pêkhatî (-în) *r.* **105**<br>Lêkerên pêkhatî (-andin) *r.* **106**<br>Lêkerên pêkhatî yên ku bi pêşgiran çêdibin *r.* **107**<br>Bersivdank *r.* **108**<br>Taybetiyên zimanê kurdî *r.* **122**<br>Dengên kurdî bi alfabeya navneteweyî ya fonetîk (IPA) *r.* **128** | | | |

# DESTPÊK

- Alfabe
- Danasîn

## A- Alfabe

**Tîpên girdek**

A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z

**Tîpên hûrdek**

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

**Tîpên dengdar**

b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z

**Tîpên dengdêr**

a e ê i î o u û

**Pevdeng**


xw


| | |
|---|---|
| A a | agir, av, ax |
| B b | baş, beyanî, aborî |
| C c | cîran, îcar, cih |
| Ç ç | çav, çar, çente |
| D d | dev, derî, dep |
| E e | erd, zer, ewr |
| Ê ê | êzing, êvar, kêr |
| F f | fêrgeh, berf, heft |
| G g | gore, gul, gir |
| H h | hefte, heval, guh |
| I i | incas, diran, bivir |
| Î î | îro, dîk, derî |
| J j | jin, jêbir, roj |
| K k | kevok, hêk, kum |
| L l | lênûsk, lêv, pel |
| M m | mal, mamoste, dem |
| N n | nan, hinar, deng |
| O o | ol, pol, to |
| P p | pêl, pênûs, peyv |
| Q q | quling, qenc, qad |
| R r | roj, tor, şêr |
| S s | sêv, hesin, mase |
| Ş ş | şev, şimik, aş |
| T t | tîp, tembûr, met |
| U u | utî, gul, du |
| Û û | ûr, şûr, tû |
| V v | vizik, av, çav |
| W w | werdek, dew, kew |
| X x | xelat, ax, xanî |
| Y y | yek, peya, yar |
| Z z | zîv, zêr, kezî |
| XW | xwendin, xwe, xwê |


A- agir


B- beq


C- cotkar



Ç- çav


D- derî



E- zer


Ê- êzing



F- firoke


G- guh



H- hesp


I- tivir


Î- îsot


J- jûjî



K- kew


L- lepik



M- masî


N- nan



O- por



P- pel


Q- quling


R- roj


S- sêv



Ş- şeh


T- tirî


U- gul


Û- tûreşk


V- av


W- werîs


X- xanî

1

Y- yek


Z- zebeş

## Hevrûkirina deng û tîpan

| E | Ê |
|---|---|
| ker | kêr |
| zer | zêr |
| der | dêr |
| şer | şêr |

| U | Û |
|---|---|
| du | dû |
| tu | tû |
| kur | kûr |
| kuçik | kûçik |

| I | Î |
|---|---|
| jin | jîn |
| şiv | şîv |
| pir | pîr |
| dil | dîl |

| V | W |
|---|---|
| dev | dew |
| ev | ew |
| vir | wir |
| vî | wî |

**XW**

xwarin, xwîn, xwişk, xwedî, xwelî

## B- Danasîn

# Hevpeyvînek bi Dîlanê re

*Xwendekarekî dibistana amadehiyê ji bo kovara dibistanê bi Dîlanê re hevpeyvînekê çêdike.*



| | |
|---|---|
| **Xwendekar** | Dîlan, tu ji ku derê yî? |
| **Dîlan** | Ez ji Wanê me. |
| **Xwendekar** | Tu çend salî yî? |
| **Dîlan** | Ez hejdeh salî me. |
| **Xwendekar** | Çend xwişk û birayên te hene? |
| **Dîlan** | Xwişkek û birayekî min hene. |
| **Xwendekar** | Tu dikarî qala wan ji me re bikî? |
| **Dîlan** | Belê, navê birayê min Serhat e. Ew xwendekar e. Ew şazdeh salî ye. Ew xortekî bi bejn û bal e. Navê xwişka min Pelîn e. Ew deh salî ye. Ew keçeke xwîngerm e. |
| **Xwendekar** | Dê û bavê te çi karî dikin? |
| **Dîlan** | Bavê min parêzer e. Diya min jî bijîşk e. |
| **Xwendekar** | Tu dikarî qala wan jî bikî? |
| **Dîlan** | Belê, navê bavê min Rodî ye. Ew zilamekî dirêj û qelew e. Ew mirovekî zana ye. Navê diya min Dilşa ye. Ew porsor û çavreş e. Ew jineke jîr e. Dapîr û bapîrê min jî bi me re dijîn. Navê dapîra min Xecê ye. Ew jineke zarşêrîn e. Navê bapîrê min Qenco ye. Ew mirovekî bîrbir e. |
| **Xwendekar** | Gelek spas ji bo agahiyan. |
| **Dîlan** | Spasxweş. |

### 1- Li gorî hevpeyvîna li jor cihên vala dagirin.

Dîlan xwendekara dibistana amadehiyê ye. Ew ________ salî ye. Ew ji __________ ye.
Navê bavê wê __________ ye. Ew parêzer e. Ew dirêj û qelew e. Navê diya wê __________ ye. Ew bijîşk e. Ew jineke jîr e. Xwişkek û birayekî Dîlanê hene. Navê xwişka wê __________ e. Pelîn deh salî ye. Navê birayê wê ________ e. Ew xwendekar e. Ew xortekî bi bejn û bal e.
Navê dapîra wê __________ ye. Ew jineke zarşêrîn e.
Navê bapîrê wê __________ ye. Ew mirovekî bîrbir e.



| Cînavken kesane yen xwerû | Qertafên kesane / lêkera bûnê |
|---|---|
| Ez | im / me |
| Tu | î / yî |
| Ew | e / ye |
| Em | in / ne |
| Hûn | in / ne |
| Ew | in / ne |

**Mînak**

Ez bîrbir im.
Tu bîrbir î.
Ew bîrbir e.
Em bîrbir in.
Hûn bîrbir in.
Ew bîrbir in.

Ez zana me.
Tu zana yî.
Ew zana ye.
Em zana ne.
Hûn zana ne.
Ew zana ne.

**Tu kulîlk î**

Tu kulîlk **î** tu nazik **î**
Tu delal **î** pir xweşik **î**
Li min awiran zêde dikî
Birîndarê te **me** yar
Evîndarê te **me**

Tu kulîlka nav baxça **yî**
Hem xwenda **yî**, hem zana **yî**
Tu ji bo min pir hêja **yî**
Birîndarê te **me** yar
Evîndarê te **me**

## 2- Valahiyên li jêr dagirin.

**1-** Zelal jîr ____.
**2-** Azad ji Amedê ____.
**3-** Ez tî ____.
**4-** Em heval ____.
**5-** Taxa me mezin ____.
**6-** Tu jêhatî ____.
**7-** Dapîra min nexweş ____.
**8-** Hûn ji ku derê ____?
**9-** Hevalên min dilovan ____.
**10-** Xwişkên te delal ____.

| Cînavken kesane yên tewandî |
|---|
| Min |
| Te |
| Wî (nêr) |
| Wê (mê) |
| Me |
| We |
| Wan |

**Mînak**

Birayê **min** xwendekar e.
Apê **te** zana ye.
Xalê **wî** bijîşk e.
Xaniyê **wê** mezin e.
Mamosteya **me** baş e.
Hevalên **we** jîr in.
Mala **wan** biçûk e.

## 3- Valahiyên li jêr dagirin.

**1-** Xwişkeke min heye. Navê __________ Rojda ye.
**2-** Du birayên min hene. Navên __________ Rojhat û Arda ne.
**3-** Ev Apê min e. Navê __________ Bahoz e.

### Qertafên nebinavkirî

| | |
|---|---|
| -ek | -in |

### Mînak

keçek, pênûsek, darek, kevçiyek, xaniyek
hevalin, darin, zarokin

*Di taxa me de kaniy**ek** heye.*
*Li ber mala me dar**in** hene.*

### Serê malan

Serê malan dar**ek** lê lê dar**ek** lê
Her mal**ek** de yar**ek** lê lê yar**ek** lê
Serê yarê şar**ek** lê lê şar**ek** lê
Bidin yarê zêr**ek** lê lê zêr**ek** lê

### Veqetandekên binavkirî

| | | |
|---|---|---|
| -a (yekjimar - mê) | -ê (yekjimar - nêr) | -ên (pirjimar) |

**-a;** mal**a** min, met**a** min, xwişk**a** te, gul**a** sor, dar**a** gûzê, keç**a** dirêj…

*Mal**a** min li Amedê ye.*
*Keç**a** te xweşik e.*

**-ê;** xaniy**ê** me, biray**ê** min, ap**ê** te, xort**ê** delal, deriy**ê** mezin…

*Xaniy**ê** me mezin e.*
*Ap**ê** min ajokar e.*

**-ên;** biray**ên** min, mêvan**ên** me, temaşevan**ên** hêja…

*Biray**ên** min xwenda ne.*
*Mêvan**ên** me ji Wanê ne.*

### Veqetandekên Nebinavkirî

| | | |
|---|---|---|
| -eke (yekjimar - mê) | -ekî (yekjimar - nêr) | -ine (pirjimar) |

**-eke;** keç**eke** xwîngerm, gul**eke** sor
**-ekî;** zilam**ekî** bi bejn û bal, xaniy**ekî** xweşik
**-ine;** heval**ine** min

*Li ser malê pênûs**eke** reş heye.*
*Li ber derî kur**ekî** lewaz heye.*
*Heval**ine** min xwendekar in.*

### 4- Di nivîsa li jêr de veqetandekan bi cih bikin.

**Minak** Kur**ên** xwişk**a** hevser**ê** min xwendekar in.

Nav__ diy__ min Delal e. Ew çil salî ye. Por__ wê reş e. Çav__ wê qehweyî ne. Bejna wê dirêj e. Bav__ min çil û çar salî ye. Nav__ wî Rêşad e. Por__ wî qehweyî ye. Çav__ wî hingivîn in. Ap__ min heye. Navê wî Serdar e. Ew parêzer e. Navê jinap__ min Selma ye. Ew rojnamevan e. Ew gelekî henûn e. Navê pismam__ min Bahoz e. Ew dozdeh salî ye. Ew çavreş e. Ew yekî jîr e.

**5- Di nivîsa li jêr de binê veqetandekan xêz bikin.**

# Taxa me



Navê min Rohat e. Ez ji bajarê Mêrdînê me. Mala me li rojhilatê bajêr, di taxeke biçûk de ye. Niştecihên taxê bi piranî karker û karmend in. Mala me maleke biçûk e. Xaniyên der û dora me ne zêde mezin in. Di taxa me de mizgefteke biçûk heye. Li hemberî mizgeftê jî kaniyek heye. Di taxa me de dibistan tune ye.

Di mala me de pênc kes hene. Dê û bavê min, du xwişkên min û ez. Navê xwişkeke min Şîlan e û navê ya din jî Rûken e. Her du jî gelekî bedew in. Tu birayên min tune ne. Bavê min zilamekî kedkar e. Diya min jî jineke jîr e.

### Heye / Hene

Di taxa me de mizgefteke biçûk **heye**. (yekjimar)
Di mala me de pênc kes **hene**. (pirjimar)
Di taxa me de dibistan **tune** ye. (yekjimar)
Tu birayên min **tune** ne. (pirjimar)

### Hin daçekên bingehîn

Ez **ji** bajarê Mêrdînê me.
Mala me **li** rojhilatê bajêr, **di** taxeke biçûk **de** ye.
**Di** taxa me **de** mizgefteke biçûk heye.
**Li hemberî** mizgeftê jî dêrek heye.

**6- Li gorî agahiyên li jêr nivîsekê binivîsin.**

| | |
|---|---|
| **Nav** | Bager |
| **Pîşe** | xwendekar |
| **Bajar** | Çewlik |
| **Bav** | Hogir, ajokar |
| **Dê** | Sozdar, bermalî |
| **Xwişk** | du; Rojîn, Berfîn |
| **Bira** | yek; Adar |
| **Tax** | mezin, dibistaneke mezin, mizgefteke kevnare, du kanî |

Navê wî Bager e ______________________________

______________________________

______________________________

______________________________

______________________________

## Nivîs

**Der heqê xwe û malbata xwe de nivîsekê binivîsin.**

## Tewang

### a- Qertafên tewangê yên binavkirî

**-ê** (yekjimar - mê)
**-î** (yekjimar - nêr)
**-an** (pirjimar)

**Mînak**

Hevalê Hogir**î** mamoste ye.
Kilîla deriy**î** (d**ê**rî) nîn e.
Bavê min diçe bajar**î** (baj**ê**r).
Ez şivan**î** (şiv**ê**n) dibînim.
Ez ji Azad**î** (Az**ê**d) hez dikim.
Zozan li ber çem**î** (ç**ê**m) digere.
Zarok nan**î** (n**ê**n) dixwin.

Bavê Dîlan**ê** parêzer e.
Zarok li ber mal**ê** dilîzin.
Avahiyên Mêrdîn**ê** dîrokî ne.
Kaxiz li ser masey**ê** ne.
Bavê min ji Amed**ê** tê.
Birayekî Delal**ê** heye.
Pelên dar**ê** diweşin.

Xwarinê bide mêvan**an**.
Diya min diçe mala cîran**an**.
Zelal her roj du pirtûk**an** dixwîne.
Jiyana li zozan**an** xweş e.
Xwarina gûzan xweş e.
Ez ji zarok**an** hez dikim.
Kulîlk**an** av bide da ku neçilmisin.

**Têbinî:**

Tewandina navdêrên nêr ne mecbûrî ye.



**Çûka li ser darê**



Hey lê çûka li ser dar**ê**
Te xwe daye wê quntar**ê**
Çi digerî vê bihar**ê**
Te yar winda kir li vî diyar**î**

Çi digerî li wan mil**an**
Tu dixwînî wek bilbil**an**
Dil girtiye êşa dil**an**
Te yar winda kir li van çol**an**

## Hîndarî

### 1- Di nivîsa li jêr de cihên vala dagirin.

Navê min Zelal e. _____ ji Duhokê me. Ez xwendekar _____. Ez dozdeh salî _____. Navê bavê _____ Şivan e. ___ karsaz e. Çavên _____ reş in. Diya min bermalî _____. Navê ___ Zînê ye. Du birayên min _______. Navên ______ Rohat û Zana ne. Ew bejndirêj _____. Xwişkeke min _________. Navê _____ Asmîn e. Ew neh salî _____. Ew pir xweşik _____. Taxa me ne zêde mezin _____. Di taxa me de kaniyek û mizgeftek _____. Li taxa me tu dar û ber tune _____. Di taxa me de dibistanek _____.



### 2- Cihên vala bi qertafên tewangê dagirin (-ê, -î, -an).

**1-** Deriyê xani___ vekirî ye.
**2-** Dara gûz___ bilind e.
**3-** Bavê Delal___ karsaz e.
**4-** Rengê gul___ sor e.
**5-** Bejna keç___ dirêj e.
**6-** Bavê xort___ dewlemend e.
**7-** Keça mêvan___ şûm e. (pirjimar)
**8-** Lîstika zarok___ balkêş e. (pirjimar)

### 3- Bi peyvên li jêr hevokan çêkin.

**1-** Bager / zilam / zana ______________________________
**2-** Gulbîn / wênesaz ______________________________
**3-** Bejn / Zelal / dirêj ______________________________
**4-** Ew / xort / teral ______________________________
**5-** Xaltîk / min / jin / xwîngerm ______________________________
**6-** Çav/ xwişk/ min / şîn ______________________________
**7-** Xanî / ap / me / mezin ______________________________
**8-** Bira / hevser / min / parêzer ______________________________
**9-** Derî / mal / me / zexm ______________________________
**10-** Bira / Rojbîn / dadger ______________________________

# unîte 1 BIBÎRXISTIN

- Jiyana rojane
- Ez dixwazim ...
- Tenduristî

## A- Jiyana Rojane



Navê min Şermîn e. Ez li Amedê dijîm. Ez xwendekar û şanoger im. Ez li Zanîngeha Dîcleyê, di beşa wêjeyê de dixwînim. Di heman demê de ez bi komeke şanoyê re dixebitim. Em hefteyê sê rojan dicivin û dixebitin. Em lîstikên xwe li gelek cihan pêşkêş dikin. Carinan jî em diçin bajarên din û derdikevin ser dikê.

Ez ji gerê pir hez dikim. Dema em diçin bajarên din ez li derdorê digerim. Ez cihên nû dibînim û kêfxweş dibim.

Ji bilî şanoyê kêfa min ji helbestan re tê. Ez ji xwendina helbestan pir hez dikim. Helbestên Îrfan Amîda bi min gelekî xweş tên. Ez jî carinan helbestan dinivîsim. Hevalên min wan diecibînin. Ez dixwazim wan biweşînim.

Ez ji xewa zêde hez nakim, ji ber vê yekê ez sibehan zû radibim. Dema ez hişyar dibim ez taştê dixwim û diçim rojnameyekê dikirim. Ez rojnameya Azadiya Welat dixwînim. Ji ber ku ez bi hunerê re têkildar im, serê pêşîn ez rûpela çand û hunerê dixwînim.

Piştî ku ez rojnameyê dixwînim ez diçim zanîngehê. Di zanîngehê de ez endama komeleya xwendekaran im. Piştî waneyên xwe ez pirî caran beşdarî civînên komeleyê dibim.

Ez êvaran an pirtûkan dixwînim an jî li ser dersên xwe dixebitim.

**1- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.**

**1-** Şermîn li ku derê dijî?

---

**2-** Ew çi karî dike?

---

**3-** Ew di kîjan beşê de dixwîne?

---

**4-** Koma wan di hefteyê de çend rojan dixebite?

---

**5-** Şermîn ji bilî şanoyê ji çi hez dike?

---

**6-** Kêfa wê ji kîjan helbestvanî re tê?

---

**7-** Ew piştî taştê çi dike?

---

**8-** Ew kîjan rojnameyê dixwîne?

---

**9-** Ew çima serê pêşîn rûpela çand û hunerê dixwîne?

---

**10-** Ew êvaran çi dike?

---

## Nivîs

**Hûn jî der heqê xwe de nivîsekê binivîsin.**

## Dema niha

| Cînavk | Qertafa dema niha | Rayek | Qertafa kesane | Hevok |
|---|---|---|---|---|
| Ez | di | ç | im | Ez diçim. |
| Tu | | | î | Tu diçî. |
| Ew | | | e | Ew diçe. |
| Em | | | in | Em diçin. |
| Hûn | | | in | Hûn diçin. |
| Ew | | | in | Ew diçin. |



**2- Di nivîsa li jêr de binê lêkerên di forma dema niha de xêz bikin.**

Navê diya min Amîne ye. Ew germahiya dilê min û roja jiyana min e. Diya min çil û heft salî ye. Porê wê hêdî hêdî spî dibe. Çavên wê yên hingivîn bi keser li cîhanê dinêrin. Lê dema ew zarokên xwe dibîne, çavên wê dibiriqin. Ew ne jineke dirêj e, lê belê bejna wê lihevhatî ye.

Diya min jineke pir jêhatî ye. Ew sibehan zû radibe, diçe ber tenûrê û nên dipêje. Piştre jî karên malê dike. Ew xwarinên gelekî xweş çêdike.

Diya min carinan qala zaroktiya xwe dike. Wê demê ez dibînim ku hesreta rojên berê di dilê wê de ye. Ew pir dil-tenik û dilovan e. Dema kesên xizan an jî biêş dibîne, ji bo wan digirî.

Diya min carinan porê xwişka min şeh dike û ji wê re dilorîne. Wê demê ez dizanim ku diya min dibe zarokeke dilşa û di nav mêrgan baz dide. Ez diçim serê xwe datînim ser çokên wê û li wê guh-darî dikim.

Bi dengê lorîna wê ez hemû hesreta xwe diherikînim binê lingên wê.

**Orhan Alîcî**

## Nivîs

**Hûn jî li gorî pirsên li jêr der heqê kesekê/î de nivîsekê binivîsin.**

**1-** Navê wê / wî çi ye?
**2-** Ew çend salî ye?
**3-** Têkiliya we bi wî / wê re çi ye?
**4-** Çima ev mirov ji bo we girîng e?
**5-** Ew yeka/î çawa ye? (Kesayetî, dirûv, bejn û bal û heweskarî)

## Hîndarî



Navê min Şîlan e. Ez çardeh salî me. Ez li gundê Huseyna dijîm. Huseyna gundê Farqînê ye. Em her sibeh zû radibin. Ez û diya xwe derdorê didin hev û taştê amade dikin. Di taştê de em penêr, to, hingiv û hêkerûnê dixwin. Ez gelekî ji dimsê hez dikim ji ber vê yekê ez her sibe dimsê jî dixwim. Piştî taştê em her yek karekî dikin. Diya min nan dipêje, dew dikêle. Bavê min û birayê min diçin cot. Birayekî min ajalan dibe çêrê. Ez û xwişka xwe em diçin ser kaniyê û cilan dişon. Dema ku em karê xwe diqedînin em carinan diçin mala cîranan. Keça cîranê me hevala min e. Ez gelekî ji wê hez dikim. Ber êvaran em bi hev re diçin bêriyê.

Êvaran em giş li malê vedigerin. Em bi hev re şîvê dixwin. Carinan xizmên me tên serdana me. Carinan jî em diçin mala wan. Ez êvaran zû radikevim.

**1- Nivîsa li jor li gorî kesa/ê sêyem ji nû ve binivîsin.**

Navê wê Şîlan e. Ew ____________________

**2- Di nivîsa li jêr de lêkeran li gorî dema niha bikişînin.**



Li gundan kar pir e, lewma gundî sibê zû __________ (rabûn) û dest bi xebatê __________ (kirin). Şivan pez __________ (birin) çêrê. Cotkar __________ (çûn) ser zeviyê, cot __________(kirin). Keç cilan li ser kaniyan an jî li ber çêm __________ (şûştin). Jin nên diavêjin tenûrê û __________ (pehtin). Ber êvaran bêrîvan __________ (çûn) bêriyê çêlek û mihan __________ (dotin).

**3- Lêkerên li jêr li gorî dema niha bikişînin.**

**1-** Ez êvaran pirtûkan ____________ (xwendin).
**2-** Rojda sibehê zû ____________ (rabûn).
**3-** Arjîn tu carî dereng ____________ (na / hatin) malê.
**4-** Tu qet ____________ (na / çûn) sînemayê?
**5-** Zarok li kuçeyan ____________ (lîstin).
**6-** Li van deran qet berf ____________ (na / barîn).
**7-** Îşev serê min pir ____________ (êşîn).
**8-** Zivistanan çem ____________ (qerisîn).
**9-** Apê min hespê xwe bi lez ____________ (bezandin).
**10-** Waneya me saet di pêncan de ____________ (qedîn).
**11-** Dema payîz ____________ (hatin), pelên daran ____________ (weşîn).
**12-** Dema ez diya xwe ____________ (dîtin), dilê min geş ____________ (bûn).
**13-** Dema bihar ____________ (hatin), kulîlk ____________ (vebûn).
**14-** Dema ez dengê bilûrê __________ (bihîstin), gundê me _________ (hatin) bîra min.
**15-** Dema ez li te ____________ (fikirîn), ez ____________ (girîn).

### 4- Di nivîsa li jêr de çewtiyan bibînin û sererast bikin.

**Mînak** Ew yekî dirêj û xurt e.

Bavê min zilamekî bi bejn û bal e. Ew yekî dirêj û xurt î. Ew sibê zû hişyar dibim û taştê amade dike. Piştre me hişyar dikî û em bi hev re taştê dixwin.

Bavê min rojnameger e. Ji ber vê yekê ew carinan diçe bajarên din. Dema ew diçî bajarên din, ez gelekî bêriya wî dike.

Bavê min piştî taştêyê rojnameyan dixwîne, piştre jî diçe kargehê. Ew berêvarî vedigere malê. Em şîvê dixwin û qala roja xwe dikin. Piştî şîvê em carinan li televîzyonê temaşe dike.

Bavê min ji hevalên xwe pir hez dike. Hin êvaran hevalên wî têm mala me. Ew bi piranî li ser rojevê û siyasetê dipeyivin.

Bavê min bi şev li ser kompîturê dixebite û pir dereng radikeve. Pire caran ji min û xwişka min re çîrokan dibêje. Ez gelekî ji çîrokên wî hez dikin. Dawiya hefteyê em carinan diçin sînemayê carinan jî digerim. Dema ez bi bavê xwe re digerim, gelekî kêfxweş dibim.




### 5- Cihên vala bi gihanekên li jêr dagirin.

| ji ber ku | lê belê | ji ber vê yekê | ji bilî |
|---|---|---|---|

1- __________ Adar hemû xwendekarên min ji Amedê ne. Adar ji Wanê ye.
2- Ez êvarî heta derengiya şevê pirtûkan dixwînim. _______ ez sibehan dereng radibim.
3- Ez ji Dêrikê me, __________ ez li Amedê dijîm.
4- __________ ez pir dixebitim, ez hevalên xwe zêde nabînim.

## B- Ez dixwazim...



Delal

Ez dixwazim bibim rojnameger û nûçeyan binivîsim. Ez dixwazim bi nûçe û nivîsên xwe balê bikişînim ser rewşa zarokan. Mercên jiyanê herî zêde li ser zarokan bandorê dikin. Ji ber vê yekê ez dixwazim di nivîsên xwe de qala wan bikim. Hin zarok li kuçeyan dijîn û hin jî li kuçeyan tiştan difiroşin. Gelek zarok jî karên giran dikin. Ez dixwazim der barê vê rewşê de binivîsim. Ez dixwazim rayedar ji bo zarokan hin tiştan bikin. Dema ez bibim rojnameger ez dikarim li gelek bajar û welatan bigerim û cihên nû bibînim.



Evîn

Ez dixwazim bibim bijîşk û ji nexweşiyan re dermanan bibînim. Ez dixwazim çareyekê ji nexweşiya şêrpençeyê re bibînim. Dema ez bibim bijîşk ez dikarim gelek kesan baş bikim. Ez dixwazim li diya xwe binêrim û nexweşiyên wê jî derman bikim.



Rohat

Ez dixwazim bibim mamoste û li Amedê bixebitim. Ez dixwazim bibim mamosteyê zimanê kurdî. Ez dixwazim kurdî hînî hemû zarokan bikim. Niha mamoste Rojhat min hînî kurdî dike. Ez jî dixwazim bibim wekî wî. Ez dikarim bi kurdî bixwînim û binivîsim. Ez dikarim rojnameyên bi kurdî bixwînim. Ez her êvar rojnameya Azadiya Welat dixwînim.



Sîdar

Ez dixwazim bibim hunermend. Ez dikarim kilaman bibêjim û li gîtarê bidim. Ez û du hevalên xwe dixwazin komekê ava bikin. Em niha bi hev re dixebitin. Hevalekî min dikare li tembûrê bide. Hevalekî min jî dikare li bilûrê bide. Em dixwazin rojekê derkevin ser dikê.

### 1- Hevokên li jêr biqedînin.

**1-** Delal dixwaze ____________________

**2-** Evîn dixwaze ____________________

**3-** Rohat dikare ____________________

**4-** Sîdar dikare ____________________

### 2- Lêkerên di nav kevanekê de li gorî forma rast bikişînin.

**1-** Ez dixwazim li ber deryayê _____________ (gerîn).
**2-** Em _____________ (xwestin) kurdî hîn bibin.
**3-** Dildar dixwaze _____________ (çûn) Mêrdînê.
**4-** Tu dixwazî bi min re _____________ (hatin)?
**5-** Ez _____________ (na/xwestin) te bibînim.
**6-** Hûn naxwazin _____________ (lîstin)?
**7-** Ew dixwazin çîrokan _____________ (vegotin).
**8-** Ew naxwazin ez _____________ (çûn).
**9-** Ez dixwazim baran _____________ (barîn).
**10-** Diya min dixwaze ez _____________ (bûn) bijîşk.

### 3- Lêkerên di nav kevanekê de li gorî forma rast bikişînin.

**1-** Ez nikarim bi erebî _____________ (peyivîn).
**2-** Em dikarin alîkariya te _____________ (kirin).
**3-** Rojîn dikare li tembûrê _____________ (dan).
**4-** Bavê min dikare erebeyê _____________ (ajotin).
**5-** Tu dikarî stranan _____________ (gotin)?
**6-** Ez _____________ (karîn) avjeniyê bikim.
**7-** Tu nikarî _____________ (meşîn)?
**8-** Hûn nikarin futbolê _____________ (lîstin).
**9-** Ew _____________ (karîn) bi me re were.
**10-** Ez _____________ (karîn) bi kurdî binivîsim.

## Lêkera alîkar “xwestin”

| Cînavk | Lêkera “xwestin” | Lêkera bingehîn |
|---|---|---|
| Ez | dixwazim / naxwazim | biçim |
| Tu | dixwazî / naxwazî | biçî |
| Ew | dixwaze / naxwaze | biçe |
| Em | dixwazin / naxwazin | biçin |
| Hûn | dixwazin / naxwazin | biçin |
| Ew | dixwazin / naxwazin | biçin |

| | | | |
|---|---|---|---|
| Ez | dixwazim / naxwazim | (ez) | biçim |
| | | tu | biçî |
| | | ew | biçe |
| | | em | biçin |
| | | hûn | biçin |
| | | ew | biçin |

## Lêkera alîkar “karîn”

| Cînavk | Lêkera “karîn” | Lêkera bingehîn |
|---|---|---|
| Ez | dikarim / nikarim | biçim |
| Tu | dikarî / nikarî | biçî |
| Ew | dikare / nikare | biçe |
| Em | dikarin / nikarin | biçin |
| Hûn | dikarin / nikarin | biçin |
| Ew | dikarin / nikarin | biçin |

## C- Tenduristî



# Ji bo jiyaneke dirêj û tendurist

- Ji bo jiyaneke dirêj û tendurist û bi taybetî ji bo parastina siheta dil, divê tu di serî de pergala xwe ya xwarinê biguhêrî.
- Divê tu xwarinên kêmrûn û sebze û fêkiyan bixwî.
- Divê tu xwarinên mîna kartolên sorkirî, paste, şekir û hwd. zêde nexwî.
- Divê tu di hefteyekê de herî kêm carekê masiyan bixwî, goştê sor kêm bixwî, li şûna wî goştê spî bixwî.
- Divê tu her roj herî kêm lîtreyek û nîv avê vexwî.
- Divê tu werzîşê bikî.
- Divê tu her sibe bimeşî yan jî hefteyê du sê rojan biçî avjeniyê.









**1- Hûn ji bo tenduristiya xwe çi dikin?**

**2- Di nivîsa li jêr de lêkeran li gorî forma rast bikişînin.**

# Şîretên bijîşk li nexweşekî…



Divê tu dermanên xwe bi rêk û pêk ____________ (xwarin).
Divê tu tiştên şîregerm ____________ (vexwarin).
Divê tu du sê rojan ____________ (ne/çûn) kar û ____________ (veketin).
Divê tu zêde li ber sermayê ____________ (ne/man).
Divê tu fêkiyan ____________ (xwarin).
Divê tu nêzî mirovên din ____________ (ne/bûn).

## Divêtî

| | | |
|---|---|---|
| Divê | ez | biçim / neçim |
| | tu | biçî / neçî |
| | ew | biçe / neçe |
| | em | biçin / neçin |
| | hûn | biçin / neçin |
| | ew | biçin / neçin |



# Şîretên derûnnasekê ji bo dê û bavan

- Ji zarokên xwe hez bikin lê belê wan şûm ranekin.
- Ji bo wan demê veqetînin, bila ew bi we re şa bibin.
- Çîrok afirîneriya zarokan xurt dikin, ji wan re çîrokan bixwînin.
- Lîstik hêza wan a aşopî xurtir dikin, bi wan re bilîzin.
- Tenê hûn mepeyivin. Bila ew jî bipeyivin. Li wan guhdariyê bikin. Bila bi xwe bawer bibin.
- Bihêlin bila hin karên xwe ew bi xwe bikin. Bila ew berpirsiyariyên xwe bizanin.
- Spartekên wan çênekin. Bila ew bi xwe hîn bibin.
- Dema wan tiştekî baş kir, wan pîroz bikin. Dema wan tiştekî nebaş kir, wan rexne bikin. Bila rastî û çewtiyê nas bikin.
- Li pêş zarokan şer mekin. Bila netirsin.

**3- Hevokên li jor bi forma divêtî binivîsin.**

# Raweya Fermanî

| Lêker | Pêş-gir | Qertafa fermanê | Rayeka dema niha | Qertafên kesane | Forma fermanî | Forma neyînî |
|---|---|---|---|---|---|---|
| kirin | | | k | | bike / bikin | meke / mekin |
| dîtin | | | bîn | | bibîne / bibînin | mebîne / mebînin |
| birin | | bi | b | | bibe / bibin | mebe / mebin |
| revîn | | | rev | e (yekjimar) in (pirjimar) | bireve / birevin | mereve / merevin |
| revandin | | | revîn | | birevîne / birevînin | merevîne / merevînin |
| çêkirin | çê | - | k | | çêke / çêkin | çêmeke / çêmekin |
| vebûn | ve | | b | | vebe / vebin | vemebe / vemebin |

Forma neyîniyê ya raweya fermanî bi "ne-"yê jî pêk tê. **Mînak:** *meçe-neçe / meçin-neçin*

# Bilanî

| | | |
|---|---|---|
| Bila | ew | biçe / neçe; biçin / neçin |
| | | bibêje / nebêje; bibêjin / nebêjin |
| | | bixwîne / nexwîne; bixwînin / nexwînin |

## Hîndarî

**1- Lêkerên li jêr li gorî forma rast bikişînin.**

### Şîretên bavekî ji keça wî re



Divê tu li mamosteyên xwe guhdariyê __________ (kirin). Divê tu tu carî li hemberî wan bêhurmetiyê __________ (ne/kirin). Bila mamosteyên te ji te razî __________ (bûn). Dema ku tu çûyî dibistanê bila cil û bergên te paqij __________ (bûn). Tu carî bi cilên qirêjî __________ (ne/çûn) dibistanê. Spartekên xwe di demê de __________ (çêkirin). Ji bo ezmûnên xwe baş __________ (xebitîn). Dema te tiştek fêm nekir ji mamosteyên xwe __________ (pirsîn). Bila ew ji bo te careke din __________ (vegotin). Di fêrgehê de çalak be, her tim pirsan __________ (bersivandin). Ji xwe bawer be, ji bersivandinê __________ (me/tirsîn).
Divê tu xatirê hevalên xwe __________ (zanîn). Divê tu alîkariya wan __________ (kirin). Dema pêdiviya te çêbû divê tu jî ji wan alîkariyê __________ (xwestin). Tu carî derewan li hevalên xwe __________ (me/kirin).
Divê tu zêde li televîzyonê temaşe __________ (ne/kirin). Ji devla wê pirtûkan __________ (xwendin). Êvaran dereng __________ (me/raketin). Piştre tu nikarî sibê zû __________ (rabûn).

**2- Hevokên li jêr li gorî forma di nava kevanekê de ji nû ve saz bikin.**

**Mînak** *Ez dikarim govendê bigirim. (xwestin)*
*Ez dixwazim govendê bigirim.*

**1-** Ez spartekên xwe çêdikim. (divêtî)

__________________________________________

**2-** Hogir diçe sûkê. (bilanî)

__________________________________________

**3-** Zelal rojnameyê dixwîne. (xwestin)

__________________________________________

**4-** Ez dixwazim îngilîzî hîn bibim. (divêtî)

__________________________________________

**5-** Ez li tembûrê didim. (karîn)

__________________________________________

**3- Lêkerên li jêr li gorî forma rast bikişînin.**



**Rojîn** Baran, tu bi me re nayêyî şanoyê?
**Baran** Na, ez nikarim __________ (hatin). Divê ez __________ (xebitîn).



**Şîlan** Evîn, tu dikarî alîkariya min __________ (kirin)? Ez nikarim vê pirsê __________ (bersivandin).
**Evîn** Ji mamoste __________ (pirsîn). Bila ew __________ (bersivandin).



**Lezgîn** Arda tu dikarî wênegira xwe __________ (dan) min?
**Arda** Wênegira min naxebite. Bila Serhat wênegira xwe __________ (dan) te.

**Rêzan** Dayê, ez birçî me.
**Delal** Xwarin amade ye. __________ (çûn) destên xwe __________ (şûştin) û __________ (hatin).

**Rûşen** Rojhat, em sibe diçin seyranê. Tu jî têyî?
**Rojhat** Na, mixabin. Divê ez sibê __________ (çûn) gund.

**Sozdar** Delal tu dikarî wêneyan xêz __________ (kirin)?
**Delal** Na, mixabin ez nikarim.

**Derya** Şevîn, tu dixwazî îşev çi __________ (kirin)?
**Şevîn** Ez dixwazim __________ (çûn) konserê.

**Rêzan** Şermîn tu van rojan qelew dibî.
**Şermîn** Qet nepirse! Divê ez xwarinê kêm __________ (kirin).
**Rêzan** Ez her roj nîv saetê dimeşim. Divê tu jî __________ (meşîn).

**Xecê** Rohat __________ (çûn) du nanan __________ (kirîn).
**Rohat** Dayê ez dixebitim. Bila Jêhat __________ (çûn).

# unîte 2 PLANSAZÎ

- Tu yê sibê çi bikî?
- Tu yê vê havînê çi bikî?
- Tu dixwazî siberojê çi bikî?

## A- Tu yê sibê çi bikî?

## Çûna sînemayê

**Azad** Dîlan, tu yê sibê çi bikî?

**Dîlan** Ez ê bi Rojdayê re biçim sînemayê. Em ê li fîlmê "Dol" temaşe bikin. Tu jî dixwazî bi me re werî?

**Azad** Serê sibê ez ê bi diya xwe re biçim sûkê, hûn ê kengî biçin?

**Dîlan** Em ê piştî nîvro li Kuçeya Hunerê hev bibînin. Fîlm saet di duyan de dest pê dike.

**Azad** Baş e, ez dikarim werim. Ez ê pêşî bi diya xwe re biçim sûkê, paşê werim ba we.

**Dîlan** Baş e. Ez dibêjim, em gazî Hêlîn û Diyarî jî bikin.

**Azad** Dibe, jixwe ez ê îşev Diyarî li komeleyê bibînim. Em ê beşdarî civîna xwendekaran bibin. Ez ê ji wî re bibêjim.

**Dîlan** Ez ê jî ji Hêlînê re bibêjim. Niha ez ê biçim Hêwana Sumerparkê. Pêşangeha wênesaz Fevzî Bîlge heye. Ez dixwazim wêneyên wî bibînim û bi wî re bipeyivim.

**Azad** Na heyran! Nexwe ez ê jî bi te re werim. Ez ji wêneyî wî gelekî hez dikim.

**Dîlan** Bi rastî? Ma tu yê neçî komeleyê?

**Azad** Hê dema min heye. Ez ê ji wir jî biçim komeleyê.

**Dîlan** Baş e, ka em biçin.





### 1- Pirsên li jêr li gorî axaftinê bibersivînin.

**1-** Dîlan û Rojda dê sibê çi bikin?

______________________________________________

**2-** Azad dê serê sibê bi kê re biçe sûkê?

______________________________________________

**3-** Dîlan û Rojda dê li ku derê hev bibînin?

______________________________________________

**4-** Azad dê li ku derê Diyarî bibîne?

______________________________________________

**5-** Dîlan û Azad dê wêneyên kê bibînin?

______________________________________________

### 2- Cihên vala li gorî axaftinê dagirin.

**1-** Dîlan û Rojda dê sibê li fîlmê "Dol" ________________

**2-** Azad dê serê sibê bi diya xwe re ________________

**3-** Fîlm dê di duyan de ________________________

**4-** Azad dê li komeleyê ________________________

**5-** Dîlan dê niha______________________________

**6-** Azad dê ji hêwanê ________________________

## Dema bê

| | |
|---|---|
| Ez ê/dê biçim. | Ez ê/dê neçim. |
| Tu yê/dê biçî. | Tu yê/dê neçî. |
| Ew ê/dê biçe. | Ew ê/dê neçe. |
| Em ê/dê biçin. | Em ê/dê neçin. |
| Hûn ê/dê biçin. | Hûn ê/dê neçin. |
| Ew ê/dê biçin. | Ew ê/dê neçin. |

**Dîlan** Rojbaş, Hêlîn tu çawa yî?

**Hêlîn** Baş im, sax bî. Tu çawa yî?

**Dîlan** Spas, ez jî baş im. Sibê piştî nîvro em ê biçin sînemayê, li fîlmê “Dol” temaşe bikin. Tu jî dixwazî werî?

**Hêlîn** Mixabin, ez nikarim werim. Ez ê sibê beşdarî gotûbêjekê bibim.

**Dîlan** Wa? Gotûbêj dê der heqê çi de be?

**Hêlîn** Dê li ser wêjeya kurdî ya nûjen be. Dê nivîskar Remezan Alan, Dilawer Zeraq û helbestvan Kawa Nemir wekî axêver beşdar bibin.

**Dîlan** Dê gotûbêj li ku derê pêk were?

**Hêlîn** Dê li salona Şaredariya Baxlarê be.

**Dîlan** Gelekî baş e. Bi rastî, ez jî dixwazim guhdariya wan bikim.

**Hêlîn** Hûn jî werin, em bi hev re biçin gotûbêjê. Em dikarin paşê jî biçin sînemayê.

**Dîlan** Dibe, lê divê ez berê ji hevalan bipirsim. Ez ê te agahdar bikim. Niha bimîne di xweşiyê de.

**Hêlîn** Li ser çavan.



### 3- Li gorî axaftinê cihê vala dagirin.

**1-** Hêlîn dê sibê ______________________________

**2-** Gotûbêj dê der heqê ______________________________

**3-** Dê hin nivîskar û helbestvan ______________________________

**4-** Dîlan jî dixwaze ______________________________

**5-** Dîlan dê Hêlînê ______________________________

### 4- Lêkeran li gorî forma rast bikişînin.



**Dîlan** Rojda, tu dizanî dê sibê li Şaredariya Baxlarê gotûbêjek li ser wêjeyê pêk _____________ (hatin) Ez dixwazim biçim wir. Tu çi dibêjî?

**Rojda** Heyran, ma em ê _____________ (ne/çûn) sînemayê?

**Dîlan** Belê, em ê _____________ (çûn), lê ez dibêjim em pêşî beşdarî gotûbêjê bibin, paşê jî biçin li fîlmî temaşe bikin. Nabe?

**Rojda** Dibe. Em ê li ku derê hev ___________ (dîtin)?

**Dîlan** Ez ê _____________ (hatin) mala we û em ê ji ber mala we li otobusê siwar _____________ (bûn). Dibe?

**Rojda** Wê gavê, em ê sibê hev bibînin. Niha bi xatirê te.

**Dîlan** Li ser çavan.

| Lêker | Daçeka dema bê | Qertafa raweya merc û daxwaziyê | Pêşgir | Rayeka dema niha | Li gorî kesê/a yekemîn | Li gorî dema bê hevok |
|---|---|---|---|---|---|---|
| xwarin | | | | xw | | Ez dê/ê bixwim / nexwim. |
| çûn | | | | ç | | Ez dê/ê biçim / neçim. |
| birin | | | | b | | Ez dê/ê bibim / nebim. |
| kirin | | | | k | | Ez dê/ê bikim / nekim. |
| meşîn | | | | meş | | Ez dê/ê bimeşim / nemeşim. |
| bezîn | dê/ê | bi | | bez | im | Ez dê/ê bibezim / nebezim. |
| girtin | | | | gir | | Ez dê/ê bigirim / negirim. |
| şandin | | | | şîn | | Ez dê/ê bişînim / neşînim. |
| vekirin | | | ve | k | | Ez dê/ê vekim / venekim. |
| raxistin | | | ra | x | | Ez dê/ê raxim / ranexim. |
| hilgirtin | | | hil | gir | | Ez dê/ê hilgirim / hilnegirim. |

## Hîndarî

### 1- Di axaftina li jêr de lêkeran li gorî dema bê bikişînin.



**Dîlan** Bavo tu yê îro çi__________ (kirin)?

**Rodî** Ez ê ____________ (çûn) nivîsgehê û amadekariya dozekê __________(kirin). Piştî nîvro dê muwekîleke min __________ (hatin), em ê li ser doza wê ____________ (xebitîn). Tu yê çi bikî?

**Dîlan** Ez ê ____________ (çûn) mala Rojdayê, em ê bi hev re ___________ (çûn) Şaredariya Baxlarê.

**Rodî** Şaredariyê? Çima, hûn ê li wir çi _______ (kirin)?

**Dîlan** Em ê guhdariya gotûbêjekê ____________ (kirin). Piştre jî em ê __________ (çûn) sînemayê.

**Rodî** Baş e. Em ê êvarî hev ___________ (dîtin).

### 2- Lêkerên di nav kevanekê de li gorî dema bê bikişînin.

**1-** Sibê dê mêvanên min __________ (hatin). Ez ê sibê zû __________ (rabûn), firaqan __________ (şûştin) û malê paqij _______ (kirin). Piştre ez ê __________ (çûn) sûkê, hin pêdiviyên malê __________ (kirîn). Berêvarî ez ê şîvê __________ (çêkirin) û li hêviya mêvanan __________ (man).

**2-** Em ê sibê li komeleyê ________ (civîn), em ê li ser xebatên xwe nîqaşan ________ (kirin).
Ez ê ji bo demên bê hin pêşniyazan __________ (kirin).

**3-** Delal dê sibê hevalên xwe __________ (dîtin). Ew ê bi hev re __________ (çûn) ber çem û li wir ____________ (gerin).

**4-** Sibê Newroz e. Gel dê li Parka Newrozê kom __________ (bûn). Dê dîsa jinên kurd bi cilên rengîn qadê _____________ (xemilandin). Dê gel li ber def û zirneyê govendê li dar __________ (xistin).

### 3- Hevokên li jêr bixin forma dema bê.

**Mînak** *Niha baran dibare.*
*Dê sibê baran bibare.*

**1-** Zarok li kuçeyê dilîzîn.
_________________________________

**2-** Zozan bi mamoste re dipeyive.
_________________________________

**3-** Zîlan daxwaznameyekê dinivîse.
_________________________________

**4-** Ez li strana Aram guhdarî dikim.
_________________________________

**5-** Tu çi dikî?
_________________________________

**6-** Ew diçe ku derê?
_________________________________

## B- Tu yê vê havînê çi bikî?



**Rojda** Narîn, tu yê vê havînê çi bikî?
**Narîn** Ez dixwazim vê havînê biçim Duhokê.
**Rojda** Duhokê? Tu yê li ku derê bimînî?
**Narîn** Ez ê li mala dotmama xwe bimînim. Dibêjin Duhok bajarekî kevnare ye. Ez ê li wir bigerim û cihên dîrokî bibînim. Ez dixwazim çanda kurdên li wir nas bikim. Berî ku ez biçim Duhokê ez ê ji bo dotmama xwe hin diyariyan bikirim.
**Rojda** Xweziya min bi dilê te. Ez jî pir dixwazim li wan deran bigerim.
**Narîn** Tu yê havînî çi bikî?
**Rojda** Ez ê ji bo demekê biçim gund, li ba dapîr û bapîrê xwe bimînim. Piştî ku ez ji gund vegerim, ez ê biçim Stenbolê hinda xaltîka xwe. Ez ê li wir bigerim û xizmên xwe bibînim.
**Narîn** Ez bawer im, dê havîn xweş derbas bibe.

### 1- Li gorî axaftinê du paragrafan binivîsin.

Narîn dê vê havînê ______________________________
__________________________________________________
__________________________________________________

Rojda dê vê havînê ______________________________
__________________________________________________
__________________________________________________

### 2- Hevokan bi piştî ku / berî ku bigihînin hev.

**Mînak** *Ez ê bi hevalên xwe re bipeyivim. Piştre ez ê biryara xwe bidim.*
*Piştî ku ez bi hevalên xwe re bipeyivim, ez ê biryara xwe bidim.*
*Berî ku ez biryara xwe bidim, ez ê bi hevalên xwe re bipeyivim.*

**1-** Ez ê spartekên xwe çêkim. Piştre ez ê rojnameyê bixwînim.
Piştî ku ______________________________
**2-** Ez ê şîvê çêkim. Piştre dê mêvan werin.
Berî ku mêvan ______________________________
**3-** Em ê xwarinê bixwin. Dûre em ê biçin parkê.
Piştî ku em ______________________________
**4-** Ez ê nameyê careke din bixwînim. Piştre ez ê wê bişînim.
Berî ku ez nameyê ______________________________
**5-** Ez ê ji dibistanê derkevim. Paşê, ez ê biçim postaxaneyê.
Piştî ku ez ______________________________

## Piştî ku / Berî ku

Piştî ku ez taştê bixwim, ez ê rojnameyê bixwînim.
**(raweya merc û daxwaziyê)** **(dema bê)**

Berî ku ez biçim malê, ez ê hevalan bibînim.
**(raweya merc û daxwaziyê)** **(dema bê)**

### Nivîs

Hûn ê vê havînê çi bikin?



## C- Tu dixwazî siberojê çi bikî?

**Azad** Hevalno ez van rojan li ser siberojê difikirim. Ez dixwazim hin armancan ji bo xwe diyar bikim. Wekî mînak ez ê di zaningehê de beşa dîrokê bixwînim, ji ber ku dîrok gelekî bala min dikişîne. Ez ê li ser dîroka kurdan lêkolînan bikim. Ez dixwazim îngiliziya xwe bi pêş bixim. Ez ê lêkolînên bi îngîlîzî jî bixwînim. Hûn çi difikirin?

**Dîlan** Tu rast dibêjî. Divê em li ser siberoja xwe bifikirin. Ez ê jî beşa wêjeyê hilbijêrim. Wekî hûn jî dizanin kêfa min gelekî ji wêjeyê re tê.

**Rojda** Lê, tu di wênesaziyê de jî gelekî serkeftî yî. Ne wisa?

**Dîlan** Gotina te ye. Ez ê wêneyan jî çêkim, lê wêje zêdetir bala min dikişîne. Ya rastî, ez dixwazim bibim nivîskareke serkeftî. Hûn çi dibêjin?

**Mîrza** Ez bawer im tu yê pir serkeftî bibî.

**Rojda** Mîrza tu dixwazî çi bikî?

**Dîlan** Ez bawer im dê Mîrza bibe siyasetmedarekî navdar.

**Rojda** Ez jî wisa difikirim.

**Mîrza** Rast e. Ez ê beşa siyasetê bixwînim. Ez ê di Zanîngeha Selahadîn de bixwînim. Ez dixwazim biçim Hewlêrê û li wir bixwînim.

**Azad** Tu yê çawa li wir bimînî?

**Mîrza** Apê min li wir dijî. Ew li Zanîngeha Selahadîn dersên dîrokê dide.

**Dîlan** Gelekî baş e. Rojda tu yê çi bikî?

**Rojda** Ez nizanim, serê min tevlihev e. Ez ji aliyekî ve dixwazim civaknasiyê bixwînim, ji aliyê din ve derûnînasî jî bala min dikişîne. Ez ê li ser vê yekê bi mamosteyê xwe re bipeyivim.

**Dîlan** Li gorî dîtina min tu yê bibî derûnînaseke serkeftî.

**Azad** Li gorî min em hemû dê serkeftî bibin.

**1- Li gorî axaftinê li ser planên kesan binivîsin.**

Azad ____________________________________________

____________________________________________

Dîlan ____________________________________________

____________________________________________

Mîrza ____________________________________________

____________________________________________

**2- Bi lêkerên li jêr cihên vala dagirin.**

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| bibim | bigerim | hîn bibim | bixwînim | binivîsim | bikim | biqedînim | bimînim |

Ji bo siberojê gelek planên min hene. Ez ê beşa zimanê kurdî ______________. Ez dixwazim ______________ zimanzan. Ji bo wê ez ê li gel zimanê kurdî farisî û îngilîzî jî ______________. Dema ku ez zanîngehê ______________, ez ê lêkolînan li ser zimên ______________. Ez ê li gelek herêmên kurdan ______________. Ez dixwazim ji bo demekê li Mehabad û Sîneyê jî ______________. Ez dixwazim li ser zimên pirtûkan ______________. Ez ji niha ve di nav xeyalên pêşerojê de me.



## Nivîs

Hûn jî li ser planên xwe yên ji bo siberojê binivîsin.

______________________________________________

______________________________________________

______________________________________________

______________________________________________

______________________________________________

**3- Hevokên li jêr bigihînin hev.**

**1-** Dema ku ez bigihêjim malê,
**2-** Dema ku ez wê bibînim,
**3-** Dema ku baran raweste,
**4-** Dema ku ez zanîngehê biqedînim,
**5-** Dema ku ew were,

**a-** em ê derkevin derve.
**b-** ez ê mizgîniyê bidim diya xwe.
**c-** em ê dest bi civînê bikin.
**d-** ez ê wê hembêz bikim.
**e-** ez ê dest bi mamostetiyê bikim.

| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 |
|---|---|---|---|---|
| | | | | |

# Dema ku

Dema ku ez wê dibînim, ez kêfxweş dibim. / Dema ku bihar tê, kulîlk vedibin.
**(dema niha)** **(dema niha)** **(dema niha)** **(dema niha)**

Dema ku ez wê bibînim, ez ê pê re bipeyivim. / Dema ku ez encamê hîn bibim, ez ê agahî bidim te.
**(raweya merc û daxwaziyê)** **(dema bê)** **(raweya merc û daxwaziyê)** **(dema bê)**

## A- Xebata li ser peyvan

### 1- Bi lêkerên hevedudanî cihên vala dagirin.

| pêk hatin | kom bûn | bi pêş xistin | amadehî kirin | li dar xistin | dest pê kirin |
|---|---|---|---|---|---|

**1-** Em ê sibê civînekê ________________. Dê civîn di çaran de ________________.
**2-** Dê sibê li Navênda Çanda Mezopotomya gotûbêjek ________________. Em ê berî wê hin ____________________.
**3-** Di Newrozê de gel dê li Parka Newrozê ________________.
**4-** Divê ez kurdiya xwe ________________.

## B- Xwendin

# Tu yê sibê çi bikî?



**Xunav** Bêrîvan, sibê tu yê çi bikî?
**Bêrîvan** Tu karê min nîn e. Lewma ez ê dereng rabim.
**Xunav** Em bi hev re ji bo sibê planekê çêkin?
**Bêrîvan** Belê dibe, em ê çi bikin?
**Xunav** Em ê biçin sînemayê.
**Bêrîvan** Em ê biçin kîjan fîlmî?
**Xunav** Fîlmê “Min Dît” heye.
**Bêrîvan** Baş e. Em ê kengî û li ku hev û du bibînin?
**Xunav** Em ê saet di dozdehan de li ber sînemayê hev û du bibînin.
**Bêrîvan** Dibe, ez ê sibê li wir li benda te bim.

### 1- Ji hevokên li jêr ên rast bin, bi (r) yên çewt bin, bi (ç) xêz bikin.

| | Hevok | r | ç |
|---|---|---|---|
| 1 | Bêrîvan ê sibê zû rabe. | | ✓ |
| 2 | Ew ê sibê biçin sînemayê. | | |
| 3 | Ew ê biçin fîlmê “Kûsî jî difirin”. | | |
| 4 | Ew ê li ber sînemayê hev û du bibînin. | | |
| 5 | Ew ê saet di dozdehan de hev û du bibînin. | | |

# Çûna sînemayê

**Dîlan** Rojên pêncşeman fîlmên nû tên sînemayê.
**Azad** Îro pêncşem e, em biçin sînemayê?
**Hêlîn** Gelo îro kîjan fîlm dilîze?
**Diyar** Di Sînemaya Metropolê de fîlmê “Bahoz” dilîze.
**Dîlan** Ez ji mêj ve li bendê me. Em ê biçin.
**Diyar** Îro piştî nîvro dibe. Lê, em ê pêşî malbata xwe agahdar bikin.
**Dîlan** Em ê nîvro biçin malê û paşê biçin sînemayê.
**Hêlîn** Ez ê jî ji diya xwe destûrê bistînim û bêm.
**Diyar** Kesekî din ku em ê jê re bibêjin heye?
**Dîlan** Em gazî Rojdayê bikin.
**Diyar** Ez ê ji wê re bibêjim.
**Dîlan** Ji bîr mekin, saet di du û nîvan de em ê hev li ber sînemayê bibînin.



**2- Pirsên li jêr li gorî diyaloga li jor bibersivînin.**

**1.** Di kîjan rojê de fîlmên nû tên sînemayê?

______________________________

**2.** Di sînemeya Metropolê de kîjan fîlm dilîze?

______________________________

**3.** Kî li benda fîlmê “Bahoz” e?

______________________________

**4.** Hêlîn dê destûrê ji kê bistîne?

______________________________

**5.** Dîlan û hevalên xwe dê kengî hev bibînin?

______________________________

**6.** Heval dê li ku bicivin?

______________________________




## C- Bikaranîna zimên

### 1- Cihên vala dagirin.

**Berçem** Bêrîvan, vê havînê tu yê çi __________ (kirin)?
**Bêrîvan** Ez ê tevî malbata xwe __________ (çûn) ber Behra Wanê.
**Berçem** Hûn ê li ku derê __________ (mayîn)?
**Bêrîvan** Hevalekî bavê min li Tetwanê heye, em ê li cem wî __________ (mayîn).
**Berçem** Hûn ê li wir dema xwe çawa derbas __________ (kirin).
**Bêrîvan** Em ê __________ (ketin) avê, em ê __________ (çûn) ser Kela Wanê, em ê li nava bajêr __________ (gerîn), em ê bi keştiyê __________ (çûn) Dêra Axtamarayê.
**Berçem** Xweziya min bi dilê te. Ez ê vê havînê __________ (xebitîn).

### 2- Li gorî agahiyên li jor paragrafekê binivîsin.

*Bêrîvan dê vê havînê bi malbata xwe re biçe ber Behra Wanê*. ____________________



### 3- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî dema bê bikişînin.

Dema ku ez mezin bibim, ez ê ji vî gundî __________ (çûn), li bajarekî mezin __________ (jîn) û ez ê pir __________ (gerîn). Bila diya min jî bi min re __________ (hatin). Em ê qet ji hev __________ (ne/veqetîn). Ez ê pir __________ (xebitîn) û bi ser __________ (ketin). Ez ê diya xwe kêfxweş __________ (kirin). Ez ê pisîka xwe jî bi xwe re __________ (birin). Ez ê wê li vir __________ (ne/ hiştin).



### 4- Hevokên li jêr bixin forma dema bê.

**1-** Ez naçim Amedê.

__________________________

**2-** Em dixwazin civînekê li dar bixin.

__________________________

**3-** Divê ez spartekên xwe çêkim.

__________________________

**4-** Bila Zelal nameyekê binivîse.

__________________________

**5-** Tu bi kê re dipeyivî?

__________________________

**6-** Adar li ku derê dimîne?

__________________________

**7-** Ez naxwazim vegerim gund.

__________________________

**8-** Tu beşdarî civînê dibî?

__________________________

### 5- Hevokên li jêr li gorî xwe temam bikin.

**1-** Piştî ku ez şîvê bixwim, __________________________

**2-** Berî ku ez ji malê derkevim, __________________________

**3-** Dema ku ez şiyar bibim, __________________________

**4-** Piştî ku ez rojnameyê bixwînim __________________________

**5-** Dema ku ezmûnên min biqedin __________________________

# unîte 3 PÊŞBÎNÎ

- Siberoj
- Ez dikim...

## A- Siberoj



| | |
|---|---|
| **Mamoste** | Hevalino, em ê îro li ser pêşerojê biaxivin. Li gorî dîtina we piştî bîst salan dê çi guherîn çêbin? |
| **Dîlan** | Mamoste ez dikarim bibêjim? |
| **Mamoste** | Fermo Dîlan! |
| **Dîlan** | Ez bawer dikim ku piştî bîst salan siware dê bi enerjiya rojê bixebitin. |
| **Mamoste** | Jixwe ji niha ve li ser vî tiştî xebat hene. Ez jî dibêjim heta wê demê mirov dê vê yekê pêk bînin. Wekî din? |
| **Rojda** | Ez dixwazim tiştekî bibêjim. |
| **Mamoste** | Kerem bike. |
| **Rojda** | Ez dibêjim ku mirov dê di bin behrê de bajaran ava bikin. |
| **Mamoste** | Dibe. |
| **Azad** | Ramaneke min jî heye. |
| **Mamoste** | Bibêje Azad. |
| **Azad** | Ez wisa difikirim ku heta bîst salan dê qeşaya li cemseran tev bihele û dinya di bin avê de bimîne. |
| **Mamoste** | Tu zêde bedbîn î Azad. Ez bawer im, ev qas pêşbînî bes in. |

### 1- Pirsên li jêr li gorî diyalogê bibersivînin.

**1.** Li gorî Dîlanê dê siware bi çi bixebitin?

______________________________

**2.** Bi nêrîna Rojdayê piştî bîst salan dê çi bibe?

______________________________

**3.** Li gorî pêşbîniya Azad heta bîst salan dê çi biqewime?

______________________________

**4.** Li gorî mamoste pêşbîniya Azad pêşbîniyeke çawa ye?

______________________________

**5.** Li gorî we heta bîst salan dê çi guherîn çêbin?

______________________________

**Ez bawer dikim (ku)** piştî bîst salan siware dê bi enerjiya rojê bixebitin.
**Ez dibêjim (ku)** mirov dê di bin behrê de bajaran ava bikin.
**Ez wisa difikirim (ku)** heta bîst salan dê qeşaya li cemseran tev bihele û dinya di bin avê de bimîne.



**AZAD**

Ez bawer dikim ku dê dinya bi xetereyên mezin re rû bi rû bimîne. Dê qeşeya li cemseran bihele û dibe ku di demeke kin de dinya di bin avê de bimîne.



**HÊLÎN**

Ez wisa difikirim ku dê mercên jiyanê gelekî dijwar bibin. Dibe ku ji ber qeyrana aborî gelek kes bêkar bimînin. Dê hejmara xizanan zêdetir bibe.

**SERHAT**

Li gorî dîtina min dê li bajaran hejmara mirovan pir zêde bibe, ew yek jî dê bi xwe re gelek pirsgirêkên civakî û aborî bîne. Mercên jiyana li bajaran dê pir giran bibin, dê tengezarî û pevçûn zêde bibin.





**QENCO**

Wisa xuya dike ku dê ji ber sersariya rayedaran pirsgirêkên ekolojîk pir zêde bibin. Dê koka dar û daristanan biqele û gelek cihên li ser cîhanê dê bibin çolistan. Dibe ku ji ber qirêjiya av û hewayê jiyan dijwartir bibe.



**ROJDA**

Bi dîtina min dê mirov xetereyê bibînin û ji bo guhartinê xebatê bikin. Ji bo parastina xwezayê dê mirov ji enerjiya ba û rojê sûdê wergirin.

### 2- Navên kesan li ber hevokan binivîsin.

**1-** Dê nifûsa bajaran pir zêde bibe. ***Serhat***
**2-** Dê hejmara xizanan pirtir bibe. ___________
**3-** Sersariya rayedaran dê bibe sedema pirsgirêkên ekolojîk. ___________
**4-** Dê cîhan bibe çolistan. ___________
**5-** Ji bo parastina xwezayê dê ji ba û rojê sûdê wergirin. ___________

## Dibe ku…

Dibe ku ez hinekî dereng bimînim.
Dibe ku em sibê biçin seyranê.
**(raweya merc û daxwaziyê)**



**Qenco**

Heke rayedar bergiriyan negirin, dê koka dar û daristanan biqele û gelek cih dê bibin çolistan.



**HÊLÎN**

Heke qeyrana aborî bidome, dê gelek kes bêkar bimînin û hejmara xizanan zêdetir bibe.



**AZAD**

Heke mirov xwezayê neparêzin, dê dinya bi xetereyên mezin re rû bi rû bimîne. Heke germbûna gerdûnî bidome, dê qeşeya li cemseran bihele û di demeke kin de dinya di bin avê de bimîne.

**SERHAT**

Heke serjimara bajaran pir zêde bibe, dê gelek pirsgirêkên civakî û aborî derkevin holê.



### 3- Hevokan temam bikin.

**1-** Heke mirov xwezayê neparêzin, ____________________________________

**2-** Heke qeşaya li cemseran bihele ____________________________________

**3-** Heke gelek kes bêkar bimînin, ____________________________________

**4-** Heke koka dar û daristanan biqele, ____________________________________

## Heke / Ku

Heke tu alîkariya min bikî, ez ê karê xwe zû biqedînim.
**(raweya merc û daxwaziyê)** **(dema bê)**

Heke tu werî, em ê kêfxweş bibin.
Heke baran nebare, em ê biçin seyranê.
Ku ew rastiyê nebêje, ez ê pir biqehirim.
Ku tu kedê bidî, tu yê bi ser bikevî.

## Hîndarî

### 1- Der barê pêşerojê de pênc pêşbîniyan binivîsin.

**1-** Ez bawer dikim ku ______________________________

**2-** Ez dibêjim ku ______________________________

**3-** Li gorî dîtina min,______________________________

**4-** Dibe ku ______________________________

**5-** Heke ______________________________

### 2- Hevokên li jêr temam bikin.

**1-** Li esmanan ewrên reş kom dibin, dibe ku ____________________

**2-** Heke tu kulîlkan av nedî, dê ____________________

**3-** Heke tu nexebitî, ____________________

**4-** Qeyrana aborî heye, dibe ku ____________________

**5-** Heke civîn zû biqede, ____________________

### 3- Lêkerên di nav kevanekê de li gorî forma rast bikişînin.

Piştî du salan ez ê dest bi zanîngehê ___________ (kirin). Ez nizanim ez ê di kîjan beşê de ___________ (xwendin). Ez ji siyasetê hez dikim, dibe ku ez beşa zanista siyasetê bixwînim. Lê heke ez baş ___________ (ne/xebitîn), ez nikarim wê beşê kar bikim. Heke ez wê kar ___________ (ne/kirin), dibe ku ez beşa dîrokê ___________ (hilbijartin). Heke ez beşa dîrokê bixwînim, ez ê ___________ (bûn) lêkolîner. Bi rastî ez dudil im, dibe ku ez jî wekî bavê xwe bibim parêzer. Lê ji bo vê yekê jî divê ez xwe ji bo ezmûnê amade bikim.



## B- Ez dikim...

Yara min bedew, nola van gulan
Kîjan rewş daye, emrê dunyayê
Gul gelek hene, çavreşa dilan
Ez dikim herim yar bi min re nayê

(Aram Tîgran)





**Dîlan** Dembaş Hêlîn, ez dikim biçim mala Rojdayê tu jî nayêyî?
**Hêlîn** Na, ez niha nikarim werim, em dikin malê paqij bikin. Heke karê min zû biqede, ez ê werim.
**Dîlan** Baş e. Niha bi xatirê te.
**Hêlîn** Oxir be.



**Dîlan** Rojbaş Azad, tu dikî biçî ku derê?
**Azad** Rojbaş Dîlan, ez dikim herim konserê.
**Dîlan** Konsera kê?
**Azad** Konsera Dilşad Seîd e, tu jî nayêyî?
**Dîlan** Na, ez dikim biçim mala Rojdayê.



**Rojda** Dîlan ez dikim ji te re kadeyan çêkim.
**Dîlan** Ez alîkariya te bikim?
**Rojda** Baş e, em bi hev re çêkin.

### 1- Hevokên li jêr temam bikin.

1- Dîlan dike ______________________

2- Hêlîn dike ______________________

3- Azad dike ______________________

4- Rojda dike ______________________

## Dema bê ya nêzîk

| Kirde | Lêkera raweyî | Lêker (çûn) |
|---|---|---|
| Ez | dikim | biçim |
| Tu | dikî | biçî |
| Ew | dike | biçe |
| Em | dikin | biçin |
| Hûn | dikin | biçin |
| Ew | dikin | biçin |

## Hîndarî

### 1- Lêkerên di nav kevanekê de li gorî forma rast bikişînin.

**1-** Ez dikim taştê ____________ (xwarin).
**2-** Ew dike derî ____________ (vekirin).
**3-** Em dikin li balafirê siwar ____________ (bûn).
**4-** Hûn dikin bi ku de ____________ (çûn)?
**5-** Tu dikî çi ____________ (kirin)?
**6-** Bavê min dike kulîlkan av ____________ (dan).
**7-** Hevala min dike min li bajêr ____________ (gerandin).
**8-** Ez dikim hinek hevalan ____________ (dîtin).

### 2- Hevokên li jêr temam bikin.

**1-** Rojda li pêjgehê ye, ew dike________________________________________
**2-** Dîlan di nav nivînan de ye, ew dike __________________________________
**3-** Hêlîn li rawestgehê ye, ew dike ____________________________________
**4-** Em li ber sînemayê ne, em dikin ____________________________________
**5-** Azad li ber dêrî ye, ew dike ________________________________________

### 3- Hevokên li jêr bixin forma dema bê ya nêzîk.

**Mînak** *Ez rojnameyê dixwînim.*
*Ez dikim rojnameyê bixwînim.*

**1-** Em ê civînekê li dar bixin.
____________________________________

**2-** Ew nameyekê dinivîse.
____________________________________

**3-** Em li nûçeyan temaşe dikin.
____________________________________

**4-** Ez dixwazim kîloyek sêv bikirim.
____________________________________

**5-** Hûn çi dikin?
____________________________________

**6-** Ew dixwazin qesrekê ava bikin.
____________________________________

**Hin lêkerên hevedudanî**

ava kirin / ava bûn / zêde kirin / zêde bûn / germ kirin / germ bûn / dijwar kirin / dijwar bûn / kêm kirin / kêm bûn

# A- Xebata li ser peyvan

## 1- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| aborî | qeşa | merc | parastin | qirêjî |

**1-** Ji ber ___________ avê, kes li vir nakeve avê.
**2-** Zivistanê hewa sar dibe, her der dibe berf û ___________
**3-** Li bajarên mezin ___________ jiyanê dijwar in.
**4-** Ji ber pirsgirêkên ___________ ciwan diçin bajarên mezin.
**5-** Hawirparêz ji bo ___________ xwezayê têdikoşin.

## 2- Peyvên li jêr bigihînin wateyên wan.

| | |
|---|---|
| **1-** pirsgirêk | **a-** siberoj, ayende |
| **2-** pêşeroj | **b-** arîşe, gelemşe |
| **3-** pêşbînî | **c-** hizir, fikir |
| **4-** raman | **d-** tedbîr |
| **5-** bergirî | **e-** karbidest |
| **6-** tengezarî | **f-** xemsarî |
| **7-** sersarî | **g-** texmîn |
| **8-** rayedar | **h-** acizî |

| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| b | | | | | | | |

## 3- Cihên vala bi lêkerên hevedudanî dagirin.

| | | | |
|---|---|---|---|
| zêde kirin | ava kirin | dijwar bûn | germ bûn |

**1-** Bavê min li nav rezan xaniyekî _________________.
**2-** Bi hatina biharê re hewa _________________.
**3-** Zivistanê jiyana li gundan _________________.
**4-** Me kêm kir, Xwedê _________________.

## B- Bikaranîna zimên

### 1- Her du beşên hevokan bigihînin hev.

| | |
|---|---|
| **1-** Heke karê te neqede, | **a-** em ê berfemêrekî çêkin. |
| **2-** Heke tu dereng nemînî, | **b-** ez ê jî bi we re werim. |
| **3-** Heke hûn biçin pirtûkxaneyê, | **c-** em ê bigihêjin civînê. |
| **4-** Heke ez karê xwe zû biqedînim, | **d-** ez ê biçim ber deryayê. |
| **5-** Heke berf bibare, | **e-** ez ê alîkariya te bikim. |

| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 |
|---|---|---|---|---|
| e | | | | |

### 2- Hevokan li gorî wêneyan temam bikin.



**1-** Ew dikin_________________



**2-** Rodî dike__________________



**3-** Evîn dike_________________



**4-** Dilşa dike_______________

# unîte 4 DUH

- Te duh çi kir?
- Azad çû pirtûkxaneyê
- Geşt û seyran

## A- Te duh çi kir?



















## Dema Boriya Têdeyî

(Li gorî Lêkerên negerguhêz)

| Lêker | Rayeka dema borî | Kirde | Pêveber |
|---|---|---|---|
| çûn | çû | Ez | çûm |
| | | Tu | çûyî |
| | | Ew | çû |
| | | Em | çûn |
| | | Hûn | çûn |
| | | Ew | çûn |



**Dîlan** Rojda, te duh çi kir?
**Rojda** Min duh li fîlmê “Ax” temaşe kir. Min gelekî ji wî fîlmî hez kir.
**Dîlan** Bi rastî? Ez jî dixwazim li wî filmî temaşe bikim.
**Rojda** Te duh çi kir?
**Dîlan** Ez çûm Hêwana Sumerparkê. Ez li pêşaneya wênesaz Fevzî Bîlge geriyam.
**Rojda** Kêfa te ji wêneyên wî re hat?
**Dîlan** Belê, min ji wan hez kir. Ez bi wî re li ser wênesaziyê peyivîm. Min ji wî re qala wêneyên xwe kir. Wî xwest wêneyên min bibîne. Ez ê sibê wêneyên xwe ji wî re bibim.
**Rojda** Pir baş e.

**Hêlîn** Diyar, tu duh çima nehatî? Me rojeke pir xweş derbas kir.
**Diyar** Ez bi bavê xwe re çûm gund, ji bo wê ez nehatim. We çi kir?
**Hêlîn** Em berî nîvro çûn Şaredariya Baxlarê, me li gotûbêjê guhdarî kir.
**Diyar** Gotûbêj çawa bû?
**Hêlîn** Gelekî xweş bû. Beşdar li ser wêjeya nûjen a kurdî peyivîn. Em piştre jî çûn sînemayê, me li fîlmê “Dol” temaşe kir. Ew jî gelekî serkeftî bû. Me piştre bi hev re şîv xwar û her kes çû mala xwe.
**Diyar** Xweziya min bi dilê we.



## Dema Borî (Li gorî Lêkerên gerguhêz)

| Lêker | Rayeka dema borî | Kirde | Bireser | Pêveber |
|---|---|---|---|---|
| xwarin | xwar | Min | sêv | xwar / nexwar (yekjimar) |
| | | Te | | |
| | | Wî | | |
| | | Wê | | |
| | | Me | | xwarin / nexwarin (pirjimar) |
| | | We | | |
| | | Wan | | |

## 1- Kê çi kir?

1- ________ li fîlmê “Ax” temaşe kir.
2- ________ çû Hêwana Sumerparkê.
3- ________ bi Fevzî bîlge re peyivî.
4- ________ bi bavê xwe re çû gund.
5- ________ li gotûbêjê guhdarî kir.

## Hîndarî


### 1- Lêkerên di nav kevanekê de li gorî dema borî bikişînin.



Sînem

Duh ez serê sibê zû ___________ (rabûn). Min xwişka xwe hişyar ___________ (kirin) û me bi hev re taştê ___________ (xwarin). Min firaqên qirêjî ___________ (şûştin). Xwişka min jî nava malê ___________ (malaştin). Piştre, em bi hev re ___________ (derketin). Xwişka min ___________ (çûn) dibistanê. Min jî rojnameyek ___________ (kirîn) û ber bi kargeha xwe ve ___________ (meşîn). Ez saet di heştan de ___________ (gihaştin) kargehê. Min rojname ___________ (xwendin). Saet di heşt û nîvan de min bi dest xebatê ___________ (kirin). Saet di pêncan de min karê xwe ___________ (qedandin) û ji kargehê ___________ (derketin). Ez ___________ (çûn) Kuçeya Hunerê. Min hevalên xwe ___________ (dîtin). Ez saet di heştan de ___________ (gihaştin) malê. Xwişka min li malê ___________ (bûn). Me bi hev re li televîzyonê temaşe ___________ (kirin). Ez saet di dozdehan de ___________ (raketin).

Ez duh di saet çaran de ji dibistanê ___________ (derketin). Ez li serwîsê siwar ___________ (bûn) û ___________ (çûn) malê. Dema ku ez ___________ (gihaştin) malê, min qasekî bêhna xwe ___________ (vedan). Piştre min spartekên xwe ___________ (çêkirin). Piştî ku min spartekên xwe ___________ (qedandin), min şîv amade ___________ (kirin). Xwişka min saet di heştan de ___________ (hatin) malê. Me bi hev re şîv ___________ (xwarin) û li televîzyonê temaşe ___________ (kirin). Ez saet di yazdehan de ___________ (raketin).



Zelal

### 2- Hevokan bi lêkeran temam bikin.

**1-** Sînemê duh sibeyê firaqên qirêjî _______.
**2-** Sînemê li kargehê rojname ___________.
**3-** Sînemê li Kuçeya Hunerê hevalên xwe ___________.
**4-** Sînem saet di heştan de _________ malê.
**5-** Zelal bi serwîsê ___________ malê.
**6-** Zelalê spartekên xwe ___________ û şîv ___________.
**7-** Zelal saet di yazdehan de ___________.

### Li gorî bireserê kişandina lêkerên gerguhêz

| Lêker | Kirde | Bireser | Pêveber |
|---|---|---|---|
| dîtin | Te | ez | dîtim |
| | Min | tu | dîtî |
| | Wan | ew | dît |
| | Wê | em | dîtin |
| | Me | hûn | dîtin |
| | Wî | ew | dîtin |

## Nivîs

### Te duh çi kir?

**3- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî dema borî bikişînin.**

## Stran / Nesrîn

Te ez __________ (kuştin)
Te ez __________ (kuştin)
Dilê min dixwaze te bibîne
Kulîlka sor û şînê
Te ez pîr __________ (kirin) lê dînê
Te ez pîr __________ (kirin) lê dînê




**4- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî dema borî bikişînin.**

**1-** Min duh xwişkên xwe ____________ (dîtin).
**2-** Ez bi Mizgînê re ____________ (meşîn).
**3-** Waneya me saet di pêncan de ____________ (qedîn).
**4-** Min duh êvarî rojname ____________ (ne/xwendin).
**5-** Zozanê duh cilên xwe ____________ (şûştin).
**6-** Me saet di nehan de şîv ____________ (xwarin).
**7-** Te name ____________ (nivîsîn)?
**8-** Te ez ____________ (ne/dîtin)?
**9-** Delalê Rohat ____________ (vexwendin).
**10-** Me ji bo taştê hêkerûn ____________ (çêkirin).
**11-** Ew ____________ (hilkişîn) ser darê.
**12-** Ez duh ____________ (ne/çûn) dibistanê.
**13-** Em deh sal berê ____________ (hatin) Stenbolê.
**14-** Zelal ji ser darê ____________ (ketin).
**15-** Min ji Zelalê hez ____________ (kirin).

**5- Lêkerên din av kevanekê de li gorî dema borî bikişînin.**

## Pêkenok

Rojan rojekê ____________ (çûn) malekê, ____________ (bû) mêvan. Kevaniya malê ji wî re şorbe ____________ (çêkirin) û ____________ (danîn) ber. Lê kevçî ji bîr ____________ (kirin). Rojanî ____________ (dîtin) ku kevçî tune ye, ____________ (gotin):
- Xwişkê, xwişkê! Ji kerema xwe re kêrê bîne!
- Gelo tu yê bi kêrê çi bikî?
- Ez ê guhê xwe jê bikim û bi wî şorbeyê vexwim.




## B- Azad çû pirtûkxaneyê

Ez duh çûm pirtûkxaneyê. Min du pirtûkên çîrokan wergirtin. Ez ê wan bixwînim. Meha çûyî jî min sê pirtûk xwendin. Pirtûkeke bi navê “Çîrokên Gelêrî” hebû. Gelekî kêfa min ji wê re hat. Di wê pirtûkê de der barê Ristemê Zal de çîrokek hebû. Ew çîrok pir balkêş bû. Di vê çîrokê de lehengiya Ristemê Zal pir kêfa min anî. Mirov bi çîrokên wiha dilşad dibe. Wekî din jî gelek çîrokên xweş di vê pirtûkê de hebûn.

**1- Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.**

**1-** Azad duh çû ku derê?

______________________

**2-** Wî çend pirtûk wergirtin?

______________________

**3-** Wî meha çûyî çend pirtûk xwendin?

______________________

**4-** Kêfa wî ji kîjan pirtûkê re hat?

______________________

**5-** Kêfa wî ji kîjan çîrokê re hat?

______________________

## C- Geşt û seyran



**Çiya** Rojbaş Dilhat, tu duh li ku derê bûyî?

**Dilhat** Rojbaş hevalê Çiya, ez duh tevî hevalan çûm ser Kela Wanê.

**Çiya** Te çima gazî min nekir?

**Dilhat** Min telefonî malê kir, lê tu ne li malê bûyî.

**Çiya** Xem nake, geşta we çawa derbas bû?

**Dilhat** Gelekî xweş bû. Em serê sibê zû rabûn. Em bi erebeya Reşo çûn.

**Çiya** Reşo jî hat?

**Dilhat** Belê, ez, Reşo, Gulê, Demhat û Fatê em bi hev re çûn. Em zû gihîştin wê derê. Me ji xwe re cihekî xweş dît û em lê rûniştin. Me taştêya xwe xwar. Dûre, em hilkişiyan ser kelê. Ji ser kelê bajarê Wanê pir xweş xuya dike. Li wir hin zarok hebûn. Wan ji me re qala dîroka Kela Wanê kir. Me gelek wêne kişandin. Paşê em daketin jêr, me firavîn xwar.

**Çiya** Noşîcan be, we çi xwar?

**Dilhat** Me bi xwe re masî birin û li ser manqelê biraştin.

**Çiya** We paşê çi kir?

**Dilhat** Paşê jî Demhat li tembûrê da û me li ber govend girt. Roja me pir xweş derbas bû.

### 1- Pirsên li jêr li gorî diyalogê bibersivînin.

**1-** Dilhat û hevalên xwe çûn ku derê?

______________________________

**2-** Ew bi çi çûn?

______________________________

**3-** Wan piştî taştê çi kir?

______________________________

**4-** Kê ji wan re qala dîroka Kela Wanê kir?

______________________________

**5-** Ji ser kelê dîmenê bajêr çawa bû?

______________________________

**6-** Di firavînê de wan çi xwar?

______________________________

**7-** Wan li ber çi govend girt?

______________________________

## A- Xebata li ser peyvan

### 1- Lêkerên li jêr li gorî dema borî bikişînin û di cihê rast de bi cih bikin.

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| civîn (2) | lîstin (10) | raketin (14) | rûniştin (5) | westîn (13) | sekinîn (3) | çêkirin (7) | ketin (11) |
| kirin (8) | çûn (1) | vegerîn (12) | vêxistin (6) | gerîn (9) | raxistin (4) | | |

Pêr, ez bi hevalên xwe re ____________ seyranê. Em serê sibê zû li ber Deriyê Rihayê ____________ û bi siwareyê çûn.
Em li cihekî bi dar û ber ____________. Me berikek ____________ û em ____________.
Zinar agir ____________ û çay ____________. Me taştê amade ____________ Piştî taştêyê em li derdorê ____________. Piştre me bi gogê ____________ Ferhat û Arda ____________ avê.
Em berêvarkî ____________ malê. Rojeke pir xweş bû. Lê ez pir ____________, lewre jî ez zû ____________ .

# Rojan çû muzeyê

Ez roja yekşemê çûm muzeyê. Bavê min ez birim muzeya bajêr. Me di muzeyê de tiştên gelekî balkêş dîtin. Li muzeyê pêşaneya tiştên kevn û dîrokî hebû. Di pêşaneyê de tiştên mîna qafik, tasik, destar, derzî û tevşo hebûn. Tiştê herî balkêş, xemlên jinan bûn. Xişirên zîvîn û zêrîn gelekî xweşik bûn.

Gerînendeyê muzeyê ji me re qala şaristanî û serdemên berê kir. Di muzeyê de hinek kevir hebûn, li ser wan jî hinek nivîsên cihêreng hebûn. Me tu tişt ji wan nivîsan fêm nekir. Bavê min got, “Ev nivîsên bizmarî ne.” Li ber her nivîsê jî wateya wê hebû. Ez bi vê serdanê hînî pir tiştan bûm.

### 2- Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.

**1-** Rojan roja yekşemê çû ku derê?

______________________

**2-** Kê ew bir muzeyê?

______________________

**3-** Li muzeyê pêşaneya çi hebû?

______________________

**4-** Herî zêde çi bala wî kişand?

______________________

**5-** Kê qala şaristanî û serdemên berê kir?

______________________

**6-** Li muzeyê nivîsên çawa hebûn?

______________________



# B- Xwendin

## 1- Dîlan çû seyranê

Pêr, em bi malbatî çûn geşt û seyranê. Em ne bi tenê bûn, mala xaltîka min jî bi erebeya xwe hatin. Em çûn ber Çemê Dîcleyê. Geşta me gelekî xweş bû. Hewa pir xweş bû. Em serê sibê zû ji malê derketin û bi erebeyê çûn. Ji ber vê yekê jî me cihekî xweş bi dest xist û em rûniştin.

Cihê me bi dar û ber bû û nêzîkî avê bû. Li wê derê kaniyek hebû, ava wê pir cemidî bû. Me tiştên xwe ji erebeyê danîn, me berikek raxist, mînderên xwe jî danîn ser berikê û em rûniştin. Bavê min ji me re hêlekanek çêkir. Bi me re gog jî hebû.

Hinekan dest bi amadekirina taştêyê kir. Hinekan jî agir vêxist. Heçî em zarok bûn, kesî ji me tu kar nexwest. Heta ku xwarin amade bû, em li derdorê geriyan. Piştî demeke kurt taştê amade bû. Me taştêya xwe xwar. Piştre me hemûyan bi hev re bi gogê lîst. Paşê xaltîka min û hevserê wê goşt amade kir, bavê min û diya min jî manqel vêxist. Goşt danîn ser manqelê û me di firavînê de goşt xwar. Me dîsa bi topê lîst û em li hêlakanê siwar bûn. Sîdar û Tacdîn ketin avê. Bi Apê Hogir re nîk hebû. Piştî nîvro wî û bavê min li ber çêm masî girtin û li ser manqelê masî pijandin û me jî goştê masiyan xwar. Çêja goştê masiyan pir xweş bû. Em berêvarî vegeriyan malê. Rojeke pir xweş bû. Lê em pir westiyan, lewre jî em zû raketin.

### a- Bersiva van pirsên li jêr bide.

**1-** Ew kengî çûn geşt û seyranê?

______________________

**2-** Ew çûn ku derê?

______________________

**3-** Ew li cihekî çawa rûniştin?

______________________

**4-** Zarokan heta xwarinê çi kir?

______________________

**5-** Kê ji zarokan re hêlekan çêkir?

______________________

**6-** Wan di firavînê de çi xwar?

______________________

**7-** Piştî firavînê Sîdar û Tacdîn çi kir?

______________________

**8-** Kê masî girtin?

______________________

**9-** Ew kengî vegeriyan malê?

______________________

**10-** Ew çima zû raketin?

______________________

# C- Bikaranîna zimên

### 1- Hevokên li jêr bixin forma boriya têdeyî.

**1-** Ez li televîzyonê temaşe dikim.

______________________________

**2-** Em li ber deryayê dimeşin.

______________________________

**3-** Tu bi ku ve diçî?

______________________________

**4-** Hûn ê li ku derê bimînin?

______________________________

**5-** Ez ê pirtûka Rênas Jiyan bixwînim.

______________________________

**6-** Ez ê nameyekê binivîsim.

______________________________

**7-** Ez ranakevim.

______________________________

**8-** Tu çima naçî?

______________________________

### 2- Hevokên li jêr sererast bikin.

**1-** ez / mal / gihaştin / saet heftan /

______________________________

**2-** rojname / xwendin / ne / min

______________________________

**3-** mal / firavîn / xwarin / min

______________________________

**4-** hatin / ne / duh / Rojan / dibistan

______________________________

**5-** heval / xwe / dîtin / duh / min

______________________________

**6-** Arda / balafir / çûn / Amed

______________________________

# 3- Stran

Malan bar kir lê lê
Çûne waran lê
Dînê lê dînê lê dînara min
Goştê me xwar lê lê
Mişk û maran lê
Keçê lê rindê lê bermaliya min



# 4- Çîroka Keçel û Apê

Li gundekî yekî keçel __________ (hebûn) û sêwî __________ (bû). Ew li bal Apê xwe dima. Keçel yekî fêlbaz bû.

Rojekê keçel, bi apê xwe re __________ (çûn) nav zeviyan. Dem bû nîvro, keçelo birçî bû. Kêra apê xwe __________ (dizîn) û berê xwe da gund, çû cem jinapa xwe û __________ (gotin):

- Apê min got; "Biçe malê, ji jinapa xwe re bibêje bila gayê me şerjê bike, goşt bikelîne û ji me re bîne."

Jinapa wî bawer __________ (ne/kirin). Îcar Keçel got:

- Tu ji min bawer nakî va ye ji te re kêra apê min û wî got:

- Bi vê kêrê şerjê bike.

Bi vî awayî jinapa wî ji wî bawer __________ (kirin) û __________ (rabûn) ga şerjê __________ (kirin). Goşt __________ (kelandin) û __________ (dan) keçel. Keçelî __________ (rahiştin) çend nanên sêlê û berê xwe __________ (dan) nav zeviyan. Li ser zeviyan, apê wî gava ku di destê keçel de goşt û nanên sêlê __________ (dîtin), şaş bû û got:

- Keçel, ev goşt çi ye û te ji ku __________ (anîn)?

Keçel got:

- Apo, gayê mala axê gund li ber mirinê bû, rabû şerjê kir û li gundiyan belav kir. Ev jî li para me __________ (ketin) û min anî.

Apê keçel ji vê gotina wî bawer kir û her duyan bi hev re goşt __________ (xwarin).

Êvarê gava ku __________ (vegerîn) gund, jinapa Keçelo ji hevserê xwe re got:

- Mêro, ma te çima xwest em gayî serjê bikin?

Apê Keçelo got:

- Gayê çi?

Jina wî got:

- Keçelî kêra te anî, ji min re wisa got û min jî şerjê kir.

Apê keçelo __________ (ne/zanîn) wê çi xweliyê li serê xwe bike, wî Keçel ji mala xwe __________ (qewirandin). (___)




# unîte 5 SERBORÎ

- Baran bariye
- Tu qet çûye Wanê
- Dema ku ...
- Dema em zarok bûn

## A- Baran bariye

*Bêhna qurnefîlê tê ji cixareya min,*
*Bihar hatiye çiyayên welatê min...*










## Dema boriya dûdar (Li gorî Lêkerên negerguhêz)

| Lêker | Kirde | Forma dema boriya têdeyî | Qertafên dema boriya dûdar | Pêveber |
|---|---|---|---|---|
| Çûn | Ez | çûm | e | çûme / neçûme |
| | Tu | çûyî | (y)e | çûye / neçûye (çûyiye / neçûyiye) |
| | Ew | çû | ye, iye | çûye / neçûye |
| | Em | çûn | e | çûne / neçûne |
| | Hûn | çûn | e | çûne / neçûne |
| | Ew | çûn | e | çûne / neçûne |

# Pelîn ji duçerxeyê ketiye

**Dîlan** Dayê, xêr e? Dengê te nexweş tê.
**Dilşa** Qet nepirse keça min. Pelîn ji duçerxeyê ket, piyê wê şikest.
**Dîlan** Wer mebêje! Hûn niha li ku derê ne? Êşa wê pir heye?
**Dilşa** Niha baş e. Em çûn nexweşxaneyê, bijişkî piyê wê xist cilsê. Em vegeriyan malê.
**Dîlan** Ez jî niha têm malê.





**Azad** Dîlan, xêr e? Tu xemgîn xuya dikî?
**Dîlan** Qet mepirse. Niha diya min li min geriya, Pelîn ji duçerxeyê ketiye, piyê wê şikestiye.
**Azad** Derbasî be. Diya te ew biriye nexweşxaneyê?
**Dîlan** Belê, ew çûne nexweşxaneyê. Bijîşkî piye wê xistiye cilsê. Ew niha jî vegeriyane malê. Divê ez jî biçim malê.
**Azad** Ez jî bi te re werim.
**Dîlan** Baş e, ka em biçin.

**1- Hevokên bi dema boriya têdeyî û yên bi dema boriya dûdar hatine nivîsandin bidin ber hev.**

| **Dilşa** | **Dîlan** |
|---|---|
| Pelîn ji duçerxeyê ket. | Pelîn ji duçerxeyê ketiye. |
| Piyê wê şikest. | Piyê wê şikestiye. |
| Min ew bir nexweşxaneyê. | Diya min ew biriye nexweşxaneyê. |
| Em vegeriyan malê. | Ew vegeriyane malê. |

## Li gorî lêkerên gerguhêz

| Lêker | Kirde | Bireser | Pêveber |
|---|---|---|---|
| xwendin | Min | pirtûk | xwendiye / nexwendiye (yekjimar) |
| | Te | | |
| | Wî / wê | | |
| | Me | | xwendine / nexwendine (pirjimar) |
| | We | | |
| | Wan | | |

## B- Tu qet çûye Wanê?



**Rojda** Hêvind tu qet çûye Wanê?

**Hevind** Belê ez par bi malbata xwe re çûm Wanê. Em li wir hefteyekê man. Tu?

**Rojda** Na, ez qet neçûme Wanê, ez pir dixwazim biçim.



**Azad** Dîlan te qet pirtûkên Dilawer Zeraq xwendine?

**Dîlan** Na, min qet pirtûkên wî nexwendine. Te xwendine?

**Azad** Belê, min pirtûka wî ya bi navê “Kakil” xwendiye. Pir xweş e, tu jî bixwîne.



**Hêvî** Serdil te qet li stranên Eyşe Şan guhdarî kiriye?

**Serdil** Na, min qet li stranên wê guhdarî nekiriye. Te?

**Hêvî** Belê, kêfa min gelekî ji stranên wê re tê.

### 1- Pirsên li jêr bibersivînin.

**1-** Hêvind qet çûye Wanê?

**2-** Rojda qet çûye Wanê?

**3-** Dîlanê qet pirtûkên Dilawer Zeraq xwendine?

**4-** Azadî qet pirtûkên Dilawer Zeraq xwendine?

**5-** Serdilî qet li stranên Eyşe Şan guhdarî kiriye?

**6-** Hêviyê qet li stranên Eyşe Şan guhdarî kiriye?

## Li gorî bireserê kişandina lêkerên gerguhêz

| Lêker | Kirde | Bireser | Pêveber |
|---|---|---|---|
| dîtin | Te | ez | dîtime |
| | Min | tu | dîtiye |
| | Wan | ew | dîtiye |
| | Wê | em | dîtine |
| | Me | hûn | dîtine |
| | Wî | ew | dîtine |

## Hîndarî

**1- Hevokên li jêr bixin forma dema boriya dûdar.**

**1-** Şerzan duh çû Midyadê.

______________________________

**2-** Hogirî duh hevalên xwe dîtin.

______________________________

**3-** Wan pêr civînek li dar xist.

______________________________

**4-** Ew duh dereng hatin malê.

______________________________

**5-** Diya min ji min re fîstanek kirî.

______________________________

**6-** Zelalê guldank şikand.

______________________________

**7-** We bername amade kir?

______________________________

**8-** Wê taştê xwar?

______________________________

**2- Hevokên li jêr bixin forma dema boriya dûdar.**




**1-** Dîlan duh çûye sûkê.
Wê ji xwe re dêreyeke sor kiriye.




**2-** Azad ______________________________
Wî ______________________________




**3-** Hêlîn ______________________________
Ew ______________________________




**4-** Qencoyî______________________________
Wî ______________________________




**5-** Serhatî______________________________
Wan ______________________________

## C- Dema ku



**Diyar** Duh dema ku ez diçûm malê, min dît ku komek mirov li Parka Koşuyoluyê li hev civiyane.

**Azad** Gelo çima?

**Diyar** Komeke şanoyê lîstikek dilîst.

**Azad** Lîstikê qala çi dikir?

**Diyar** Lîstik li ser parastina xweza û dar û beran bû.

**Azad** Çend lîstikvan hebûn?

**Diyar** Sê lîstikvan hebûn. Di lîstikê de wan dixwest ku mirov ji bo pêşeroja xwe xwezayê biparêzin. Lîstikê bal dikişand ser afatên ekolojîk. Kesên li derdorê jî bi baldarî lê temaşe dikir û bi çepikên xwe piştgirî dida wan.

**Azad** Himmm, balkêş e.

**Diyar** Erê, bi rastî jî lîstikeke xweş bû. Lîstikvan jî pir bi serkeftî bi rola xwe radibûn.

**1- Ji hevokên jêrîn ji bo yên rast stûna ( r ) ji bo yên çewt stûna ( ç ) xêz bikin.**

| | Hevok | r | ç |
|---|---|---|---|
| 1 | Duh dema ku Diyar diçû malê, rastî hevalên xwe hat. | | ✓ |
| 2 | Lîstik li ser parastina xweza û dar û beran bû. | | |
| 3 | Lîstikvanan dixwest ku mirov xwezayê biparêzin. | | |
| 4 | Temaşevanan bi dirûşman piştgirî dida lîstikê. | | |
| 5 | Lîstik qet ne xweş bû. | | |
| 6 | Lîstikvan serkeftî bûn. | | |

## Dema boriya berdest Li gorî lêkerên negerguhêz

| Lêker | Qertafa dema niha | Rayeka dema borî | Kirde | Pêveber |
|---|---|---|---|---|
| çûn | di | çûm | Ez | diçûm / nediçûm |
| | | çûyî | Tu | diçûyî / nediçûyî |
| | | çû | Ew | diçû / nediçû |
| | | çûn | Em | diçûn / nediçûn |
| | | çûn | Hûn | diçûn / nediçûn |
| | | çûn | Ew | diçûn / nediçûn |



**2- Di axaftina li jêr de binê lêkerên bi dema boriya berdest xêz bikin.**

**Pelîn** Îro di dersê de mamoste pir hêrs bû û bi xwendekaran qarî.
**Dilşa** Çima?
**Pelîn** Dema wî wane vedigot, tu kesî li wî guhdarî nedikir. Hin zarokan li hev didan, hin ji wan dipeyivîn. Keçekê stran bi dengekî bilind digot, yekê wêne xêz dikir. Du kurikan jî jêbir diavêtin hev.
**Dilşa** Te çi dikir?
**Pelîn** Min jî li hevalên xwe dinêrî.
**Dilşa** Pir şerm e. Divê hûn li mamosteyê xwe guhdarî bikin.

**3- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî dema boriya berdest bikişînin.**

**1-** Dema ez ji malê derketim, baran ___________ (barîn).

**2-** Dema ew ___________ (çûn) malê, rastî birayê xwe hat.

**3-** Zarokan li kuçeyê goga piyan ___________ (lîstin).

**4-** Dema em li nava bajarê Stenbolê ________ (gerîn), me riya xwe winda kir.

**5-** Dema ez ji xewê hişyar bûm, dayika min taştê amade ___________ (kirin).

**6-** Dema gundiyan li çem kinc ___________ (şûştin), lehî rabû.

**7-** Dema wê duçerxe ___________ (ajotin) ket xwarê.

**8-** Gava wî dar ___________ (birîn), notirvanan ew girt.

**9-** Dema apê min hat, me şîv ___________ (xwarin).

**10-** Dema min ew dît, wê zaroka xwe ___________ (birin) nexweşxaneyê.

# Li gorî lêkerên gerguhêz

| Kirde | Bireser | Pêveber |
|---|---|---|
| Min | çîrok | digot / digotin |
| Tu | | |
| Wî / Wê | | |
| Me | | |
| We | | |
| Wan | | |



## D- Dema em zarok bûn...

| | |
|---|---|
| **Dîlan** | Dema em zarok bûn, me lîstikên gelek xweş dilîstin. |
| **Narîn** | Erê, em tim li derve bûn, em heta derengiya şevê li kuçeyan digeriyan. |
| **Rojda** | We qet lîstika “Gupê” dilîst? |
| **Narîn** | Nayê bîra min. Ew çawa bû? |
| **Rojda** | Yekî digot “Yek, du, sê, gup!” Piştî dengê “gup”, her kesî devê xwe digirt û bêdeng dima. Lîstikvanê pêşiyê ji bo kenandina lîstikvanan tevdigeriya. Dema ku yek dikenî, ji lîstikê derdiket. |
| **Dîlan** | Ew lîstik tê bîra min. Lê me herî zêde lîstika “Tepê” dilîst. Yek ji me dibû mak û yên din direviyan. Mak jî dida pey wan. Dema ku mak destê xwe li yekê dixist, digot; “Tepa min li te" û direviya. |
| **Narîn** | Ez herî zêde bêriya çîrokan dikim. Dapîra min bi şev ji me re çîrok digotin. |
| **Rojda** | Xwezî li wan rojan. |

**1- We di zaroktiya xwe de kîjan lîstik dilîstin?**

**2- Di nivîsa li jêr de lêkeran li gorî dema boriya berdest bikişînin.**

Dema em zarok bûn di sersalê de, em serê sibehê li hev ____________ (civîn). Yek ji me ____________ (bûn) “Kose”. Yek jî ____________ (bûn) “Bûk”. Kose û Bûk ____________ (ketin) milên hev û zarokên din jî ____________ (dan) pey wan, mal bi mal ____________ (gerîn). Li her malê, bûk û kose demekê ____________ (reqisîn). Zarokan ji maliyan re ____________ (gotin);

*“Serê salê, binê salê*
*Xwedê kurekî bide vê malê”*

Maliyan basteq, mewîj, benî, dendik û nok ____________ (dan) wan.

## Dema ku / Gava ku...

(Demên Borî)

Dema ku ez diçûm malê, baran dibarî.
**(D. B. Berdest)** **(D. B. Berdest)**

Gava ku ez derketim derve, berf dibarî.
**(D. B. Têdeyî)** **(D. B. Berdest)**

Dema ku em diçûn malê, me qeza kir.
**(D. B. Berdest)** **(D. B. Têdeyî)**

# Li Gund



Zarokatiya min li gund derbas bû. Ew roj pir xweş bûn. Ez niha bêriya wan rojan dikim. Em ji serê sibehê heta êvarê li derve bûn. Em li kuçe û kolanan digeriyan, me bi hev re dilîst. Me havînan di golê de avjenî dikir.
Em sibehê zû radibûn û me taştê dixwar. Birayên min pez dibir mêrgan. Ez jî pirî caran bi wan re diçûm. Hin şivanên gund gelekî xweş li bilûrê dida. Me bi kêfxweşî guhdariya wan dikir. Carinan jî ez bi bavê xwe û apê xwe re diçûm ser zeviyan. Li zeviyan cotyaran cot dikir û min jî li wan temaşe dikir.
Xwişk û dotmamên min diçûn bêriyê û li wir pez didotin. Carinan xwişka min ez jî bi xwe re dibirim. Diya min ji şîr mast, to û penêr çêdikirin. Çêja wan gelekî xweş bû. Hê jî tehma wan di bin zimanê min de ye.
Ez gelekî bêriya şevbuhêrkan dikim. Şevên zivistanê gundî li hin malan kom dibûn. Carinan hin dengbêjan kilam digotin û şev xweştir dibûn. Ew roj tu carî ji bîra min naçin.

**3- Hevokan bi lêkeran temam bikin.**

**1-** Zarokên gund heta êvarî __________________.
**2-** Zarokan havînan di golê de __________________.
**3-** Şivanan li ber pêz li bilûrê __________________.
**4-** Keçên gund __________________ bêriyê.
**5-** Jinên gund ji şîr mast, to û penêr __________________.
**6-** Dengbêjan di şevbuhêrkan de kilam __________________.

## Nivîs

**Hûn jî der barê zaroktiya xwe de nivîsekê binivîsin.**



# A- Xebata li ser peyvan

### 1- Navdêrên li jêr li rex wateyên wan binivîsin.

| mêrg | mewîj | zevî | bêrîvan | şivan | hevsengî | xweza | cotyar |
|---|---|---|---|---|---|---|---|

**1-** Çandiyar ____________________
**2-** Kesên ku pez didoşin ____________________
**3-** Kesên ku diçin ber pêz ____________________
**4-** Tiriyê hişk-kirî ____________________
**5-** Sirûşt, tebîet ____________________
**6-** Cihê bi giha, çêregeh ____________________
**7-** Cihê çandiniyê ____________________
**8-** Hevkêşe ____________________

# B- Bikaranîna Zimên

### 1- Beşên hevokê bigihînin hev.

**1-** Dema diya min stranên dawetê digotin
**2-** Dema berf dibariya
**3-** Dema pîrîka min çîrok digotin
**4-** Dema ku havîn dihat
**5-** Dema ku mele bang dida
**6-** Dema tarî diket erdê

**a-** bavê min radibû nimêjê.
**b-** zarok vedigerîn malê.
**c-** em di xew re diçûn.
**d-** şivanan pez dibir zozanan.
**e-** her kes radibû govendê.
**f-** zarokan berfemêr çêdikir.

| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 |
|---|---|---|---|---|---|
| e | | | | | |

**2- Di axaftina li jêr de lêkeran li gorî dema boriya berdest bikişînin.**



**Rojda** Cejnên niha qet ne xweş in. Xwezî bi cejnên berê.

**Dîlan** Bi gotina te ye. Dema em zarok bûn, cejn pir xweş derbas __________ (bûn).

**Rojda** Berî cejnê du sê rojan diya min em __________ (birîn) sûkê ji me re kincên nû __________ (kirîn).

**Dîlan** Belê, rojên cejnê em sibehê zû __________ (rabûn) û piştî taştê me destên mezinan __________ (ramûsandin). Wan jî em maç __________ (kirin) û pere __________ (dan) me.

**Rojda** Piştre jî em ji malê __________ (derketin), __________ (çûn) malên cîranan û me şekir berhev __________ (kirin).

**Dîlan** Mixabin, bavê min destûr __________ (ne/dan) min. Ez __________ (ne/çûn) nav malan. Lê gelek mêvan __________ (hatin) mala me û ez bi vê yekê şa __________ (bûn).

**Rojda** Bi rastî jî ez bêriya wan rojan dikim.

**3- Lêkerên li jêr li gorî dema boriya dûdar bikişînin.**

Ez piştî deh salan li gundê zaroktiya xwe me. Li gund gelek tişt __________ (guherîn), kêm tişt wekî berê __________ (man). Gund hema bêje kavil û weran __________ (bûn). Xaniyê ku tê de mezin bûm __________ (hilweşîn), li gund ciwan __________ (ne/man), hemû __________ (çûn) bajarên mezin. Serjimêra gund pir kêm __________ (bûn). Ev rewş min gelekî xemgîn dike.



# unîte 6 ROJÊN BERÊ

Serpêhatî · Bûyereke ji dîrokê · Kesayetiyek · Çîrok

## A- Serpêhatî

### Vegera li welêt

Navê min Hêvî ye, ez ji Amedê me, lê ez li bajarê Stenbolê mezin bûme. Min ji mêj ve dixwest ez welatê xwe bibînim, lê heta vê havînê ew derfet bi dest neket. Vê havînê ez tevî sê hevalên xwe çûm welêt. Em li gelek cihan geriyan, me gelek cihên xweş dîtin, ez pir kêfxweş bûm.

Roja şemiyê em  bi balafirê çûn Amedê. Ji esmanan bajar pir xweş xuya dikir. Tiştê serê pêşîn bala mirov dikişand, sûrên Amedê bûn.

Li balafirgehê dotmam û pismamên min em pêşwazî kirin. Em çûn mala apê min. Roja yekşemê zarokên apê min em  li cih û warên dîrokî yên Amedê gerandin. Gelek cihên dîrokî li wir hene. Minareya Çarling û Pira Dehderî gelekî balkêş bûn.

Roja duşemê em bi otobûsê çûn Heskîfê û em hilkişiyan cihê herî bilind ê bajêr û me li derdorê temaşe kir. Dîmenê ji wir pir xweş bû. Piştre me li ber avê firavîn xwar.  Em li firoşgehên kevn geriyan. Wê şevê em  li wir li otelê man.

Roja sêşemê em çûn Midyadê û em li cih û warên dîrokî geriyan. Midyad bajarekî pirçandî ye.  Mirovên ji qewm û baweriyên cuda bi hev re dîjin.

Wê êvarê em derbasî Mêrdînê bûn, êvaran Mêrdînê pir xweş xuya dikir. Mêrdîn li ser girekî ava bûye. Avahiyên Mêrdînê bi piranî dîrokî ne.  Em li wir jî çûn cih û warên dîrokî.

Roja pêncşemê  gera me bi dawî bû. Em  zîvirîn Amedê û em çûn Sûka Şewitî. Me  ji heval û hogiran re hinek diyarî kirîn. Paşê me li Kirklar Dagi firavîn xwar. Ji wir Baxçeyê Hewselê pir xweş xuya dikir. Roja yekşemê serê sibehê me ji mazûvanên xwe xatir xwest. Em çûn balafirgehê û vegeriyan Stenbolê.

### Hin lêkerên hevedudanî

| | |
|---|---|
| **xuyakirin** | Bajarê Amedê ji balafirê pir xweş xuya dike. |
| **bidestxistin** | Me bi têkoşînê mafên xwe bi dest xistin. |
| **mezinbûn** | Zozan li Sêrtê mezin bûye. |
| **kêfxweşbûn** | Ez bi hatina te kêfxweş bûm. |
| **pêşwazîkirin** | Me ew li ber dêrî pêşwazî kir. |
| **bidawîbûn** | Civîna me dereng bi dawî bû. |
| **xatirxwestin** | Bavê min xatir ji me xwest û çû. |

**1- Peyvên li jêr bigihînin wateya wan.**

| | |
|---|---|
| **1-** derfet | **a-** malovan |
| **2-** balafir | **b-** tarîxî |
| **3-** bawerî | **c-** cihê |
| **4-** dîrokî | **d-** îman |
| **5-** dîmen | **e-** xuyang, menzere |
| **6-** cuda | **f-** teyare |
| **7-** diyarî | **g-** delîve, îmkan |
| **8-** mazûvan | **h-** xelat |

| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| g | | | | | | | |

**2- Ji hevokên jêrîn ji bo yên rast stûna ( r ) ji bo yên çewt stûna ( ç ) xêz bikin.**

| | Hevok | r | ç |
|---|---|---|---|
| 1 | Hêvî li Amedê mezin bûye. | | ✓ |
| 2 | Ew vê havînê çû Amedê. | | |
| 3 | Apê wî ew pêşwazî kirin. | | |
| 4 | Ew pêşî çûn Mêrdînê. | | |
| 5 | Wan li Heskîfê li ber avê firavîn xwar. | | |
| 6 | Midyad bajarekî pirçandî ye. | | |
| 7 | Ew roja pêncşemê vegerîn Stenbolê. | | |

## Ravekên rêzîn

Em li cih û warên dîrokî yên Amedê gerandin.
Ew hilkişiyan cihê herî bilind ê bajêr.
Em çûn mizgefta bajêr a mezintirîn.
Keça apê min ê mezin li bajêr dijî.
Keça xalê min a biçûk diçe zanîngehê.
Hevalên birayê min ên dibistanê gelekî ji wî hez dikin.

**3- Cihên vala bi veqetandekan dagirin.**

**1-** Mijara fîlmê dawîn ___ Behman Qubadî balkêş e.
**2-** Ferhenga Zana Farqînî ___ Kurdî-Tirkî pir bi kêrî min hat.
**3-** Guharên dayika min ___ zêrîn winda bûne.
**4-** Birca Belek ___ li Cizîrê kavil bûye.
**5-** Çiyayên welatê me ___ berz û bilind hêjayî dîtinê ne.

## Nivîs

**Hûn jî serboriyeke xwe binivîsin.**



## B- Bûyereke ji dîrokê



Di 16'ê adara 1988'an de balafirên Iraqê bi çekên kîmyewî êrîşî bajarê Helebçeyê kir.

Di encama vê êrîşê de 6 hezar û 350 kesî jiyana xwe ji dest da. Berî vê komkujiyê di navbera Iraq û Îranê şer hebû. Pêşmergeyên kurd ku li dijî rejîma Sedam şer dikir Helebçe, Înap û Ducayde bi dest xistin.

Li ser vê yekê rejîma Beasê ku li hemberî hêzên kurd di tengasiyê de bû, dest bi operesyoneke berfireh kir. Navê operasyonê jî Enfal bû. Balafirên şer ên Iraqê, du rojan bi ser Helebçeyê de jehr barand.

Di 19'ê gelawêjê de di navbera Iraq û Îranê de agirbest pêk hat û rejîma Sedam êrîşên xwe yên li ser kurdan zêde kirin. Leşkerên Sedam careke din berê xwe da Helebçeyê û êrîşî ser gel kir. Di vê operasyona ku bi rojan dom kir de jî 200 kesî jiyana xwe ji dest da.

Komkujiya Helebçeyê di dîroka kurdan de bûyera herî dilsoj e.

**1- Hemwateyên peyvên li jêr di nivîsê de bibînin û li bin wan binivîsin.**

| sîleh | hicûm | tevkujî | dorfireh | pevçûn | qewam | şersekinandin | teyare |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| ***çek*** | | | | | | | |

**2- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.**

**1-** Komkujiya Helebçeyê kengî pêk hat?

______________________

**2-** Di komkujiyê de çend kesan jiyana xwe ji dest da?

______________________

**3-** Navê operasyona komkujiyê çi bû?

______________________

**4-** Di 19'ê gelawêjê de di navbera kîjan welatan de agirbest pêk hat?

______________________

## Cînavka girêkî "ku"

- Gotûbêja ku em duh beşdar bûn, der barê wêjeya nûjen de bû.
- Min ev nameya ku te ji min re nivîsî, deh caran xwend.
- Hevalê ku tu li bendê yî îro nayê.
- Hinekan gustîla ku te diyarî min kir dizî.

## Hin lêkerên hevedudanî

| | |
|---|---|
| **êrîşkirin** | Tu çima êrîşî min dikî? |
| **şerkirin** | Duh du kesan bi hev re şer kir. |
| **pêkhatin** | Di sedsala bîstan de şerên giran pêk hatin. |
| **pevçûn** | Ez û hevalê xwe em pev çûn. |

## Nivîs

**Bûyereke ku li gorî we girîng e binivîsin û di fêrgehê de pêşkêşî hevalên xwe bikin.**

## C- Kesayetiyek

# Feqiyê Teyran


*Ne ba yî, ne baran î*
*Ne lêmişt î, ne nar î*
*Hunerê giran î, şemala dilan î*
*Teyrê goman î, dengbêjê jaran î*

Feqiyê Teyran xwe wekî helbestvanê jar û bindestan bi nav kiriye. Wî helbestên xwe bi zimanê gel nivîsandine. Li gorî baweriya hin mirovan Feqiya Teyran bi zimanê teyran dizanî. Li ser vê yekê gelek çîrok jî hene. Lewre wî ev nav li xwe kiriye. Ew di sala 1563'yan de li Miksê hatiye dinyayê. Di helbesta “Dilo rabe” de wiha gotiye:

*Mîm û Hê heftê felek çûn*
*Ji hîcretê dewran gelek çûn*
*Sal hezar û çil û yek çûn*

Feqiya Teyran di helbestên xwe de nasnavê “Mîm û Hê” bi kar aniye. Li gorî vê helbestê, Feqiyê Teyran dema ku ev helbest nivîsandiye 70 salî bûye û sal jî 1041'ê koçî (1631'ê mîladî) ye. Dîroka mirina wî ne diyar e. Helbestên Feqiyê Teyran ên herî zêde gel bi wan dizane “Ey avê av” û “Ay dîlberê” ne. Ev her du helbest jî bûne stran û li gel jî belav bûne.

**Ay Dîlberê**
*Ey dîlberê wey dîlberê*
*Feryad ji destê keserê*
*Avek ji ava kewserê*
*Wêran ez im malê'm xirab*


**Arif Sevinç / Feqiyê Teyran**

### 1- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.

**1-** Feqiyê Teyran kengî û li ku derê hatiye dinyayê?

______________________________

**2-** Çima navê wî bûye Feqiyê Teyran?

______________________________

**3-** Feqiyê Teyran xwe çawa bi nav kiriye?

______________________________

**4-** Wî ji xeynî navê Feqiyê Teyran kîjan nav bi kar aniye?

______________________________

**5-** Kîjan helbestên Feqiyê Teyran bûne stran?

______________________________

## Hin lêkerên hevedudanî

**binavkirin**
Gel ew wekî pêşeng bi nav kir.

**nav li ___ kirin**
Min navê dayika xwe li keçа xwe kir.



## D- Çîrok

# Rovî û qijîk

Hebû tunebû, li welatekî qijikeke ehmeq û roviyekî xapînok hebû. Rojekê qijikê ji xwe re ji ciyekî parçeyek penêr dîtibû. Penêrê xwe kiribû devê xwe û li ser guliyê darekê veniştibû. Di wê demê de rovî di wir re derbas dibû. Rovî dît ku qijikek li ser darê veniştiye û parçeyek penêr di devê wê de ye. Di cih de xwest ku qijikê bixapîne û wî penêrî ji wê bistîne. Rovî xwest ku qijik bipeyive û penêr ji devê wê bikeve. Lewma jî wî bi gotinên xweş pesnê qijikê da. Li ser van gotinan gelekî kêfa qijikê hat. Ew bi gotinên rovî xapiya. Wê devê xwe vekir û penêr ji devê wê ket. Rovî penêr ji erdê rakir û xwar.

**1- Di çîroka li jor de binê lêkerên di forma çîrokiya dema boriya têdeyî de xêz bikin.**

**2- Li gorî mînaka li jêr hevokan bigihînin hev.**

**Mînak**

*Diya min taştê amade kir. Ez hişyar bûm.*
*Dema ku ez hişyar bûm, diya min taştê amade kiribû.*

**1-** Mamoste dest bi waneyê kir. Ez ketim fêrgehê.
Gava ku ______________________

**2-** Birayê min karê xwe qedand. Ez ji bajêr vegeriyam.
Dema ku ______________________

**3-** Xwarin nema. Ez gihîştim ser sifreyê.
Dema ku ______________________

**4-** Baran sekinî. Em derketin derve.
Dema ku ______________________

**5-** Gur ketin nav pêz. Şivan hişyar bû.
Dema ku ______________________

## Çîrokiya dema boriya têdeyî

| Cînavk | Rayeka dema borî ya lêkerê | Tîpa alîkar | lêkera alîkar “bûn” | Qertafên kesane | Çîroka dema boriya têdeyî |
|---|---|---|---|---|---|
| Ez | ket | i | bû | m | ketibûm / nehatibûm |
| Tu | | | | yî | ketibûyî / nehatibûyî |
| Ew | | | | - | ketibû / nehatibû |
| Em | | | | n | ketibûn / nehatibûn |
| Hûn | | | | n | ketibûn / nehatibûn |
| Ew | | | | n | ketibûn / nehatibûn |

**3- Lêkerên di nava kevanekê de bikin çîrokiya dema boriya têdeyî.**

# Dendikê alûyê

Dayê ji zarokên xwe re alû __________ (kirîn). Wê alû __________ (kirin) taseke mezin û __________ (danîn) ser maseyê. Wê dixwest piştî şîvê wan li zarokên xwe parve bike.

Lawê wê Wanya, heta wê rojê qet alû __________ ( ne/xwarin). Loma alûyan bala wî pir dikişand. Ew li dorhêla alûyan diçû dihat, dida lotikan, li wan dinihêrî û bêhn dikirin.

Wî hew dît ku di odeyê de bi tenê maye. Ma êdî kes dikare Wanya bigire! Hema rahişt alûyekê û bi carekê re avêt devê xwe.

Dayê berî şîvê alû hejmartin. Yek kêm bû. Wê çû û ji mêrê xwe re got.

Mêrik, zarokên xwe li dora maseyê civandin û ji wan pirsî:

– Delaliyên min! Alûyek kêm e, ma kê ji we xwariye?

Hemûyan bi hev re got:

– Na, me nexwariye.



Lê, rûyê Wanya weke xwînê sor __________ (bûn) û wî got:

– Na, min tiştek nebiriye.

Piştî van gotinan bavê zarokan axaftina xwe wiha domand:

– Kesê ku ew alû xwariye, helbet tiştekî nebaş kiriye. Lê ji wê xirabtir jî tişt hene. Di alûyê de dendik heye. Kesê ku dendika wê bixwe, di nav rojekê de dimire. Tiştê herî xirab ev e. Tirsa min ji vê yekê ye.

Rûyê Wanya zer bû û qîjînî bi wî ket:

– Na min dendik nexwar, min dendik di paceyê re avêt derve!


Hemû bi hev re keniyan, lê Wanya dest bi girî kir. **(Tolstoy)**

| **Lêker** | **Çîrokiya dema boriya têdeyî (Kesên sêyem)** |
|---|---|
| hatin | hatibû / hatibûn |
| xwestin | xwestibû / xwestibûn |
| kirin | kiribû / kiribûn |
| çûn | çûbû / çûbûn |
| bûn | bûbû / bûbûn |
| şûştin | şûştibû / şûştibûn |
| man | mabû / mabûn |
| avêtin | avêtibû / avêtibûn |

# A- Xebata li ser peyvan

### 1- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| zêdekirin | xuyakirin | pevçûn | mezinbûn | xatirxwestin | pêşwazîkirin | bidawîkirin | pêkhatin |



1- Ji ser bircên Amedê Pira Dehderî _________ _________
2- Ez li Navçeya Qoserê _________ _________
3- Me mêvanên xwe li balafirgehê _________ _________
4- Di vê sedsalê de hê jî li seranserê cîhanê bi dehan şer _________ _________
5- Ciwan Haco konsera xwe bi strana "Zînê" _________ _________
6- Adar ji diya xwe _________ _________ û çû.
7- Duh xwendekarên Zanîngehê _________ _________, gelek ji wan birîndar bûn.
8- Qeyrana aborî hejmara bêkaran _________ _________


### 2- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| çek | êrîş | komkujî | bûyer | derfet | dîrokî | bawerî | diyarî |

**1-** Ji ber ku li gundan _________ aborî kêm in, ciwanên gundan berê xwe didin bajaran.
**2-** _________ Şerê Duyemîn ê Cîhanê bûye mijara gelek fîlm û pirtûkan.
**3-** Bajarê Mêrdînê bajarekî _________ ye.
**4-** Divê ez ji bo rojbûna hevala xwe _________ bikirim.
**5-** Li gorî _________ min tu neheqiyê li hevalên xwe dikî.
**6-** Erdheja Marmarayê ya sala 1999'an _________ mezin bû.
**7-** Amerîkayê bi bombeya atomê _________ Hîroşîma û Nagazakî kir.
**8-** Bikaranîna _________ kîmyewî sûcekî li dijî mirovahiyê ye.

## B- Xwendin

# Ehmedê Xanî



Qulîxanê Mehmed

*Ez mame di hîkmeta Xwedê de*
*Kurmanc di dewleta dinê de*
*Aya bi çi wechî mane mehrûm?*
*Bilcumle ji bo çi mehkûm?*

Di nav helbestvanên kurd ên klasîk de yê herî navdar Ehmedê Xanî ye. Piraniya kurdan navê wî bihîstiye. Ehmedê Xanî helbestvanê pêşî ye ku di helbestên xwe de qala dewleteke kurdî û rizgarbûna kurdan kiriye. Li gorî Eladîne Secadî, Ehmedê Xanî sertacê nivîskar û helbestvanên kurd e. Gelek kes jî wî wekî fîlozofekî kurd dibînin.

Ehmedê Xanî di sala 1651'ê de hatiye ser rûyê cihanê; li gelek bajarên Kurdistanê xwendiye, paşê çûye bajarê Bazîdê, li wê derê medreseyek vekiriye û bûye mamosteyê zarokên kurd. Wî ji bilî kurdî bi farisî, erebî û tirkî jî dizanî. Li gorî agahiyan Ehmedê Xanî di sala 1707'an de li Bazîdê  koça dawîn kiriye û gora wî li Bazîdê nêzî Qesra Îsheq Paşa ye. Niha jî ziyaretgeha gel e.

Berhemên wî yên navdar ev in; Mem û Zîn, Nûbara Biçûkan û Eqîda Îmanê. Ehmedê Xanî di hemû jiyana xwe de hewl daye ku bingeha perwerdehiya bi kurdî dayne. Berhemên xwe yên bi navê "Nûbara Biçûkan" û "Eqîda Îmanê" jî bi vê mebestê nivîsandine. Di şahesera wî ya bi navê "Mem û Zîn" de her çiqas dabaşa evîna Mem û Zînê hebe jî bîr û ramanên wî yên der barê gerdûn, hebûn û mirovan de tê de cih digirin.

### 1- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.

**1-** Ehmedê Xanî kengî hatiye cîhanê?

__________________________________________

**2-** Eladîn Secadî der barê Xanî de çi gotiye?

__________________________________________

**3-** Wî ji bilî kurdî bi kîjan zimanan dizanî?

__________________________________________

**4-** Ehmedê Xanî di berhema xwe ya bi navê "Mem û Zîn" de li ser çi sekiniye?

__________________________________________

**5-** Ehmedê Xanî pirtûka xwe ya bi navê "Nûbara Biçûkan" ji bo çi nivîsandiye?

__________________________________________

## Nivîs

### Hûn jî der heqê kesekê/î de binivîsin.

## C- Bikaranîna zimên

**1- Di nivîsa li jêr de lêkeran li gorî dema boriya dûdar bikişînin.**

# Celadet Bedirxan



Celadet Bedirxan ji malbata Bedirxan Paşa, lawê Emîn Elî Bedirxan e. Ew di 26‘ê Avrêla 1897’an de li Stenbolê ji dayik ___________ (bûn). Mîr Celadet li ser alfabeya kurdî ya latînî û li ser rêzimana kurdî xebatên giranbuha ___________ (kirin). Bingeha rêzimana kurdî ya nûjen ___________ (danîn). Di warê rewşenbîriyê de jî xebatên girîng pêk ___________ (anîn). Bi çend hevalên xwe yên wekî Osman Sebrî, Cegerxwîn, Qedrî Cemîl Paşa û Qedrîcan re di 15’ê Gulana 1932’yan de dest bi weşandina kovara Hawarê ___________ (kirin). Niha kurd 15’ê Gulanê wekî Cejna Zimanê Kurdî pîroz dikin. Mîr Celadet di sala 1951’ê de ___________ (çûn) ser dilovaniyê.

**2- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.**

**1-** Celadet Bedirxan li ku derê û kengî hatiye ser rûyê cîhanê?

______________________________________________

**2-** Celadet Bedirxan di kîjan warî de xebatên giranbuha kirine?

______________________________________________

**3-** Wî bi hevalên xwe re kîjan kovar derxistiye?

______________________________________________

**4-** Kurd çima 15’ê Gulanê wekî Cejna Zimanê Kurdî pîroz dikin?

______________________________________________

**5-** Celadet Bedirxan kengî koça dawîn kiriye?

______________________________________________

# Apê Mûsa û mala wî



**2- Di nivîsa li jêr de lêkeran li gorî dema boriya berdest bikişînin**

Mala Apê Mûsa di nav gul û rihanan de winda __________ (bûn). Cure cure hinar, darên hirmiyan, ên incasan, ên xox û mişmişan, yên sêv û tûyan, darên hêjîr, behîv û gûzan baxçeyê wî__________ (xemilandin).
Cara yekem wî tovê bexdenûs, xiyar, kelem û kartolan anî Stilîlê. Aliyekî baxçeyê xwe bi naylonan girtibû. Zivistanê tûzik, kelem, bexdenûs, bacan û îsot ji wir bi dest __________ (xistin).
Ji bilî wan kew, kevok û pisîkan bi deng û tevgera xwe, baxçe dewlemend ______ (kirin).
Hundirê xaniyê wî wekî muzeyeke arkelojîk bû. Firaq û alavên kevn ên kurdan, mala wî __________ (xemilandin).
Arkeologekî fransî ku li girê Girnewas lêkolîn __________ (kirin), Mûsa Anter nas kiribû; çend parçe alavên dîrokî yên ku ji bin erdê derxistibûn, bi dizî gihandibûn Apê Mûsa û ji wî re gotibû: "Ev alavên kalikên we ne, çêtir e ku ji we re bin."
Çinara wî ya bi heybet, li ser Stilîlê wek hespekî rehwan, ji bayî re serî_______ (hejandin).
Apê Mûsa bi destê xwe dora wan daran __________ (xepirandin).
Rojekê li baxçe ji nişkê ve li min vegeriya û got:
"Tu zanî çi ji baxçeyê min kêm maye? Dareke parzî tenê, ew maye ku ez biçînim."

**Jîr Dilovan**

### 4- Di nivîsa li jêr de lêkeran li gorî çîrokiya dema boriya têdeyî bikişînin.

Wê salê havîn zû __________ (hatin). Ji ber vê yekê hoza me ber bi zozanan ve bi rê __________ (ketin). Dema em gihaştin zozanan, berf __________ (helîn), kulîlkên rengîn __________ (vebûn), derdor bi kulîlkan __________ (xemilîn). Hozên aliyê Mûşê berî me __________ (gihaştin) warê xwe, wan jî konên xwe __________ (vegirtin).

### 5- Lêkerên di nava kevanekê de bikin çîrokiya dema boriya têdeyî.

Piştî ku em ji hev veqetiyan, ez çûm malê, ez ketim nava nivînan, lê xewa min nehat. Tiştên ku te __________ (gotin) ji bîra min nediçûn. Ez pir bi wan gotinan __________ (êşîn). Te neheqî li min __________ (kirin). Li gorî gotina te, min tu bi tenê __________ (hiştin). Min berpirsiya tu karî __________ (ne/girtin) ser xwe. Lê min her tim li nik te cihê xwe __________ (girtin).

### 6- Hevokên li jêr bi cînavka girêkî bigihînin hev.

**Mînak** *Min nûçeyek xwend. Ew nûçe li ser koçberiyê bû.*
*Nûçeya ku min xwend li ser koçberiyê bû.*

**1-** Ehmedê Xanî ferhengokek nivîsand. Wî ew ferhengok diyarî zarokên kurmancan kir.

______________________________________________

**2-** Te qevdek kulîlk anîbû. Bêhna wan kulîlkan ez sermest kirim.

______________________________________________

**3-** Te par darek çandibû. Ew dar hişk bûye.

______________________________________________

**4-** Te pirtûkek nivîsiye. Zimanê wê pirtûkê pir dijwar e.

______________________________________________

**5-** Em duh çûn malekê. Ew mal li taxa apê te bû.

______________________________________________

**7- Bi peyvên li jêr ravekên rêzîn çêkin.**

**Mînak** *bazin / xaltîk / min / zêr = bazinê xaltîka min ê zêr*

**1-** avahî / bajar / herî mezin

______________________________

**2-** kur / met / min / biçûk

______________________________

**3-** mijar / pirtûk / Hêlîm Yûsiv / dawîn

______________________________

**4-** kember / xwişk / min / zîvîn

______________________________

**5-** çalakî / xwendekar / zanîngeh / li hember zimankujî

______________________________

**6-** pirsgirêk / mirov / aborî

______________________________

**8- Bi ravekên ku we li jor nivisî hevokan çêkin.**

**Mînak**

*bazinê xaltîka min ê zêr = Bazinê xaltîka min ê zêr winda bû.*

**1-** ______________________________
**2-** ______________________________
**3-** ______________________________
**4-** ______________________________
**5-** ______________________________
**6-** ______________________________

# unîte 7 CIH Û WAR

‣ Cîhan ‣ Alî û berg ‣ Bajar ‣ Taxa me ‣ Ravekirina cih

## A- Cîhan




## Kî dizane?

**1- Berlîn paytexta kîjan welatî ye?**
**a)** Fransa **b)** Portekîz **c)** Almanya **d)** Japonya

**2- Navê paytexta Îngilistanê çi ye?**
**a)** Parîs **b)** London **c)** Tîran **d)** Bûdapêşte

**3- Gelê Kûbayê bi çi zimanê dipeyive?**
**a)** erebî **b)** fransî **c)** farisî **d)** îspanî

**4- Îtalya li ser kîjan parzemînê ye?**
**a)** Afrîka **b)** Amerîka **c)** Antartîka **d)** Ewropa


**5- Kurdistan li ser kîjan parzemînê ye?**
**a)** Afrîka **b)** Asya **c)** Amerîka **d)** Ewropa

**6- Li kîjan welatî bi farisî diaxivin?**
**a)** Pakîstan **b)** Tirkiye **c)** Îran **d)** Sûriye



| WELAT | NETEWE | ZIMAN |
|---|---|---|
| Tirkiye | tirk | tirkî |
| Almanya | alman | almanî |
| Îran | faris | farisî |
| Amerîka | amerîkî | îngilîzî |
| Japonya | japon | japonî |
| Kûba | kûbayî | îspanî |
| Kurdistan | kurd | kurdî |
| Iraq | ereb | erebî |

## B- Alî û bergeh







## Daçek û bergeh

| | |
|---|---|
| Li (aliyê) | başûr |
| | bakur |
| | rojhilat |
| | rojava |
| | başûrê rojhilat |
| | başûrê rojava |
| | bakurê rojhilat |
| | bakurê rojava |

## Cîranên Amedê

Bajarê Amedê, bajarekî mezin e. Serjimara bajarê Amedê nêzî milyonek û pêncsed hezarî ye. Kurd bajarê Amedê wekî paytext dibînin. Amed di navbera Riha, Mêrdîn, Elezîz, Çewlik, Mûş û Êlihê de ye. Li başûrê Amedê bajarê Mêrdînê heye. Li bakurê Amedê bajarên Elezîz û Çewlik cih digirin. Li başûrê rojhilat bajarê Mûşê heye. Êlih li rojhilatê Amedê ye. Li başûrê rojavayê Amedê bajarê Rihayê heye.

**1- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.**

**1-** Bajarê Elezîzê li kîjan aliyê Amedê ye?

_______________

**2-** Li başûrê Amedê kîjan bajar heye?

_______________

**3-** Kîjan bajar li bakurê rojavayê Amedê ye?

_______________

**4-** Bajarê Mûşê li kîjan alî ye?

_______________

**5-** Li rojhilat kîjan bajar heye?


_______________

## C- Bajar

# 1- Hevpeyvîn







**Nûçegihan** Rojbaş, ez dikarim hevpeyvînekê bi te re bikim.

**Diyar** Belê, kerem bike.

**Nûçegihan** Tu ji ku derê yî?

**Diyar** Ez ji Agiriyê me.

**Nûçegihan** Tu dikarî ji me re qala Agiriyê bikî?

**Diyar** Agirî bajarekî dîrokî û mezin e. Agirî navê xwe ji Çiyayê Agiriyê digire. Çiyayê Agiriyê di nava tixûbê vî bajarî de ye.

**Nûçegihan** Li derdora Agiriyê kîjan bajar hene?

Li bakurê Agirî Qers û Îdir cih digirin. Li rojavayê bajêr Erzerom heye. Mûş û Wan li başûrê Agiriyê ne. Bajarê Mûşê li başûrê rojava, Wan jî li başûr û başûrê rojhilat dimîne. Agirî li ser tixûbê Îranê ye, li aliyê rojhilat bajarê Makûyê heye.

**Nûçegihan** Hejmara şêniyê bajêr çi qas e?

**Diyar** Hejmara şêniyê navenda bajêr nêzikî sed hezar kesî ye. Hejmara hemû niştecihên bajêr bi navçe, bajarok û gundên xwe ve ji pêncsed hezarî zêdetir e.

**Nûçegihan** Çemê Muradê di Agiriyê re derbas dibe, ne wisa?

**Diyar** Erê, çemê Muradê di kêleka bajêr re diherike.

**Nûçegihan** Wekî din di nav sînorên Agiriyê de çi cih û warên taybet hene?

**Diyar** Li rojhilatê bajêr Bazîda rengîn cih digire. Li vê navçeyê Qesra Îsheq Paşa û gora Ehmedê Xanî hene. Her roj bi dehan kes tên serdana qesrê û gora Ahmedê Xanî ziyaret dikin. Her wiha nêzîkî sînorê Îranê, çaleke mezin heye, kevirê esmanî ketiye û ew çal vekiriye. Ji xeynî wê cihê Keştiya Nûh heye, ew jî gelekî balkêş e. Her sal gelek mirov tên serdana vî cihî.

**Nûçegihan** Ji bo alîkariya te zor spas.

**Diyar** Spasxweş.

## Nivîs

**Hûn jî li gorî xalên li jêr qala bajarê xwe bikin.**

*Dîrok, serjimêr, xweza, erdnîgarî, cihên dîrokî …*

**1- Pirsên li jêr li gorî nivîsa jorîn bibersivînin.**

**1-** Agirî bajarekî çawa ye?

______________________________

**2-** Bajar navê xwe ji ku digire?

______________________________

**3-** Li bakurê Agiriyê kîjan bajar hene?

______________________________

**4-** Li rojhilatê Agirî kîjan bajar heye?

______________________________

**5-** Mûş û Wan li kîjan aliyê Agiriyê cih digirin?

______________________________

**6-** Hejmara şêniyê navenda bajêr çi qas e?

______________________________

**7-** Kîjan çem di nav Agiriyê re derbas dibe?

______________________________

**8-** Li Bazîdê kîjan qesra navdar heye?

______________________________

**9-** Gora Ahmedê Xanî li ku ye?

______________________________

## Hin daçekên hevedudanî

| | | |
|---|---|---|
| di | ser | re |
| | bin | |
| | ber | |
| | nav | |
| | dor | |
| | paş | |

**Mînak**

Balafir di ser mala me re derbas bû.
Keştî di bin pirê re derbas dibe.
Zozan her roj di ber mala me re derbas dibe.
Riya dibistanê di nav daristanê re derbas dibe.

**2- Di nivîsa li jêr de binê daçekên hevedudanî xêz bikin.**

# Gera Perwînê li Stenbolê

Vê havînê di betlaneyê de ez ji bo hefteyekê çûm Stenbolê. Ez serê sibehê li balafirê siwar bûm, balafir bi hewa ket. Balafir di ser gelek cih û waran re derbas bû, piştî saet û nîvekê gihîşt Stenbolê.

Li balafirgehê pismamê min Serheng ez pêşwazî kirim, em li tramvayê siwar bûn. Di tramvayê de ez li ber paceyê rûniştim, Serheng jî li nik min rûnişt. Li aliyekî me xeber dida, li aliyê din jî min li derve temaşe dikir. Tramvay carinan di ser erdê re, carinan jî di bin erdê re diçû. Li derve avahiyên bilind û gelek mirov hebûn.

Piştî demekê em gihîştin Aksarayê. Em îcar li otobûsê siwar bûn û piştî demeke kurt em gihîştin malê. Mala apê min li navçeya Fatîhê ye.

Ez hefteyekê li Stenbolê mam. Pismam û dotmamên min ez li nava bajêr gerandim. Ji bo min cihên herî balkêş Tengav û cihên dîrokî bûn. Em rojekê li keştiyê siwar bûn ji seriyekî Tengavê heta seriyê din em çûn û hatin. Tengav du parzemînan; Asya û Ewropayê ji hev cuda dike. Du pirên mezin; Pira Tengavê û Pira Fatîh Sultan Mehmet her du aliyan digihînin hev. Li Stenbolê cih û warên dîrokî herî zêde li Sultanahmedê hene. Sultanahmed cihekî tûrîstîk e, ji her welatî tûrîst li wir hene. Sultanahmed bi şênî û avahiyên xwe dişibe taxeke bajarekî Ewropayê. Cihên mîna Seraya Topkapiyê, Ayasofyayê jî li Sultanahmedê ne.

Seraya Topkapiyê gelekî mezin e, mirov rojekê sibe heta êvarê li nav bigere naqede. Seraya Topkapiyê li raserî Tengavê ye, bajar ji vir pir xweş xuya dike. Cihekî din ê dîrokî jî Ayasofya ye. Ew der di dema Bîzansiyan de dêr bûye, lê Osmaniyan kiriye mizgeft. Niha jî bûye muze. Cihekî xweş û dîrokî jî Parka Gulhaneyê ye. Ev park di bin Seraya Topkapiyê re, li raserî Tengavê ye. Darên li vê parkê pir bilind in.

Bajarê Stenbolê bajarekî xweş e. Gelek kurd li vî bajarî hene. Lê dîsa jî di nav çend rojan de min bêriya Amedê kir.

**3- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.**

**1-** Perwîn bi çi çû Stenbolê?

______________________________

**2-** Kê ew pêşwazî kir?

______________________________

**3-** Perwîn û Serheng bi çi çûn Aksarayê?

______________________________

**4-** Mala apê Perwînê li kîjan navçeyê ye?

______________________________

**5-** Tengav kîjan parzemînan ji hev cuda dike?

______________________________

**6-** Cihên dîrokî herî zêde li ku hene?

______________________________

**7-** Seraya Topkapiyê li ku derê ye?

______________________________

**8-** Taybetiya darên Gulhaneyê çi ye?

______________________________



## D- Taxa me

# Qada Îstasyona Trênê

Îstasyona trênê di navenda Amedê de, li derveyî sûran e. Kolana Mêrg Ehmed, ji navenda sûran dest pê dike û li ber Deriyê Rihayê diqede. Dûmahîka vê kolanê Kolana Îstasyonê ye. Ev kolan ji Deriyê Rihayê dest pê dike û ber bi îstasyonê ve didome. Kolan li Qada Îstasyonê bi dawî dibe. Li ser destê rastê yê Kolana Îstasyonê stadyûma bajêr heye.

Qada Îstasyonê cihekî pir fireh e. Li hemberî îstasyonê Parka Sumerê heye. Ev parka mezin qadê xweş û geş dike. Li tenişta qadê mizgeftek heye. Hin pîrozbahiyên girseyî û mitîng li vê qadê pêk tên.

**1- Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.**

**1.** Îstasyona trênê li ku derê ye?

______________________

**2.** Kolana Mêrg Ehmed ji ku dest pê dike?

______________________

**3.** Kolana Îstasyonê ji ku derê dest pê dike?

______________________

**4.** Kolana Îstasyonê li ku bi dawî dibe?

______________________

**5.** Parka Sumerê li kîjan hêlê ye?

______________________



## E- Ravekirina cih

**Mîrza** Dembaş Rengîn, ez Mîrza.

**Rengîn** Dembaş Mîrza, tu gihîştî Amedê?

**Mîrza** Belê, ez niha li ber deriyê Mizgefta Mezin im. Tu li ku yî?

**Rengîn** Ez li Ofîsê li Kuçeya Hunerê me, tu dikarî werî vê derê?

**Mîrza** Ez rê baş nizanim ji min re tarîf bike.

**Rengîn** Tu yê bi erebeyê werî?

**Mîrza** Na, ez dixwazim hinekî bimeşim.


**Rengîn** Baş e, tu niha li ser Kolana Gaziyê yî, ber bi Deriyê Çiyê ve bimeşe, dema ku tu gihîştî Mizgefta Nebî dagere aliyê çepê. Ji wir heta Şaredariya Sûrê bimeşe. Dema ku tu gihîştî ber Şaredariya Sûrê derbasî hember bibe, di ber sûran re heta Duderiyan bimeşe, di wir re derbas bibe, ber bi jor ve bimeşe, ku tu gihîştî Wilayetê, derbasî hember bibe û di nav Parka Wilayetê re derbas bibe, li aliyê çepê kolana ku diçe Ofîsê heye, di wê kolanê re li ser milê rastê heta AZC Plazayê were. Di ber AZC Plazeyê re li ser destê rastê bizivire, ez li ber deriyê Plazeyê li benda te me.

**Mîrza** Baş e, ez ê heta nîv saetê bigihêjim wê derê, niha bi xatirê te.


**Rengîn** Ez li benda te me, zêde dereng nemîne.




**1- Hogir dixwaze ji Qada Newrozê biçe Yarîgeha Kawa. Ji wî re rê tarîf bikin.**



## F- Avahiya me



Mala me di avahiyeke mezin û bilind de ye. Avahî yazdeh tebeqe ye. Di her tebeqeyê de çar mal hene. Di her malekê de sê ode, eywaneke mezin, mitbex, daşir, serşok û holek hene. Her wiha şaneşîneke fireh û mezin jî heye.

Derûdora avahiya me vekirî ye. Em dikarin ji şaneşînê li hawirdorê temaşe bikin. Di avahiya me de du asansor hene.

**1- Pirsên jêrîn li gorî nivîsa li jor bibersivînin.**

**1-** Mala Dîlanê di avahiyeke çawa de ye?

________________________________

**2-** Avahî çend tebeqe ye?

________________________________

**3-** Di her tebeqeyê de çend mal hene?

________________________________

**4-** Di xênî de asansor heye?

________________________________



## G- Odeya Hêlînê

Ev odeya Hêlînê ye. Di odeyê de du pace hene. Yek li aliyê çepê ye, yek jî li aliyê rastê ye. Li ber paceya aliyê rastê pirtûkxaneyeke piçûk heye. Di vê pirtûkxaneyê de pirtûk û lênûskên Hêlînê hene. Di nava pirtûkxaneyê de televîzyoneke biçûk balê dikişîne. Li aliyê rastê yê pirtûkxaneyê rûniştekek, li aliyê çepê yê pirtûkxaneyê cildankek heye.

Li ber paceya aliyê çepê nivîngehek heye. Li ser nivîngehê nivînek raxistî ye. Li raserî nivîngehê wêneyek balê dikişîne. Li aliyê rastê yê nivîngehê pirtûkxanyek biçûk heye, li raserî pirtûkxaneyê demjimêreke dîwaran xuya dike. Li hêla çepê komîdînek, li kêleka komîdînê şîfonyerek heye, li ser şîfonyer û komîdînê pêlîstok hene. Li ber komîdîn û şîfonyer, li erdê xalîçeyeke rengîn raxistî ye. Di odeya Hêlînê de rengê xemrî serdest e. Odeya Hêlînê gelekî birêkûpêk û xweşik e.

**1- Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.**

**1-** Di odeya Hêlînê de çend pace hene?

______________________________

**2-** Li ber paceya aliyê rastê çi heye?

______________________________

**3-** Cildank li kîjan aliyê pirtûkxaneyê ye?

______________________________

**4-** Televîzyon li ku derê ye?

______________________________

**5-** Li ber paceya aliyê çepê çi heye?

______________________________

**6-** Xalîçe li ku raxistî ye?

______________________________

### Hin daçekên hevedudanî

Li aliyê rastê / li milê rastê
Li aliyê çepê / li milê çepê
Li jor
Li jêr
Li pêş / ber
Li paş / pişt
Li rex / cem / nik / kêlekê
Li ser
Li bin
Li hember

## A - Xebata li ser peyvan

### 1- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.

| welat | al | tixûb | bajar | tax | ziman | kuçe | navçe | gund |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|

**1-** _____________ Baxdayê li Iraqê ye.
**2-** Navê _____________ min Germenîstan e.
**3-** Rengê _____________ me kesk, sor û zer e.
**4-** Li _____________ me sînemayek heye.
**5-** _____________ fermî yê Îranê farisî ye.
**6-** Bajarê Antaqyayê li ser _____________ Sûriyeyê ye.
**7-** Dêrik _____________ Mêrdînê ye.
**8-** Dara navê _____________ dîrokî yê Nisêbînê ye.
**9-** Mala me di _____________ teng de ye.

### 2- Nêçîra peyvan

1. *ŞANEŞÎN*.......................
2. ....................................
3. ....................................
4. ....................................
5. ....................................
6. ....................................
7. ....................................
8. ....................................
9. ....................................
10. ....................................
11. ....................................

| | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| X | **Ş** | **A** | **N** | **E** | **Ş** | **Î** | **N** | W | X | D |
| P | Q | E | P | X | G | I | S | G | R | Q |
| A | K | X | A | N | Î | L | H | O | R | K |
| L | J | Î | M | A | L | Q | O | Y | X | C |
| G | M | O | A | Q | D | N | L | G | H | I |
| E | Q | Û | U | X | V | D | E | R | Î | L |
| H | S | E | R | Ş | O | K | E | D | W | D |
| P | I | R | T | Û | K | X | A | N | E | A |
| L | W | T | Y | D | Î | W | A | N | U | N |
| I | W | Q | N | I | V | Î | N | N | G | K |
| N | T | I | W | Q | X | U | N | S | X | Y |
| D | T | Ê | K | B | E | R | G | Y | Ê | Î |

### 3- Cihên vala dagirin.

| WELAT | NETEWE | ZIMANÊ FERMÎ |
|---|---|---|
| | tirk | |
| Almanya | | almanî |
| Îran | fars | |
| Amerîka | amerîkî | |
| | | japonî |
| Kûba | | |
| | kurd | |
| Fransa | | |
| Îngilistan | îngiliz | |
| | ermen | |
| Sûriye | | erebî |
| Îsraîl | | îbranî |

## B - Xwendin

# Bajarê me

Navê bajarê me Agirî ye. Ew bajarekî dîrokî û mezin e. Navê wî yê berê Qerekose ye. Çiyayê Agirî di nav tixûbên bajêr de ye. Nifûsa Agirî bi bajarok, belde û gundan ve 500 hezar e. Çemê Muradê yê bi nav û deng di kêleka bajêr re derbas dibe.
Di rojhilatê bajêr de navçeya wê Bazîd heye. Bazîd cihekî dîrokî ye. Qesra Îshaq Paşa û gora Ehmedê Xanî li Bazîdê ne. Her roj bi dehan kes li nava qesrê digerin û diçin serdana gora Ehmedê Xanî.

### 1- Ji hevokên li jêr yên rast bi (r) yên çewt bin, bi (ç) xêz bikin

| | Hevok | r | ç |
|---|---|---|---|
| 1 | Navê berê yê Agirî Qerekose ye. | ✓ | |
| 2 | Agirî bajarekî nû ye. | | |
| 3 | Çiyayê Agirî di nav tixûbê bajarê Agiriyê de ye. | | |
| 4 | Nifûsa bajêr bi tevahî 500 hezar e. | | |
| 5 | Çemê Muradê di nav Agirî re derbas dibe. | | |
| 6 | Bazîd li rojavayê bajêr dimîne. | | |
| 7 | Qesra Îshak Paşa li Bazîdê ye. | | |
| 8 | Gora Ehmedê Xanî li Bazîdê ye. | | |
| 9 | Bazîd girêdayî Wanê ye. | | |
| 10 | Gelek kes Qesra Îshaq Paşa ziyaret dikin. | | |

# Wendy qala welatê xwe dike



Ez ji Holandayê me. Welatê min welatekî biçûk e. Ew li rojavayê Ewropayê ye.

Holanda dikeve ser tixûbên du welatan: li rojhilat Almanya û li başûr jî Belçîka. Ji aliyê rojava ve ew dikeve ser Deryaya Bakur. Rûberê wê 41.526 kilometreyên çargoşe ye. Serjimara wê 16 mîlyon e.

Sîstema deshilata Holandayê parlamenterî ye. Her wiha ew welatekî şahnişîn e. Ew ji 12 parêzgehan pêk hatiye. Zimanê fermî yê Holandayê holandî ye.

Paytexta wê Amsterdam e. Ew bajarekî gelekî xweş e. Li Amsterdamê gelek avahiyên dîrokî hene. Li Amsterdamê kanal hene. Ew kanal li cihekî din nîn in, xweserî wê derê ne.

Her çi qas Amsterdam paytext be jî Den Haag (Lahey) navenda deshilata Holandayê ye.

Li bajarê Rotterdamê bendereke navneteweyî heye, bi sedan keştiyên bazirganî rojane têne vê benderê. Holanda di warê pîşesazî, çandinî û teknolojiyê de jî pêşketî ye.

Holanda bi dewlemendiya cureyên laleyan navdar e. Her sal bi bihaye milyonan ev lale têne firotin.

Li Holandayê daristan pir in û gelekî xweş in.

Bajarê ku ez lê dijîm, navê wî Leiden e. Ev bajar, bajarekî dîrokî ye. Dîrokeke wî ya dûr û dirêj heye. Bo nimûne, zanîngeha ku ez lê dixebitim, li Holandayê zanîngeha kevntirîn e. Ez ji welatê xwe gelekî hez dikim.

### 2- Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.

**1-** Holanda li ser kîjan parzemînê ye?

______________________________

**2-** Li rojhilata Holandayê kîjan welat heye?

______________________________

**3-** Serjimara Holandayê çi qas e?

______________________________

**4-** Sîstema desthilata Holandayê çi ye?

______________________________

**5-** Zimanê fermî yê Holandayê kîjan e?

______________________________

**6-** Navê paytexta Holandayê çi ye?

______________________________

**7-** Li kîjan bajarê Holandayê bendereke navneteweyî heye?

______________________________

**8-** Holanda bi çiyê xwe navdar e?

______________________________



# Deriyên Sûrên Amedê

Amed berê di nav sûran de bû. Sûrên Amedê li çar aliyê cîhanê bi nav û deng in. Sûr bi dirêjahî û mezinahiya xwe li cîhanê piştî Dîwarê Çînê di rêza duyemîn de cih digirin. Armanca avakirina sûran parastina bajêr bû.
Di serî de çar deriyên Sûrên Amedê hebûn. Sê derî jî paşê vebûn û hejmara deriyan bû heft. Li bakurê bajêr “Deriyê Çiyê”, li rojava “Deriyê Rihayê”, li başûr “Deriyê Mêrdînê”, li rojhilat “Deriyê Nû” hene. Ji bilî van deriyan deriyek jî nêzîkî Deriyê Çiyê heye. Ji vî derî re jî “Deriyê Sarayê” dibêjin. Du deriyên din jî di demên dawiyê de vebûn. Çemê Dîcleyê di ber sûran re derbas dibe. Li ber çem baxçeyên Hewselê hene. Dîmenên baxçeyan ji ser sûran gelekî xweş e. Ji ser sûran Pira Dehderî xuya dike.

### 3- Beşên hevokên ku hev temam dikin bigihînin hev.

| | |
|---|---|
| **1-** Bajarê Amedê | **a-** li bakurê bajêr e. |
| **2-** Sûrên Amedê | **b-** di ber sûran re derbas dibe. |
| **3-** Heft deriyên | **c-** pir bi nav û deng in. |
| **4-** Deriyê Çiyê | **d-** berê di nav sûran de bû. |
| **5-** Çemê Dîcleyê | **e-** Baxçeyên Hewselê hene. |
| **6-** Li ber Çemê Dîcleyê | **f-** Sûrên Amedê hene. |
| **7-** Ji ser sûran | **g-** Pira Dehderî xuya dike. |

| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 |
|---|---|---|---|---|---|---|
| d | | | | | | |

## C- Hîndariyên rêzimanî

### Daçek

**1- Cihên vala bi daçekan dagirin.**

**1-** Mala me ____ Amede ye.
**2-** Ez ____ Zanîngehê ____ dixwînim.
**3-** Ew ____ nav daristanê ____ derbas dibe.
**4-** Pîrika min ____ me ____ çîrokan dibêje.
**5-** Ez ____ mala xaltîka xwe hatim.
**6-** Mizgîn ____ aliyê jêr ____ dimeşe.
**7-** Evînê wêneyek ____ dîwarê odeya xwe ____ daliqand.
**8-** Komek zarok ____ aliyê çepê ____ tên.
**9-** Em ____ keştiyê çûn Girava Axtamarayê.
**10-** Mala Zozanê ____ dûr ____ xuya dike.

**2- Cihên vala dagirin.**

**1-** ____ quncê rastê cildankek heye.
**2-** Li ____ şîfonyerê guldankek heye.
**3-** Mala me ____ avahiyeke mezin û bilind de ye.
**4-** Di ____ maseyê kursiyek heye.
**5-** Kolana Mêrg Ehmed, ____ navenda sûran dest pê dike.
**6-** Sosin ____ min re hat dibistanê.
**7-** Te çima ____ min re negot?
**8-** ____ ber mala me re derbas bû.
**9-** Min çakêtê xwe ____ hilço ve daliqand.

**3- Li nexşeyê binêrin û cihên vala dagirin.**

Bajarê Mûşê di __________ Bedlîs, Erzerom, Agirî, Çewlik, Amed û Êlihê de ye. Li __________ Mûşê bajarê Erzeromê heye. Li aliyê __________ Çewlik heye. Li __________ Mûşê Amed û Êlih hene. Bedlîs li __________ Mûşê ye. Li __________ bajarê Agirî heye.



# unîte 8 RAGIHANDIN

- Dîroka ragihandinê
- Kompîtur û înternet
- Weşana bi kurdî

## A- Dîroka ragihandinê

**1- Wateya peyvên li jêr hîn bibin û bi her yekê hevokekê çêkin.**

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| çapxane | rojname | kovar | birûske | name | dahênan | weşan | ragihandin |

## Ragihandin

Ragihandin ji bo mirovan pir girîng e. Ji bo bipêşvebirina ragihandinê gelek xebat hatine kirin. Di sala 1887'an de Heinrich Hertz pêlên radyoyê vedîtin. Di sala 1894'an de ji hêla Oliver Lotge ve bêtêl û birûske hatin dahênan. Di sala 1901'ê de jî bi destê Marconî radyo hat dahênan. Teknolojiya radyoyê ya pêşketî guherînên nû bi xwe re anîne.

Teknolojiya sînema û radyoyê bi hev re hatin bikaranîn û di dawiyê de jî televîzyon derket holê. Weşana televîzyonê cara yekemîn di sala 1936'an de li Londonê dest pê kir. Li Tirkiyeyê weşana televîzyonê di sala 1970'yî de pêk hat. Li Tirkiyeyê cara pêşîn di sala 1984'an de weşana rengîn hatiye kirin.

Di warê ragihandinê de pêşketineke girîng jî dahênana telefonê ye. Telefon ji hêla Graham Bell ve di sala 1876'an de hat dahênan. Bi dahênana telefonê re ragihandina di navbera mirovan de pir hêsan bû. Bi telefonê mesafeya di navbera mirovan de bi awayekî ji holê rabû. Ev xizmet bi lez û bez li her derê belav bû. Piştre jî telefon ji têlan rizgar bû û niha jî ketine berîkên mirovan.



**2- Pirsên li jêr li gorî teksta li jor bibersivînin?**

**1-** Bêtêl û birûske kengî û ji hêla kê ve hatin dahênan?

______________________________________

**2-** Televîzyon çawa derket holê?

______________________________________

**3-** Weşana televîzyonê cara pêşîn kengî û li ku dest pê kiriye?

______________________________________

**4-** Telefon ji hêla kê ve hat dahênan?

______________________________________

**5-** Bi dahênana telefonê re çi ji holê rabû?

______________________________________

**3- Di nivîsa li jor de binê hevokên bi avaniya tebatî xêz bikin.**

# Avaniya tebatî (demên borî)

| Bireser | Lêkera alîkar "hatin" | Lêker |
|---|---|---|
| pirtûk | hat / hatin<br>hatiye / hatine<br><br>nehat / nehatin<br>nehatiye / nehatine | xwendin |
| kinc | | şûştin |
| stran | | guhdarîkirin |
| mêvan | | pêşwazîkirin |
| kulîlk | | çandin |

## Kişandina li gorî kesan

| Bireser (cînavk) | Lêkera alîkar "hatin" | Lêker |
|---|---|---|
| Ez | hatim / hatime | dîtin<br>vexwendin<br>pêşwazîkirin |
| Tu | hatî / hatiye | |
| Ew | hat / hatiye | |
| Em | hatin / hatine | |
| Hûn | hatin / hatine | |
| Ew | hatin / hatine | |

# Çîroka ragihandinê



Berê ragihandin bi amûrên cihêreng dihat kirin. Di destpêkê de ji ber ku navgînên ragihandinê bi pêş neketibûn di warê ragihandinê de gelek tengasî dihatin kişandin. Li hin welatan ji bo ragihandinê dûxan dihat bikaranîn.

Ne tenê dûxan demekê kevok jî ji bo hinartina peyaman dihatin bikaranîn. Pirî caran name û peyam bi lingê kevokê ve dihat girêdan bi vî awayî dihatin şandin. Di gelek çîrokan ev yek tê vegotin.



Her wiha demeke direj jî peyam û name bi riya qasidan dihatin hinartin.

Nemaze jî şah û mîran ji bo ragihandinê qasid bi rê dikirin.  Qasid li hespên xwe siwar dibûn, bi rojan diçûn, hin caran di rê de ji hêla rêbiran ve dihatin kuştin.

Serdemekê jî name dihatin nivîsandin û bi riya postebaran dihatin şandin. Piştî dahênana telefon û birûskeyê karê ragihandinê hêsantir bû. Piştre jî navgînên mîna radyo û televîzyon derketin.



Îro navgînên ragihandinê pir bi pêş ketine. Ragihandin gelekî hêsan û lezgîn bûye.

**4- Di nivîsa li jor de binê hevokên bi avaniya tebatî xêz bikin.**

**5- Li gorî nivîsê pirsên li jêr bibersivînin.**

**1-** Berê di warê ragihandinê de çima tengasî dihatin kişandin?

________________________________________

**2-** Berê li hin welatan ji bo ragihandinê kîjan amûr dihatin bikaranîn?

________________________________________

**3-** Qasid ji hêla kê ve dihatin kuştin?

________________________________________

**4-** Name bi çi awayî dihatin şandin?

________________________________________



**5-** Piştî derhênana çi ragihandin hêsantir bû?

________________________________________

**6-** Niha çima ragihandin hêsan û lezgîn bûye?

________________________________________

**6- Nivîsa li jêr bikin avaniya tebatî.**



Berî 15-20 salan derxistina rojnameyê ji îro dijwartir bû. Niha kompîtur û înternetê kar gelekî hêsan kiriye. Her wiha çapkirin jî gelekî bi pêş ketiye. Me berê gelek kar bi destan dikirin. Bo nimûne me nûçe û nivîs bi destan dinivîsandin.

Ji hêreman nûçegihanan nûçe dişandin, ew jî tîprêzan li ser kompîturê rêz dikirin.

Li rojnameyê du kompîturên biçûk û kompîtureke mezin hebû. Tîprêz li ber kompîturên biçûk rûdiniştin, wan tîprêzî dikir, hevalên rûpelsaz li ser kompîtura mezin rûpel çêdikirin. Me hemû nivîs li ser kaxizê dixwendin û sererast dikirin. Paşê jî li cihê montajê hevalan fîlmên nivîsan dikişandin û ew fîlm diçûn çapxaneyê.

## Avaniya tebatî (dema boriya berdest)

| Bireser | Lêkera alîkar "hatin" | Lêker |
|---|---|---|
| peyam | dihat / dihatin | şandin |
| kinc | | raxistin |
| çîrok | nedihat / nedihatin | gotin |
| mêvan | | birêkirin |
| agahî | | xwestin |

## B- Kompîtur û înternet

Di roja îroyîn de gelek amûrên nûjen ên ragihandinê tên bikaranîn. Êdî bêyî van amûran tu kar nayên kirin. Ji van amûran a herî girîng kompîtur e. Di jiyana me de kompîtur cihekî gelekî girîng digire. Ew êdî di gelek karan de tê bikaranîn. Bo nimûne, êdî nivîs li ser kompîtûrê tên nivîsandin.

Tiştekî ku girîngiya kompîturê zêde dike jî înternet e. Di înternetê de gelek malper hene. Agahiyên pêwîst ji malperan tên bidestxistin. Êdî name bi riya posteyê nayên şandin, li şûna wê, nameyên elektronîk ango tîşkename tên şandin.

Ji bo ragihandinê peyamhinêr jî tê bikaranîn. Amûreke din a girîng jî telefona destan e. Êdî li şûna telefona malê, telefona destan tê bikaranîn. Bi riya telefona destan peyam jî tên şandin, li muzîkê jî tê guhdarîkirin û wêne tên kişandin.

Van amûran jiyana me gelekî hêsan kiriye. Ragihandin êdî hem hêsan hem jî lezgîn bûye.



**Pirsên jêrîn li gorî nivîsa jorîn bibersivînin.**

**1-** Amûra serdema nû ya herî girîng ____________ e.

**2-** Di ____________ de gelek malper hene.

**3-** Ji ____________ gelek agahiyên pêwîst tên bidestxistin.

**4-** Êdî li şûna nameyan ____________ tên şandin.

**5-** Di înternetê de ji bo ragihandinê ____________ jî tê bikaranîn.

**6-** Bi riya telefona destan ____________ jî tên şandin.

## Avaniya tebatî (dema niha)

| Bireser | Lêkera alîkar "hatin" | Lêker |
|---|---|---|
| pirtûk | tê / nayê<br>tên / nayên | xwendin |
| kinc | | şûştin |
| stran | | guhdarîkirin |
| mêvan | | pêşwazîkirin |
| kulîlk | | çandin |

## Kişandina li gorî kesan

| Bireser (cînavk) | Lêkera alîkar "hatin" | Lêker |
|---|---|---|
| Ez | têm / nayêm | dîtin<br>vexwendin<br>pêşwazîkirin |
| Tu | têyî / nayêyî | |
| Ew | tê / nayê | |
| Em | tên / nayên | |
| Hûn | tên / nayên | |
| Ew | tên / nayên | |

# Pêşeroja ragihandinê



Ez dibêjim heke hinek bergirî neyên girtin, dê hemû rojname di demeke kurt de werin girtin. Wisa xuya dike ku dê li şûna rojnameyên îroyîn hin weşanên elektronîk werin xwendin. Heke wisa bibe dê çapxane jî werin girtin. Li gorî baweriya min, bila werin girtin ji ber ku çapkirina pirtûkan dibe sedem ku her sal gelek dar werin birîn. Dibe ku bi pêşketina rojnamegeriya li ser înternetê rê li ber qirkirina daristanan were girtin.



Bi baweriya min malper tu carî nikarin cihê rojname û kovaran bigirin.
Dibe ku hinek guherîn di çapemeniyê de werin pêkanîn, lê belê dê kakilê wê tu carî neyê guhartin. Piştî sed salî dê dîsa pirtûk, rojname û kovar werin xwendin. Heta ku ev pêdivî hebin dê rojname jî werin weşandin, pirtûk û kovar jî werin çapkirin.



Ez dibêjim, dê temenê rojnameyan zêde ne dirêj be. Di rojên pêş de dê nûçe li ser malperan bi awayekî zindî bên weşandin. Her wiha dê li ser telefonên destan jî li televîzyonan were temaşekirin. Di vê rewşê de dê rojname neyên firotin? Dema neyên firotin jî jixweber dê werin girtin.

### 1- Peyvên li jêr di cihê vala de bi cih bikin.


bergirî | weşan | çapxane | zindî | pêdivî

**1-** Ji bo parastina daristanan divê hinek ____________ werin girtin.
**2-** Me pirtûka xwe amade kir û ji bo çapê şand ____________.
**3-** Di sala 1995'an de yekemîn televîzyona kurdî dest bi ____________ kir.
**4-** Îsal dibe ku pîrozbahiya Newrozê di TV'yê de bi awayekî __________ bê weşandin.
**5-** Kes şer naxwaze ____________ civakê bi aştî û aramiyê heye.

| Bireser | Daçeka dema bê | Lêkera alîkar "hatin" | Lêker |
|---|---|---|---|
| kovar | dê | bê / bên | çapkirin |
| dar | | | çandin |
| çêlek | | were / werin | dotin |
| xanî | | | firotin |

| Daçekên raweyê | Bireser | Lêkera alîkar "hatin" | Lêker |
|---|---|---|---|
| bila | pirtûk | bê / bên | weşandin |
| dibe ku | gund | | avakirin |
| heke | trimpêl | were / werin | firotin |
| dema ku | kinc | | şûştin |











## C- Weşana bi kurdî

## 1- Kî dizane?

**1- Yekemîn rojnameya kurdî kîjan e?**
**a)** Hawar **b)** Roja Nû **c)** Riya Teze **d)** Kurdistan

**2- Kê kovara Hawar derxistiye?**
**a)** Cegerxwîn **b)** Celadet Bedirxan **c)** Pîrêmêrd **d)** Ereb Şemo

**3- Yekemîn radyoya ku bi kurdî weşan kiriye kîjan e?**
**a)** Radyoya Erîvanê **b)** Radyoya Tehranê **c)** Şerq el Adna **d)** Dengê Mezopotamya

**4- Yekemîn televîzyona peykî ya kurdî kîjan e?**
**a)** Xebat TV **b)** Roj TV **c)** Med TV **d)** Kurdistan TV









# Çapemeniya kurdî



*Dîroka çapemeniya kurdî ji hêla ciwanên kurd ve zêde nayê zanîn, di vî warî de me hevpeyvînek bi Serokê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê Samî Berbang re pêk anî.*

***Mamoste yekemîn rojnameya bi kurdî kîjan e?***

-Yekemîn rojnameya kurdan Kurdistan e. Ew ji hêla Mîqdat Mîthat Bedirxan ve hatiye derxistin.

***Rojnameya Kurdistan kengî, li ku hatiye derxistin?***

Di 22'yê avrêla 1898'an de li Qahîreyê hatiye weşandin.

***Baş e mamoste, çima ev rojname li Qahireyê hatiye weşandin?***

Ji ber ku wê demê li Kurdistanê derfetên çapê tune bûn û li Stenbolê jî li ber çapemeniyê astengî hebûn. Lê piştî Şoreşa Meşrûtiyetê ya 1908'an li Stenbolê jî hinek kovar û rojnameyên bi kurdî hatin çapkirin.

***Tu dikarî hinekî jî qala wan bikî?***

Belê, di destpêka sedsala bîstan de li Stenbolê kovarên bi navê Jîn (1918), Hetawî Kurd / Rojî Kurd (1913) û Kurdistan hatine derxistin. Lê vê pêvajoyê zêde dom nekir. Piştî ku komara Tirkiyeyê hat avakirin, li Tirkiyeyê derfetên weşana bi zimanê kurdî neman.

***Piştî wê çi bû?***

Piştî wê, weşanên bi zimanê kurdî li parçeyên din ên Kurdistanê hatin derxistin. Di vî warî de mirov dikare navê weşanên mîna Hawar, Ronahî, Roja Nû, Riya Teze, Gelawêj, Bangî Heq û Zarî Kurmancî bide. Ji bo pêşveçûna zaravayê kurmancî kovarên mîna Hawar (15 gulan 1932), Ronahî, Roja Nû û Riya Teze gelek girîng in.

***Niha rewş çi ye mamoste?***

Niha rewş gelekî guheriye. Bi dehan kanalên televîzyonê, bi dehan kovar û gelek rojname li Kurdistanê û derveyî Kurdistanê têne weşandin. Nemaze li bakurê Kurdistanê di salên 1990'î de bi têkoşîna gelê kurd re di warê çapemeniyê de jî pêşketinên mezin pêk hatin.

Di salên 1990'î de gelek kovar û rojnameyên mîna Rojname, Welat, Welatê Me, Rewşen, Jiyana Rewşen, Tewlo, Pîne, Nûbihar û Govend hatin weşandin. Di van salan de gelek weşanxane hatin vekirin û bi sedan pirtûkên bi kurdî hatin weşandin. Bi tenê, di salên 2007 û 2008'an de zêdetirî 200 pirtûkî hatine çapkirin. Niha rojnameyeke rojane; Azadiya Welat tê derxistin. Ji bilî wê kovarên mîna Kovara W, Zend, Nûbihar, Bîr, Tîroj (tirkî-kurdî) û Çîrûsk tên weşandin.

**Pirsên jêrîn li gorî nivîsa jorîn bibersivînin.**

**1-** Yekemîn rojnameya kurdan kîjan e?

______________________________

**2-** Rojnameye Kurdistanê li ku derê dest bi weşanê kiriye?

______________________________

**3-** Rojnameye Kurdistanê ji hêla kê ve hatiye weşandin?

______________________________

**4-** Di destpêka sedsala bîstan de li Stenbolê kîjan kovar hatine derxistin?

______________________________

**5-** Di sala 2007'an de li bakur çend pirtûk hatine çapkirin?

______________________________

## 3- Radyo




Di dîrokê de yekemîn radyoya ku bi kurdî weşan kiriye, radyoya Şerq el Adna ye. Ev radyo ji hêla Brîtanyayê ve hatiye damezirandin û li Jafnayê dest bi weşanê kiriye. Ji sala 1923'yan heta 1929'an li herêma xweser a kurdan a Yekîtiya Sovyetê bi kurdî weşana radyoyê hatiye kirin. Di sala 1941'ê de ji hêla hikûmeta Fransayê ve radyoyeke bi navê Radyoya Levant hatiye avakirin. Di vê radyoyê de jî di hefteyê de du caran nîv saetê weşan bi zimanê kurdî hatiye kirin û weşana vê radyoyê heta sala 1946'an dom kiriye.

Di dîroka ragihandinê ya kurdan de îzgehên radyoyê yên mîna Radyoya Êrîvanê, Radyoya Tehranê û Radyoya Baxdayê pir girîng in. Niha jî bi dehan radyoyên mîna Dengê Amerîkayê, Dengê Mezopotamya, Kurdistan Radio, Newa Kurd Radio, SBS-Kurdî (Awistralya), Radyo Zeyale (Swêd) bi kurdî weşanê dikin.

**Pirsên jêrîn li gorî nivîsa jorîn bibersivînin.**

**1-** Di dîrokê de yekemîn radyoya ku bi kurdî weşan kiriye kîjan e?

______________________________

**2-** Radyoya Şerq el Adnayê ji hêla kîjan dewletê ve hatiye damezirandin?

______________________________

**3-** Radyoya Levant heta kîjan salê weşana xwe domandiye?

______________________________

**4-** Di dîroka ragihandinê ya kurdan de radyoyên girîng kîjan in?

______________________________

## 4- Televîzyon

Yekemîn televîzyona bi kurdî Xebat Tv ye. Wê di sala 1992'yan de dest bi weşanê kiriye. Ew televîzyona herêmî niha jî bi navê K. TV weşana xwe didomîne. Yekemîn televîzyona peykî (satelaytî) Med TV ye. Destpêka weşana wê jî 1995 e. Niha hejmara televîzyonên peykî ji 10'an derbas bûye. Hinek ji wan televîzyonan ev in: Roj TV, MMC, Kurdistan TV, KurdSat, Zagros TV, Newroz TV, Rojhilat TV, Tishk TV, Komala TV û Sahar TV…

Ji bilî van li ser înternetê bi sedan malperên bi kurdî hene. Ew malper dikarin hemû sînoran derbas bikin û bihêlin ku kurd ji hev agahdar bibin.

**Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.**

**1**. Yekemîn televîzyona bi kurdî kîjan e?

________________________________________

**2.** Xebat TV kengî dest bi weşanê kiriye?

________________________________________

**3.** Yekemîn televîzyona peykî (satelaytî) kîjan e?

________________________________________

**4.** Navên pênc televîzyonên ku bi kurdî weşanê dikin binivîsin.

________________________________________

# A- Xebatên peyvan

## 1- Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | | | ■ | | |
| 2 | | | | ■ | | | | | |
| 3 | | ■ | | | ■ | | | | ■ |
| 4 | ■ | | | ■ | | | | ■ | |
| 5 | | | | | ■ | | | | ■ |
| 6 | | ■ | | ■ | | | ■ | | |
| 7 | | | ■ | | | ■ | | | |
| 8 | | | | | | | | ■ | |
| 9 | ■ | | | | | | ■ | | |

**Çeperast:**

**1-** Xaneper, sîteya înternetê / Bersiva negatîf, dijwateya “erê”.
**2-** Bersiva pozîtîf, belê / Pergala desthilatiya gel, cumhuriyet
**3-** Paşgira neyîniyê, …xweş / Êş
**4-** Ne kevn, teze / … û pîr / Gihanekek
**5-** Ajaleke avî / Îrade, daxwaz
**6-** Tîpa piştî “e”yê / Baneşana şaşwaziyê / Veqetandekeke binavkirî
**7-** Sembola elementa Rûbîdyûmê/ Kêfxweş, dilgeş / Xiyar
**8-** Gêjik, gerdav.
**9-** Temsîlkar, nimînende / Di muzîkê de noteyek

**Serejêr:**

**1-** Navê lehengê destaneke kurdan / Çêregeh, cihê bi gul û giha
**2-** Paşgirek, guh…. / Paşgira neyîniyê ya dema niha / ta, werîs
**3-** Defter / Sîma, serçav
**4-** Rengê deryayê
**5-** Paşgirek / Ders
**6-** Aliyê ku roj lê diçe ava / Paşgirek
**7-** Kesên ji malê, malbat / Paşgirek, ron…
**8-** Xwarina bingehîn, ji gênim çêdibe / dijwateya “mê”
**9-** Agir / Dengûbehs

## 2- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.

| birûske | dîmen | tîşkename | malper | peyamhinêr | wêne |
|---|---|---|---|---|---|

**1-** Televîzyon ____________ bûyeran pêşkêşî mirov dike.
**2-** Di nivîsandina ____________ de alfabeya Morsê tê bikaranîn.
**3-** Bi telefonê ____________ û dîmen tên kişandin, peyam têne şandin.
**4-** Ew her roj li namedanka xwe dinêre û ____________ xwe dixwîne.
**5-** Ez duh ketim înternetê min ____________ dibistana me vekir.
**6-** Hogir îro bi riya ____________ bi min re axivî.



## B- Xwendin

# Cizîr dê bi şahiyên çandî rabe ser piyan

3'yemîn Rojên Çand û Hunerê yên Cizîrê dê îsal di navbera 10-12'yê mehê de bê lidarxistin. Duh li ser mijarê ji hêla Şaredarê Cizîrê Aydin Budak ve civînek hate pêkanîn. Di civînê de bernameya mîhrîcanê hate pêşkêşkirin. Li gorî bernameyê, ji derve jî gelek mêvan hatine vexwendin. Şaredar Aydin Budak qala hinek astengiyên fermî kir û got: “Heke pirsgirêkên fermî neyên derxistin dê ji Îran, Sûriye û Iraqê jî gelek mêvan beşdarî mîhrîcanê bibin.”
Budak diyar kir ku mîhrîcana îsal dê bi dirûşma "Azadiya Zimên, Azadiya Welêt e!" were lidarxistin. Li gorî bernameyê, mîhrîcan 10'ê mehê bi meşekê dest pê dike, di 12'ê mehê de dê bi konserekê were biqede.
Di mîhrîcanê de ji meşê heta folklor, şano, fîlm, ji pêşangeh û gotûbêjan heta xwendina helbestan, ji dîwana dengbêjan heta çalakiyên zarokan dê gelek çalakiyên hunerî bên pêşkêşkirin. Di van rojan de gelek panel û nîqaşên balkêş dê werin pêkanîn.

### 1- Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin?

**1-** Mîhrîcana îsal kengî tê lidarxistin?
**2-** Bername ji hêla kê ve hate pêşkêşkirin?
**3-** Li gorî bernameyê dê mêvan ji kîjan welatan beşdar bibin.
**4-** Mîhrîcana îsal bi kîjan dirûşmê tê lidarxistin?
**5-** Di mîhrîcana îsal dê kîjan çalakî werin pêşkêşkirin?

## C- Bikaranîna zimên

**1- Van hevokan li gorî demên destnîşankirî biguherînin.**

**1-** Li ber mala me dibistaneke nû tê avakirin. *(Dema boriya têdeyî)*

____________________________________

**2-** Par zêdetirî sed pirtûkên bi kurdî hatin weşandin. *(Dema boriya dûdar)*

__________________________________________

**3-** Îsal dê li Amedê mîhrîcaneke mezin were lidarxistin. *(Dema niha)*

___________________________________________

**4-** Li Amedê fîlmê “Min dît” hate nîşandayîn. *(Dema bê)*

___________________________________

**5-** Di destpêka sedsala nozdehan li Stenbolê gelek kovarên kurdî hatine weşandin. *(Dema boriya têdeyî)*

__________________________________________________________________

**6-** Li Enstîtuya Kurdî dersên kurdî hatin dayîn. *(Dema niha)*

___________________________________

**2- Van hevokên bi avaniya lebatî bikin forma tebatî.**

**Mînak**

*Di sala 1901’ê de Marconî radyo îcad kir.*
*Di sala 1901’ê de radyo (ji hêla Marconî ve) hate îcadkirin.*

**1-** Mîqdat Mîthat Bedirxan di sala 1898’an de Rojnameya Kurdistan derxist.

_____________________________________________________________

**2-** Ehmedê Xanî di sala 1684’an de Nûbara Biçûkan nivîsand.

_____________________________________________________________

**3-** Di sala 1941’ê de hikûmeta Fransayê Radyoya Levant ava kiriye.

_____________________________________________________________

**4-** Kurdan heta niha zêdetirî deh televîzyonên peykî ava kirine.

_____________________________________________________________

**5-** Kurd her sal di 22’yê rêbendanê de avabûna Komara Mehabadê pîroz dikin.

_____________________________________________________________

**6-** Şaredariya Amedê sala bê dê gelek parkên nû veke.

_____________________________________________________________

**3- Cihên vala bi lêkera alîkar “hatin”ê dagirin.**

**1-** Li her derê kulîlk ___________ çandin *(dema boriya têdeyî)*
**2-** Her roj mirovên azadîxwaz ___________ girtin. *(dema niha)*
**3-** Îro nebe jî sibe dê çareya şêrpenceyê ___________ dîtin. *(Dema bê)*
**4-** Pirtûka Mehmed Uzun Siya Evînê ___________ nasandin. *(Dema boriya dûdar)*
**5-** Dibe ku hefteya bê li komeleyê civînek ___________ lidarxistin. (Dema bê)
**6-** Heke rojname birêkûpêk ___________ weşandin, dê pir bê xwendin. *(hekanî)*
**7-** Dema ku rastî ___________ dîtin, dê gelek tişt zelal bibin. *(merc û daxwazî)*
**8-** Îsal bi zimanê kurdî gelek behrem ___________ weşandin. *(Dema boriya dûdar)*
**9-** Berî du salan li Amedê Sempozyûma Ehmedê Xanî ___________ lidarxistin. *(Çîrokiya dema boriya têdeyî)*
**10-** Duh bi şev mala apê min ___________ şêlandin. *(Çîrokiya dema boriya têdeyî/ neyînî)*

**4- Lêkeran “hatin”ê li gorî demê bikişînin.**

## Xelata Nobelê ya Wêjeyê Herta Muller wergirt. (09/10/2009)



Xelata Nobelê ya Wêjeyê ku her sal bi awayekî kevneşopî ji aliyê Akademiya Swêdê ve ___________ dayîn îsal nivîskar Herta Muller wergirt. Herta Muller di sala 1953’yan de li Romanyayê hatiye ser rûyê cîhanê lê wekî nivîskareke alman ___________ nasîn.
Nivîskara alman ku hêjayî xelata Nobelê ya îsal hat dîtin dê wekî xelat 1.4 mîlyon dolar wergire. Akademiya Swêdê der barê mijarê de daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de wiha ___________ gotin: "Ew bi xurtiya helbestê û zelaliya peşxanê cîhana feqîran baş taswîr dike, lewma ew şayanî xelatê ___________ dîtin.”
Xelata Nobelê ya Wêjeyê ji sala 1960’î heta niha ve her sal wekî kevneşopiyekê ___________ dayîn û Herta Muller 51’emîn xelatgira Nobelê ye. Heta niha nivîskarên wekî Jean-Paul Sartre, Pablo Neruda, Samuel Beckett, Gabriel Garcia Marquez, Dario Fo, Harold Pinter, Orhan Pamûk û gelek nivîskarên din hêjayî xelatê ___________ dîtin.

## Nivîs

**Hûn jî li gorî pirsên li jêr nûçeyekê der barê bûyerekê de binivîsin.**

Çi, çima, li ku, kengî û çawa qewimiye?

## Lêkerên Xwerû

| Rader | Dema niha | Raweya fermanî | Dema borî |
|---|---|---|---|
| alastin | dialêse | bialêse | alast |
| anîn | dihîne (tîne) | bihîne (bîne) | anî |
| avêtin | diavêje | biavêje | avêt |
| bihîstin | dibihîze | bibihîze | bihîst |
| bijartin | dibijêre | bibijêre | bijart |
| biraştin | dibirêje | bibirêje | biraşt |
| birin | dibe | bibe | bir |
| bûn | dibe | bibe | bû |
| cûtin | dicû | bicû | cût |
| çûn | diçe | biçe | çû |
| dan | dide | bide | da |
| dîtin | dibîne | bibîne | dît |
| dotin | didoşe | bidoşe | dot |
| firotin | difiroşe | bifiroşe | firot |
| gestin | digeze | bigeze | gest |
| gihaştin | digihêje | bigihêje | gihaşt |
| girtin | digire | bigire | girt |
| gotin | dibêje | bibêje | got |
| guhartin | diguhêre | biguhêre | guhart |
| guhastin | diguhêze | biguhêze | guhast |
| guvaştin | diguvêşe | biguvêşe | guvaşt |
| hatin | dihê (tê) | bihê (bê) | hat |
| hejmartin | dihejmêre | bihejmêre | hejmart |
| hinartin | dihinêre | bihinêre | hinart |
| hiştin | dihêle | bihêle | hişt |
| jentin | dijene | bijene | jent |
| ketin (keftin) | dikeve | bikeve | ket |
| kirin | dike | bike | kir |
| kolan | dikole | bikole | kola |
| kuştin | dikuje | bikuje | kuşt |
| kutan | dikute | bikute | kuta |
| lîstin | dilîze | bilîze | lîst |
| malaştin | dimalêje | bimalêje | malaşt |
| man | dimîne | bimîne | ma |
| mêtin | dimêje | bimêje | mêt |
| mirin | dimire | bimire | mir |
| nivistin | dinive | binive | nivist |
| pan | dipê | bipê | pa |
| parastin | diparêze | biparêze | parast |
| pêçan | dipêçe | bipêçe | pêça |
| pişaftin | dipişêve | bipişêve | pişaft |
| qefaltin | diqefêle | biqefêle | qefalt |
| qeşartin | diqeşêre | biqeşêre | qeşart |
| rêstin | dirêse | birêse | rêst |
| rêtin | dirêje | birêje | rêt |
| sotin | disoje | bisoje | sot |
| stran | distrê | bistrê | stra |
| şikestin | dişikê | bişikê | şikest |
| şûştin | dişo | bişo | şûşt |
| westan | diweste | biweste | westa |
| xistin | dixe | bixe | xist |
| xwarin | dixwe | bixwe | xwar |
| xwendin | dixwîne | bixwîne | xwend |
| xwestin | dixwaze | bixwaze | xwest |
| zan | dizê | bizê | za |

# Lêkerên pêkhatî yên ku bi paşgira “-în”ê pêk tên

| Rader | Dema niha | Raweya fermanî | Dema borî |
|---|---|---|---|
| barîn | dibare | bibare | barî |
| bezîn | dibeze | bibeze | bezî/beziya |
| borîn | dibore | bibore | borî |
| civîn | dicive | bicive | civî/ civiya |
| çinîn | diçine | biçine | çinî |
| çirîn | diçire | biçire | çirî/çiriya |
| êşîn | diêşe | biêşe | êşî/ êşiya |
| firîn | difire | bifire | firî/ firiya |
| gerîn | digere | bigere | gerî/ geriya |
| guherîn | diguhere | biguhere | guherî |
| herikîn | diherike | biherike | herikî |
| karîn | dikare | bikare | karî/ kariya |
| kelîn | dikele | bikele | kelî/keliya |
| kenîn | dikene | bikene | kenî/keniya |
| kirîn | dikire | bikire | kirî |
| meşîn | dimeşe | bimeşe | meşî/ meşiya |
| nasîn | dinase | binase | nasî |
| nêrîn | dinêre | binêre | nêrî |
| nivîsîn | dinivîse | binivîse | nivîsî |
| peyivîn | dipeyive | bipeyive | peyivî |
| qedîn | diqede | biqede | qedî/ qediya |
| qerisîn | diqerise | biqerise | qerisî |
| qetîn | diqete | biqete | qetî/ qetiya |
| qewimîn | diqewime | biqewime | qewimî |
| revîn | direve | bireve | revî/ reviya |
| şewitîn | dişewite | bişewite | şewitî |
| weşîn | diweşe | biweşe | weşî/weşiya |
| xebitîn | dixebite | bixebite | xebitî |
| xeyidîn | dixeyide | bixeyide | xeyidî |
| zîvirîn | dizîvire | bizîvire | zîvirî |

## Lêkerên pêkhatî yên ku bi paşgira “-andin”ê pêk tên

| Rader | Dema niha | Raweya fermanî | Dema borî |
|---|---|---|---|
| barandin | dibarîne | bibarîne | barand |
| bezandin | dibezîne | bibezîne | bezand |
| ceribandin | diceribîne | biceribîne | ceriband |
| civandin | dicivîne | bicivîne | civand |
| çirandin | diçirîne | biçirîne | çirand |
| domandin | didomîne | bidomîne | domand |
| êşandin | diêşîne | biêşîne | êşand |
| firandin | difirîne | bifirîne | firand |
| gerandin | digerîne | bigerîne | gerand |
| guherandin | diguherîne | biguherîne | guherand |
| herikandin | diherikîne | biherikîne | herikand |
| kişandin | dikişîne | bikişîne | kişand |
| kelandin | dikelîne | bikelîne | keland |
| kenandin | dikenîne | bikenîne | kenand |
| meşandin | dimeşîne | bimeşîne | meşand |
| nasandin | dinasîne | binasîne | nasand |
| peyivandin | dipeyivîne | bipeyivîne | peyivand |
| qedandin | diqedîne | biqedîne | qedand |
| qerisandin | diqerisîne | biqerisîne | qerisand |
| qetandin | diqetîne | biqetîne | qetand |
| revandin | direvîne | birevîne | revand |
| rijandin | dirijîne | birijîne | rijand |
| standin | distîne | bistîne | stand |
| şandin | dişîne | bişîne | şand |
| şewitandin | dişewitîne | bişewitîne | şewitand |
| tewandin | ditewîne | bitewîne | tewand |
| weşandin | diweşîne | biweşîne | weşand |
| xebitandin | dixebitîne | bixebitîne | xebitand |
| xeyidandin | dixeyidîne | bixeyidîne | xeyidand |
| zîvirandin | dizîvirîne | bizîvirîne | zîvirand |

# Lêkerên pêkhatî yên ku bi pêşgiran çêdibin

| Rader | Dema niha | Raweya fermanî | Dema borî |
|---|---|---|---|
| çêkirin | çêdike | çêke | çêkir |
| dadan | dadide | dade | dada |
| dagirtin | dadigire | dagire | dagirt |
| daketin | dadikeve | dakeve | daket |
| daliqandin | dadiliqîne | daliqîne | daliqand |
| damezirandin | dadimezirîne | damezirîne | damezirand |
| daxistin | dadixe | daxe | daxist |
| hilanîn | hiltîne | hilîne | hilanî |
| rabûn | radibe | rabe | rabû |
| rahiştin | radihêje | rahêje | rahişt |
| raketin | radikeve | rakeve | raket |
| rakirin | radike | rake | rakir |
| raxistin | radixe | raxe | raxist |
| rûniştin | rûdine | rûne | rûnişt |
| vebûn | vedibe | vebe | vebû |
| vegerîn | vedigere | vegere | vegerî/vegeriya |
| vegotin | vedibêje | vebêje | vegot |
| vekirin | vedike | veke | vekir |
| veqetandin | vediqetîne | veqetîne | veqetand |
| veşartin | vedişêre | veşêre | veşart |
| wergerandin | werdigerîne | wergerîn | wergerand |

# BERSIVDANK

## DESTPÊK

**B- DANASÎN**

**1- Li gorî hevpeyvînê cihên vala dagirin.**

hejdeh / Wanê / Rodî / Dilşa / Pelîn / Serhat / Xecê / Qenco

**2- Valahiyên li jêr dagirin.**

1- e, 2- ye, 3- me, 4- in, 5- e, 6- yî, 7- e, 8- ne, 9- in, 10- in

**3- Valahiyên li jêr dagirin.**

1- wê, 2- wan, 3- wî

**4- Veqetandek**

ê / a / ê / ên / ê / ê / ê / ên / eke / a / ê

**5- Di nivîsa li jêr de binê veqetandekan xêz bikin.**

Navê min Rohat e. Ez ji bajarê Mêrdînê me. Mala me li rojhilatê bajêr, di taxeke biçûk de ye. Niştecihên taxê bi piranî karker û karmend in. Mala me maleke biçûk e. Xaniyên der û dora me ne zedê mezin in. Di taxa me de mizgefteke biçûk heye. Li hemberî mizgeftê jî kaniyek heye. Di taxa me de dibistan tune ye.
Di mala me de pênc kes hene. Dê û bavê min, du xwişkên min û ez. Navê xwişkeke min Şîlan e û navê ya din jî Rûken e. Her du jî gelekî bedew in. Tu birayên min tune ne. Bavê min zilamekî kedkar e. Diya min jî jineke jîr e.

**6- Li gorî agahiyên li jêr nivîsekê binivîsin.**

Navê wî Bager e. Ew xwendekar e. Ew ji Çewlikê ye. Navê bavê wî Hogir e. Hogir ajokar e. Navê diya wî Sozdar e. Ew bermalî ye. Du xwişkên wî hene. Navên wan Rojîn û Berfîn in. Birayekî wî heye. Navê wî Adar e. Taxa wan mezin e. Di taxa wan de dibistaneke mezin, mizgefteke kevnare û du kanî hene.

**HÎNDARÎ**

**1- Di nivîsa li jêr de cihên vala dagirin.**

Ez / im / me / min / Ew / wî / ye / wê / hene / wan / in / heye / wê / ye / e / e / hene / ne / heye

**2- Qertafên Tewangê**

1-yî, 2-ê, 3-ê, 4-ê, 5-ê, 6-î, 7-an, 8-an

**3- Hevokan çêkin.**

1- Bager zilamekî zana ye.
2- Gulbîn wênesaz e.
3- Bejna Zelalê dirêj e.
4- Ew xortekî teral e.
5- Xaltîka min jineke xwîngerm e.
6- Çavên xwişka min şîn in.
7- Xaniyê apê me mezin e.
8- Birayê hevserê/a min parêzer e.
9- Deriyê mala me zexm e.
10- Birayê Rojbînê dadger e.

## UNÎTE 1 BIBÎRXISTIN

**A- JIYANA ROJANE**

**1- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.**

1- Şermîn li Amedê dijî.
2- Ew xwendekar û şanoger e.
3- Ew di beşa wêjeyê de dixwîne.
4- Ew di hefteyê de sê rojan dixebitin.
5- Ew ji helbestan hez dike.
6- Kêfa wê ji Îrfan Amîda re tê.
7- Ew rojnameyekê dikire.
8- Ew rojnameya Azadiya Welat dixwîne.
9- Ji ber ku ew bi hunerê re têkildar e.
10- Ew êvaran an pirtûkan dixwîne yan jî li ser dersên xwe dixebite.

**2- Di nivîsa li jêr de binê lêkerên di forma dema niha de xêz bikin.**

Navê diya min Amîne ye. Ew germahiya dilê min û roja jiyana min e. Diya min çil û heft salî ye. Porê wê hêdî hêdî spî dibe. Çavên wê yên hingivîn bi keser li cîhanê dinêrin. Lê dema ew zarokên xwe dibîne, çavên wê dibiriqin. Ew ne jineke dirêj e, lê belê bejna wê lihevhatî ye.
Diya min jineke pir jêhatî ye. Ew sibehan zû radibe diçe ber tenûrê û nên dipêje. Piştre jî karên malê dike. Ew xwarinên gelekî xweş çêdike.

Diya min carinan qala zaroktiya xwe dike. Wê demê ez dibînim ku hesreta rojên berê di dilê wê de ye. Ew pir diltenik û dilovan e. Dema kesên xizan an jî biêş dibîne, ji bo wan digirî.

Diya min carinan porên xwişka min şeh dike û ji wê re dilorîne. Wê demê ez dizanim ku diya min dibe zarokeke dilşa û di nav mêrgan de baz dide. Ez diçim serê xwe datînim ser çokên wê û li wê guhdarî dikim.
Bi dengê lorîna wê ez hemû hesreta xwe diherikînim binê lingên wê.

**HÎNDARÎ**

**1- Nivîsa li jor li gorî kesa/ê sêyem ji nû ve binivîsin.**

Navê wê Şîlan e. Ew çardeh salî ye. Ew li gundê Huseyna dijî. Huseyna gundê Farqînê ye. Ew her sibeh zû radibin. Ew û diya xwe derdorê didin hev û taştê amade dikin. Di taştê de ew penêr, to, hingiv û hekerûnê dixwin. Ew gelekî ji dimsê hez dike, ji ber vê yekê ew her sibe dimsê jî dixwe. Piştî taştê ew her yek karekî dikin. Diya wê nan dipêje, dew dikêle. Bavê wê û birayê wê diçin cot. Birayekî wê ajalan dibe çêrê. Ew û xwişka xwe diçin ser kaniyê cilan dişon. Dema ku ew karên xwe diqedînin ew carinan diçin mala cîranan. Keça cîranê wan hevala wê ye. Ew gelekî ji wê hez dike. Ber êvaran ew bi hev re diçin bêriyê.
Êvaran ew giş li malê vedigerin. Ew bi hev re şîvê dixwin. Carinan mala apê wê tên serlêdana wan. Carinan jî ew diçin mala wan. Ew êvaran zû radikeve.

**2- Di nivîsa li jêr de lêkeran li gorî dema niha bikişînin.**

radibin / dikin / dibin / diçin / dikin / dişon / dipêjin / diçin / didoşin

**3- Lêkerên li jêr li gorî dema niha bikişînin.**

1-dixwînim 2-radibe 3-namîne 4-naçî 5-dilîzin 6-nabare 7-diêşe 8-diqerise 9-dibezîne 10- diqede 11-tê / diweşin 12-dibînim / dibe 13-tê / vedibin 14-dibihîzim / tê 15-difikirim / digirîm

**4- Di nivîsê li jêr de çewtiyan bibînin û sererast bikin.**

Bavê min zilamekî bi bejn û bal e. Ew yekî dirêj û xurt e. Ew sibê zû hişyar dibe û taştê amade dike. Piştre me hişyar dike û em bi hev re taştê dixwin.
Bavê min rojnameger e. Ji ber vê yekê ew carinan diçe bajarên din. Dema ew diçe bajarên din, ez gelekî bêriya wî dikim.
Bavê min piştî taşteyê rojnameyan dixwîne, piştre jî diçe kargehê. Ew berêvarî vedigere malê. Em şîvê dixwin û qala roja xwe dikin. Piştî şîvê em carinan li televîzyonê temaşe dikin.
Bavê min ji hevalên xwe pir hez dike. Hin êvaran hevalên wî tên mala me. Ew bi piranî li ser rojevê û siyasetê dipeyivin.
Bavê min bi şev li ser kompîturê dixebite û pir dereng radikeve. Pire caran ji min û xwişka min re çîrokan dibêje. Ez gelekî ji çîrokên wî hez dikim. Dawiya hefteyê em carinan diçin sînemayê carinan jî digerin. Dema ez bi bavê xwe re digerim, gelekî kêfxweş dibim.

**5- Cihên vala bi gihanekên li jêr dagirin.**

1- ji bilî, 2- Ji ber vê yekê, 3- lê belê, 4- ji ber ku

**B- EZ DIXWAZIM**

**1- Hevokên li jêr biqedînin.**

1- Delal dixwaze bibe rojnameger û nûçeyan binivîse.
2- Evîn dixwaze bibe bijîşk û ji nexweşiyan re dermanan bibîne.
3- Rohat dikare bi kurdî bixwîne û binivîse.
4- Sîdar dikare kilaman bibêje û li tembûrê bide.

**2- Lêkerên di nav kevanekê de li gorî forma rast bikişînin.**

1-bigerim, 2-dixwazin, 3-biçe, 4-werî/bêyî, 5-naxwazim, 6-bilîzin, 7-vebêjin, 8-biçim, 9-bibare, 10-bibim

**3- Lêkerên di nav kevanekê de li gorî forma rast bikişînin.**

1-bipeyivim, 2-bikin, 3-bide, 4-biajo, 5- bibêjî, 6-dikarim, 7- bimeşî, 8- bilîzin, 9- dikare, 10- dikarim

**C- TENDURISTÎ**

**2- Di nivîsa li jêr de lêkeran li gorî forma rast bikişînin.**

bixwî / vexwî / neçî / vekevî / nemînî / bixwî / nebî

**3- Hevokên li jor bi forma divêtî binivîsin.**

Divê hûn ji zarokên xwe hez bikin, lê belê divê hûn wan şûm ranekin.
Divê hûn ji bo wan demê veketînin, bila ew bi we re şa bibin.
Çîrok afirîneriya zarokan xurt dikin, divê hûn ji wan re çîrokan bixwînin.
Lîstik hêza wan a aşopî xurtir dikin, divê hûn bi wan re bilîzin.
Divê tenê hûn nepeyivin. Bila ew jî bipeyivin.
Divê hûn li wan guhdariyê bikin. Bila bi xwe bawer bibin.
Bihêlin bila hin karên xwe ew bi xwe bikin. Bila ew berpirsiyariyên xwe bizanin.
Divê hûn spartekên wan çênekin. Bila ew bi xwe hîn bibin.
Dema wan tiştekî baş kir divê hûn wan pîroz bikin.
Dema wan tiştekî nebaş kir Divê hûn wan rexne bikin.
Bila rastî û çewtiyê nas bikin.
Divê hûn li pêş zarokan şer nekin. Bila netirsin.

**HÎNDARÎ**

**1- Lêkerên li jêr li gorî forma rast bikişînin.**

bikî / bin / bin / meçe / çêke / bixebite / bipirse / vebêjin / bibersivîne / metirse / bizanibî / bikî / bixwazî / meke / nekî / bixwîne / ramekeve / rabî

**2- Hevokên li jêr li gorî di nava kevanekê de ji nû ve saz bikin.**

1- Divê ez spartekên xwe çekim.
2- Bila Hogir biçe sûkê.
3- Zelal dixwaze rojnameyê bixwîne.
4- Divê ez îngilizî hîn bibim.
5- Ez dikarim li tembûrê bidim.

**3- Lêkerên li jêr li gorî forma rast bikişînin.**

werim, bêm / bixebitim
bikî / bibersivînim / bipirse / bibersivîne
bidî / bide
biçe / bişo / were, bê
biçim
bikî
bikî / biçim
bikim / bimeşî
biçe / bikire / biçe

## UNÎTE 2 PLANSAZÎ

**A- TU YÊ SİBÊ ÇI BIKÎ?**

**1- Pirsên li jêr li gorî axaftînê bibersivînin.**

1- Ew ê biçin sînemayê.
2- Ew ê bi diya xwe re biçe sûkê.
3- Ew ê li Kuçeya Hunerê hev bibînin.
4- Azad dê Diyarî li komeleyê bibîne.
5- Ew ê wêneyên Fevzî Bilgeyî bibînin.

**2- Cihên vala li gorî axaftinê dagirin.**

1- …temaşe bikin
2- …biçe sûkê
3- …dest pê bike
4- …beşdarî civîna xwendekaran bibe
5- …biçe Hewana Sumerparkê
6- …biçe komeleyê

**3- Li gorî axaftinê cihên vala dagirin.**

1- …beşdarî gotûbêjekê bibe
2- …wêjeya kurdî ya nûjen be
3-…wekî axêver beşdarî gotûbêjê bibin
4- …guhdariya axêveran bike
5- … agahdar bike

**4- Lêkeran li gorî forma rast bikişînin.**

tê / neçin / biçin / bibînin / bêm,werim / bibin

**HÎNDARÎ**

**1- Di axaftina li jêr de lêkeran li gorî dema bê bikişînin.**

bikî / biçim / bikim / bê, were / bixebitin / biçim / biçin / bikin / bikin / biçin / bibînin

**2- Lêkerên di nav kevanekê de li gorî dema bê bikişînin.**

1- bên, werin / rabim / bişom / bikim / biçim / bikirim / çêkim / bimînim
2- bicivin / bikin / bikim
3- bibîne / biçin / bigerin
4- bibin / bixemilînin / bixin

**3- Hevokên li jêr bixin forma dema bê**

1- Zarok dê li kuçeyê bilîzin.
2- Zozan dê bi mamoste re bipeyive.
3- Zîlan dê daxwaznameyekê binivîse.
4- Ez ê li strana Aram guhdariyê bikim.
5- Tu yê çi bikî?
6- Ew ê biçe ku derê?

**B- TU YÊ VÊ HAVÎNÊ ÇI BIKÎ?**

**1- Li gorî axaftinê du paragrafan binivîsin.**

Narîn dê vê havîne biçe Duhokê. Ew ê li mala dotmama xwe bimîne. Ew ê li wir bigere û cihên dîrokî bibîne. Berî ku ew biçe Duhokê, ew ê ji dotmama xwe re diyariyan bikire.
Rojda dê vê havînê biçe gund. Ew ê li ba dapîr û bapîrê xwe bimîne. Piştî ku ew ji gund vegere, ew ê biçe Stenbolê hinda xaltîka xwe. Ew ê li wir bigere û xizmên xwe bibîne.

**2- Hevokan bi piştî ku / berî ku bigihînin hev.**

1- Piştî ku ez spartekên xwe çêkim, ez ê rojnameyê bixwînim.
2- Berî ku mêvan werin, ez ê şîvê çêkim.
3- Piştî ku em xwarinê bixwin, em ê biçin parkê.
4- Berî ku ez nameyê bişînim, ez ê nameyê careke din bixwînim.
5- Piştî ku ez ji dibistanê derkevim, ez ê biçim postexaneyê.

**C- Tu dixwazî siberojê çi bikî?**

**1- Li gorî axaftinê li ser planên kesan binivîsin.**

Azad dê di beşa dîrokê de bixwîne. Ew dixwaze îngiliziya xwe bi pêş bixe. Ew ê li ser dîroka kurdan lêkolînan bike. Ew ê lêkolînên bi îngilîzî jî bixwîne.

Dîlan dê di zanîngehê de beşa wêjeyê hilbijêre. Ew dixwaze bibe nivîskareke serkeftî.

Mîrza dê di Zanîngeha Selahadîn de beşa siyasetê bixwîne. Ew dixwaze li Hewlêrê bixwîne.

**2- Bi lêkerên li jêr cihên vala dagirin.**

bixwînim / bibim / hîn bibim / biqedînim / bikim / bigerim / bimînim / binivîsim

**3- Hevokên li jêr bigihînin hev.**

1-b, 2-d, 3-a, 4-e, 5-c

## UNÎTE 2 - SPARTEK

**A- Xebata li ser peyvan**

**1- Bi lêkerên hevedudanî cihên vala dagirin.**

1- li dar bixin / dest pê bike
2- pêk were / amadehiyan bikin
3- kom bibin
4- bi pêş bixim

**B- Xwendin**

**1- rast / çewt**

1-çewt, 2-rast, 3-çewt, 4-rast, 5-rast

**2- Pirsên li jêr li gorî diyaloga li jor bibersivînin.**

1- Rojên pêncşeman filmên nû tên sînemayê.
2- Di sînemaya Metropolê de fîlmê “Bahoz” dilîze.

3- Dîlan li benda fîlmê “Bahoz” e.
4- Hêlîn dê destûrê ji diya xwe bistîne.
5- Ew ê saet di du û nîvan de hev bibînin.
6- Heval dê li ber sînemayê bicivin.

**C- Bikaranîna Zimên**

**1- Cihên vala dagirin.**

bikî / biçim / bimînin / bimînin / bikin / bikevin / biçin / bigerin / biçin / bixebitim

**2- Li gorî agahiyên li jor paragrafekê binivîsin.**

Bêrîvan dê vê havînê bi malbata xwe re biçe ber Behra wanê. Ew ê li Tetwanê, li cem hevalekî bavê wê bimînin. Ew ê li wir bikevin avê. Ew ê biçin ser Kela Wanê. Ew ê li nava bajêr bigerî. Ew ê bi keştiyê biçin Dêra Axtamarayê.

**3- Lêkerên di nav kevanekê de li gorî dema bê bikişînin.**

biçim / bijîm / were / veneqetin / bixebitim / kevim / bibim / nehêlim

**4- Hevokên li jêr bixin forma dema bê.**

1- Ez ê neçim Amedê.
2- Em ê civîneke li dar bixin.
3- Ez ê spartekên çêkim.
4- Zelal dê nameyekê binivîse.
5- Tu yê bi kê re bipeyivî?
6- Adar dê li ku derê bimîne?
7- Ez ê venegerim gund.
8- Tu yê beşdarî civînê bibî?

**5- Hevokên li jêr li gorî xwe temam bikin.**

Bersivên xwendekaran.

## UNÎTE 3 PÊŞBÎNÎ

**A- SIBEROJ**

**1- Pirsên li jêr li gorî diyalogê bibersivînin.**

1- Li gorî Dîlanê dê siware bi enerjiya rojê bixebitin.
2- Bi nêrîna Rojdayê dê mirov di bin behrê de bajaran ava bikin.
3- Li gorî Azad dê qeşaya li cemseran tev bihele û dinya di bin avê de bimîne.
4- Li gorî mamoste pêşbîniya Azad bedbîn e.
5- Bersivên xwendekaran.

**2- Navên kesan li ber hevokan binivîsin.**

1-Serhat, 2-Hêlîn, 3-Qenco, 4-Qenco, 5-Rojda

**3-Hevokan temam bikin.**

1-… dê dinya bi xetereyên mezin re rû bi rû bimîne
2-… dê di demeke kin de dinya di bin avê de bimîne
3-…dê hejmara xizanan zêdetir bibe
4-…dê gelek cih bibin çolitan

**HÎNDARÎ**

**1- Der barê pêşerojê de pênc pêşbîniyan binivîsin.**

Bersivên xwendekaran

**2- Hevokên li jêr temam bikin. (Dibe ku xwendekar bersivên cuda bidin.)**

1-…dibe ku baran bibare
2-… dê kulîlk biçilmisin
3-…tu nikarî bi ser kevî
4-…dibe ku em bêkar bimînin
5-…em ê biçin sînemayê

**3- Lêkerên di nav kevanekê de li gorî forma rast bikişînin.**

bikim / bixwînim / nexebitim / nekim / hilbijêrim / bibim

**B- EZ DIKIM…**

**1- Hevokên li jêr temam bikin.**

1-…biçe mala Rojdayê
2-…malê paqij bike
3-…biçe konsera Dilşad Seîd
4-…kadeyan çêke

**HÎNDARÎ**

**1- Lêkerên din av kevanekê de li gorî forma rast bikişînin.**

1-bixwim, 2-veke, 3-bibin, 4-biçin, 5-bikî, 6-bide, 7-bigerîne, 8-bibînim

**2- Hevokên li jêr temam bikin. (Dibe ku xwendekar bersivên cuda bidin.)**

1-…xwarinê çêke
2-…rakeve
3-…li otobusê siwar bibe
4-…li fîlm temaşe bikin
5-…ji malê derkeve

**3- Hevokên li jêr bixin forma dema bê ya nêzîk.**

1- Em dikin civîneke li dar bixin.
2- Ew dike nameyekê binivîse.
3- Em dikin li nûçeyan temaşe bikin.
4- Ez dikim kîloyek sêv bikirim.
5- Hûn dikin çi bikin?
6- Ew dikin qesrekê ava bikin.

## UNÎTE 3 - SPARTEK

**A- Xebata li ser peyvan**

**1- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.**

1- qirêjiya, 2- qeşa, 3- mercên, 4- aborî, 5- parastina

**2- Peyvên li jêr bigihînin wateyên wan.**

1-b, 2-a, 3-g, 4-c, 5-d, 6-b, 7-f, 8-e

**3- Cihên vala bi lêkerên hevedudanî dagirin.**

1- ava dike, 2- germ dibe, 3- dijwar dibe, 4- zêde bike

**B- Bikaranîna Zimên**

**1- Her du beşên hevokan bigihînin hev.**

1-e, 2-c, 3-b, 4-d, 5-a

**2- Hevokan li gorî wêneyan temam bikin.**

1-… basketbolê bilîzin
2-… çayê vexwe
3-… fîstanekê bikire
4-… Dîlanê hişyar bike

## UNÎTE 4 DUH

**A- TE DUH ÇI KIR?**

**1- Kê çi kir?**

1- kê, 2- kî, 3- kî, 4- kî, 5- kê

**HÎNDARÎ**

**Sînem:**

rabûm, kir, xwar, şûştin, malaşt, derketin, çû, kirî, meşîm, gihaştim, xwend, kir, qedand, derketim, çûm, bû, kir, raketim

**Zelal:**

derketim, bûm, çûm, gihaştim, veda, çêkirin, qedandin, kir, hat, xwar, kir, raketim

**2- Hevokan bi lêkeran temam bikin.**

1- şûştin, 2-xwendin, 3- dîtin, 4- hat, 5- çû, 6- çêkirin, 7- raket.

**Nivîs**

**Te duh çi kir?**

Bersivên xwendekaran.

**3- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî dema borî bikişînin.**

**Stran / Nesrîn**
kuştim / kuştim / kirim / kirim

**4- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî dema borî bikişînin.**

1- dîtin, 2- meşiyam, 3- qediya, 4- nexwend, 5- şûştin, 6- xwar, 7- nivîsî, 8- nedîtim, 9- vexwend, 10- çêkir, 11- hilkişiya, 12- neçûm, 13- hatin, 14- ket, 15- kir

**5- Lêkereên di nav kevanekê de li gorî dema borî bikişînin.**

çû / bû / çêkir / danî / kir / dît / got

## B- AZAD ÇÛ PIRTÛKXANEYÊ

1- Azad çû pirtûkxaneyê.
2- Wî du pirtûkên çîrokan wergirtin.
3- Wî meha çûyî sê pirtûk xwendin.
4- Kêfa wî ji pirtûka bi navê “Çîrokên Gelêrî” re hat.
5- Kêfa wî ji çîroka der barê Ristemê Zal” de hat.

## C- GEŞT Û SEYRAN

**1- Pirsên li jêr li gorî diyalogê bibersivînin.**

1- Ew çûn ser Kela Wanê.
2- Ew bi erebeya Reşoyî çûn.
3- Piştî taştê ew hilkişiyan ser kelê.
4- Zarokan ji wan re qala dîroka kelê kir.
5- Ji ser kelê dîmenê bajêr pir xweş bû.
6- Wan di firavînê de goştê masiyan xwar.
7- Wan li ber dengê tembûrê govend girt.

## UNÎTE 4 SPARTEK

### A- Xebata li ser peyvan

**1- Lêkerên li jêr li gorî dema borî bikişînin û di cihê rast de bi cih bikin.**

çûm / civiyan / sekinîn / raxist / rûniştin / vêxist / çêkir / kir / geriyan / lîst / ketin / vegeriyan / westiyam / raketim.

### Rojan çû muzeyê

**2- Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.**

1- Rojan roja yekşemê çû muzeyê.
2- Bavê wî ew bir muzeyê.
3- Li muzeyê pêşaneya tiştên kevn û dîrokî hebû.
4- Herî zêde xemlên jinan bala wî kişand.
5- Gerînendeyê muzeyê qala şaristanî û serdemên berê kir.
6- Li muzeyê nivîsên bizmarî hebûn.

### B- Xwendin

**1-Dîlan çû seyranê**

1- Ew pêr çûn geşt û seyranê.
2- Ew çûn ber Çemê Dîcleyê.
3- Ew li cihekî xweş rûniştin.
4- Zarok heta xwarinê li derdorê geriyan.
6- Wan di firavînê de goşt xwar.
7- Piştî firavînê Sîdar û Tacdîn ketin avê.
8- Bavê Dîlanê û Apê Hogir masî girtin.
9- Ew berêvarî vegeriyan malê.

### C- Bikaranîna zimên

**1- Hevokên li jêr bixin forma d. boriya têdeyî.**

1- Min li televîzyonê temaşe kir.
2- Em li ber deryayê meşiyan.
3- Tu bi ku ve çûyî?
4- Hûn li ku derê man?
5- Min pirtûka Rênas Jiyan xwend.
6- Min nameyek nivîsand.
7- Ez raneketim.
8- Tu çima neçûyî?

**2- Hevokên li jêr sererast bikin.**

1- Ez saet di heftan de gihaştim malê.
2- Min rojname nexwend.
3- Min li malê firavîn xwar.
4- Rojan duh nehat dibistanê.
5- Min duh hevalên xwe dîtin.
6- Arda bi balafirê çû Amedê.

**4- Çîroka Keçel û Apê**

hebû / bû / çû / dizî / got / nekir / kir / rabû / kir / keland / da / rahişt / da / dîtin / anî / ket / xwar / vegeriya / nezanî / qewirand

## UNÎTE 5 SERBORÎ

### B- Tu qet çûye Wanê?

1- Pirsên li jêr bibersivînin.
1- Belê ew çûye Wanê.
2- Na, Rojda qet neçûye Wanê.
3- Na, Dîlanê qet pirtûkên Dilawer Zeraq nexwendine.

4- Belê Azadî pirtûkên Dilawer Zeraq xwendine.
5- Serdilî qet li stranên Ayşe Şanê guhdarî nekiriye.
6- Belê, Hêviyê li stranên Ayşe Şanê guhdarî kiriye.

**HÎNDARÎ**

**1- Hevokên li jêr bixin forma dema boriya dûdar.**

1- Şerzan duh çûye Mîdyadê.
2- Hogirî duh hevalên xwe dîtine.
3- Wan pêr civînek li dar xistiye.
4- Ew duh dereng hatine malê.
5- Diya min ji min re fîstanek kiriye.
6- Zelalê guldank şikandiye.
7- We bername amade kiriye?
8- We taştê xwariye?

**2- Hevokên li jêr bixin forma dema boriya dûdar.**

2- Azad duh bi şev li malê maye.
Wî spartekên xwe çêkirine.
3- Hêlîn duh bi şev li mala Rojdayê maye.
Ew pir dereng raketine.
4-Qencoyî nameyek ji apê xwe re nivîsiye.
Wî qala xebatên xwe kiriye.
5- Serhatî duh hevalên xwe dîtine.
Wan futbol lîstiye.

**C- Dema ku**

**1- Rast û çewt**

2- rast, 3- rast, 4- çewt, 5- çewt, 6- rast

**2- Binê lêkeran xêz bikin.**

guhdarî nedikir, li hev didan, dipeyivîn, digot, xêz dikir, diavêtin, dikir, dinêrî

**3- Lêkeran li gorî dema boriya berdest bikişînin.**

1- dibarî / dibariya, 2- diçû, 3- dilîst, 4- digerîn / digeriyan, 5- dikir, 6- dişûştin, 7- diajot, 8- dibirîn, 9- dixwar, 10- dibir

**D- Dema em zarok bûn**

**2- Lêkeran li gorî d. boriya berdest bikişînin.**

dicivîn / diciviyan, dibû, dibû, diketin, didan, digerîn / digeriyan, direqisîn, digot, didan

**3- Hevokan temam bikin.**

1- li kuçe û kolanan digeriyan., 2- avjenî dikir, 3- dida, 4- diçûn, 5- çêdikirin, 6- digotin

## UNÎTE 5 - SPARTEK

**A- Xebata li ser peyvan**

**1- Wateya navdêran binivîsin.**

1- cotyar, 2- bêrîvan, 3- şivan, 4- mêwij, 5- xweza, 6- mêrg, 7- zevî, 8- hevsengî

**B- Bikaranîna zimên**

**1- Beşên hevokan bigihînin hev.**

1- e, 2-f, 3-c, 4-d, 5-b, 6- a

**2- Lêkeran li gorî dema boriya berdest bikişînin.**

dibûn, dibirin, dikirîn, radibûn, radimûsandin, dikirin, didan, derdiketin, diçûn, dikir, nedida, nediçûm, dihatin, dibûn

**3- Lêkeran li gorî dema boriya dûdar bikişînin.**

guherîne, mane, bûye, hilweşiyaye, nemane, çûne, bûye

## UNÎTE 6 ROJÊN BERÊ

**A- Vegera li welêt**

**1- Peyvên li jêr bigihînin wateya wan.**

1-g, 2-f, 3-d, 4-b, 5-e, 6-c, 7-h, 8-a

**2- Rast û Çewt**

1-çewt, 2-rast, 3-çewt, 4-çewt, 5-rast, 6-rast, 7-çewt

**3- Cihên vala bi veqetandekan dagirin.**

1-ê, 2-ya, 3-ên, 4-a, 5-yên

**B- Bûyerek ji dîrokê**

**1- Peyvên hemwate**

çek, êrîş, komkujî, berfireh, şer, bûyer, agirbest, balafir

**2- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.**

1- Komkujiya Helebçeyê di 16'ê Adara 1988'an de pêk hat.
2- Di komkujiyê de 6 hezar û 350 kesî jiyana xwe ji dest da.
3- Navê operasyonê Enfal bû.
4- Di navbera Iraq û Îranê de agirbest pêk hat.

**C- Kesayetiyekî Dîrokî**

**1- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.**

1- Feqiyê Teyran di sala 1563'yan de li Miksê hatiye dinyayê.
2- Li gorî hin baweriyan Feqiya Teyran bi zimanê teyran dizanî. Ji ber vê yekê wî ev nav li xwe kiriye.
3- Feqiyê Teyran xwe wekî helbestvanê jar û bindestan bi nav kiriye.
4- Wi navê "Mîm û Hê" bi kar aniye.
5- Stranên wî yên bi navê "Ay dilberê" û "Ey av û av" bûne stran.

**D- Çîrok**

**1- Lêkerên di forma çîrokiya dema boriya têdeyî de**

dîtibû, kiribû, veniştibû

**2- Li gorî mînaka li jêr hevokan bigihînin hev.**

1- Gava ku ez ketim fêrgehê, mamoste dest bi waneyê kiribû.
2- Dema ku ez ji bajêr vegeriyam, birayê min karê xwe qedandibû.
3- Dema ku ez gihîştim ser sifreyê, xwarin nemabû.
4- Dema ku em derketin derve, baran sekinîbû.
5- Dema ku şivan hişyar bû, gur ketibû nav pêz.

**3- Lêkerên di nav kevanekê de bixin forma çîrokiya dema boriya têdeyî.**

kirîbû, kiribû, danîbû, nexwaribû, bûbû

## UNÎTE 6 - SPARTEK

**A- Xebata li ser peyvan**

**1- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.**

1- xuya dike, 2- mezin bûm, 3- pêşwazî kir, 4- pêk tên, 5- bi dawî kir, 6- xatir xwest, 7- pev çûn, 8- zêde kir

**2- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.**

1-derfetên, 2-komkujiya, 3-dîrokî, 4-diyariyekê, 5-baweriya, 6-bûyereke, 7-êrîşî, 8-çekên

**B- Xwendin**

**1- Pirsên li jêr bibersivînin**

1- Ehmedê Xanî di sala 1651'ê de hatiye cîhanê.
2- Li gorî wî Ehmedê Xanî sertacê nivîskar û helbestvanên kurd e.
3- Ehmedê Xanî ji bilî kurdî bi farisî, erebî tirkî dizanî.
4- Ehmedê Xanî di berhema xwe ya bi navê "Mem û Zîn" de li ser evîn, gerdûn, hebûn û mirovan sekiniye.
5- Wî pirtûka xwe ya bi navê "Nûbara Biçûkan" ji bo bingeha perwerdehiya bi kurdî nivîsandiye.

**C- Bikaranîna Zimên**

**1- Di nivîsa li jêr de lêkeran li gorî dema boriya dûdar bikişînin.**

bûye, kirine, daniye, anîne, kiriye, çûye

**2- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.**

1- Celadet Bedirxan di 26'ê Avrêla 1897'an de li Stenbolê hatiye ser rûyê cîhanê.
2- Wî li ser alfabeya kurdî ya latînî û li ser rêzimana kurdî xebatên giranbuha kirine.
3- Wan kovara Hawarê derxistiye.

4- Ji ber ku Celadet Bedirxan û hevalên xwe di 15'ê Gulana 1932'yan de dest bi weşandina kovara Hawarê kiriye.
5- Celadet Bedirxan di sala 1951'ê de koça xwe ya dawîn kiriye.

**3- Di nivîsa li jêr de lêkeran li gorî dema boriya berdest bikişînin.**

dibû, dixemiland, dixist, dikir, dixemiland, dikir, dihejand, dixepirand

**4- Di nivîsa li jêr de lêkeran li gorî çîrokiya dema boriya têdeyî bikişînin.**

hatibû, ketibû, heliyabû, vebûbûn, xemilîbû, gihaştibûn, vegirtibûn

**5- Lêkerên di nava kevanekê de bikin forma çîrokiya dema boriya têdeyî.**

gotibûn, êşiyabûm, kiribû, hiştibû, negirtibû, girtibû

**6- Hevokên li jêr bi cînavka girêkî bigihînin hev.**

1- Ehmedê Xanî ferhengoka ku nivîsand diyarî zarokên kurmancan kir.
2- Bêhna kulîlkên ku te anîbûn ez sermest kirim.
3- Dara ku te par çandibû hişk bûye.
4- Zimanê pirtûka ku te nivîsiye pir dijwar e.
5- Mala ku em duh çûn li taxa apê te bû.

**7- Bi peyvên li jêr ravekên rêzîn çêkin.**

1- avahiya bajêr a herî mezin
2- kurê meta min ê biçûk
3- mijara pirtûka Hêlîm Yûsiv a dawîn
4- kembera xwişka min a zîvîn
5- çalakiya xwendekarên zanîngehê ya li dijî zimankujiyê
6- pirsgirêkên mirovan ên aborî

**8- Bi ravekên li jor hevokan çêkin.**

Bersivên xwendekaran

## UNÎTE 7 CIH Û WAR

**B- Alî û bergeh**

**1- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.**

1- Bajarê Elezîzê li bakurê Amedê ye.
2- Li başûrê Amedê bajarê Mêrdînê heye.
3- Li bakurê rojavayê Amedê bajarê Rihayê heye.
4- Bajarê Mûşê li başûrê rojhilatê Amedê ye.
5- Li rojhilatê Amedê bajarê Êlihê heye.

**C- Bajar**

**1- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.**

1- Agirî bajarekî dîrokî û mezin e.
2- Agirî navê xwe ji Çiyayê Agirî digire.
3- Li bakurê Agiriyê bajarên Qers û Îdirê cih digirin.
4- Li rojhilatê Agiriyê bajarê Makû heye.
5- Mûş û Wan li aliyê başûrê Agiriyê ne.
6- Serjimara navenda Agiriyê nêzîkî sed hezar kesî ye.
7- Çemê Mûradê di nav Agiriyê re derbas dibe.
8- Li Bazîdê Qesra Îsheq Paşa heye.
9- Gora Ehmedê Xanî li Bazîdê ye.

**2- Di nivîsa li jêr de binê daçekên hevedudanî xêz bikin.**

di… de, ji bo, di ser… re, di …de, li ber, li nik, di ser … re, di bin …. re, li nav, li nav , li raser, di …. de, di bin … re, li raser

**3- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.**

1- Perwîn bi balafirê çû Stenbolê.
2- Pismamê wê Serheng, ew pêşwazî kir.
3- Ew bi tramvayê çûn Aksarayê.
4- Mala apê wê li Fatîhê ye.
5- Tengav Asya û Ewropayê ji hev cuda dike.
6- Cihên dîrokî herî zêde li Sultanahmedê ne.
7- Seraya Topkapiyê li Sultanahmedê ye.
8- Darên parkê pir bilind in.

**D- Taxa me**

**1- Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.**

1- Îstasyona trênê di navenda Amedê de li derveyî Sûran e.
2- Kolana Mêrg Ehmed ji navenda Sûran dest pê dike.

3- Kolana Îstasyonê ji Deriyê Rihayê dest pê dike.
4- Kolana Îstasyonê li Qada Îstasyonê bi dawî dibe.
5- Parka Sumerê li hemberî îstasyonê ye.

**E- Ravekirina cih**

**1- Hogir dixwaze ji Qada Newrozê biçe Yarîgeha Kawa, ji wî re cih tarîf bike.**

Tu niha li Qada Newrozê yî, bikeve ser Rêya Berz, dema ku tu gihîştî devê Rêya Qadê bizivire aliyê rastê, heta Kolana Feqiyê Teyran rast biçe. Dema ku tu gihîştî ser Kolana Feqiyê Teyran bizivire aliyê çepê heta ser devê Rêya Şaredariyê ber bi Mizgefta Mezin ve biçe. Berî ku tu bigihêjî Mizgefta Mezin, dagere aliyê rastê, di Rêya Şaredariyê re heta Kolana Beybûnê biçe û ji wir dîsa bizivire aliyê çepê. Gava ku tu ketî vê kolanê, tu yê li aliyê çepê Şaredariya Bajarê Mezin û li aliyê rastê jî Zanîngeha Ehmedê Xanî bibînî. Dema ku gihîştî ber Navenda Bazirganiyê bikeve Kuçeya Werzîşê, tu yê li ser destê çepê Yarîgeha Kawa bibînî.

**F- Avahiya me**

**1- Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.**

1- Mala Dîlanê di avahiyeke mezin û bilind de ye.
2- Avahî yazdeh tebeqe ye.
3- Di her tebeqeyê de çar mal hene.
4-Ji şaneşînê li hawirdorê temaşe dikin.
5- Di avahiyê de du asansor hene.

**G- Odeya Hêlînê**

**1- Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.**

1- Di odeya Hêlînê de du pace hene.
2- Li ber paceya aliyê rastê pirtûxaneyeke piçûk heye.
3- Cildank li aliyê çepê yê pirtûkxaneyê ye.
4- Televîzyon di nava pirtûkxaneyê de ye.
5-Li ber paceya aliyê çepê nivîngehek heye.
6- Xalîçe li ber komîdîn û şîfonyer raxistî ye.

## UNÎTE 7 - SPARTEK

**A- Xebata li ser peyvan**

**1- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.**

1- Bajarê Baxdayê li Iraqê ye.
2- Navê *welat*ê min Germanistan e.
3- Rengê *ala* me kesk û sor û zer e.
4- Li *taxa* me sînemayek heye.
5- *Ziman*ê fermî yê Îranê farisî ye.
6- Bajarê Antaqyayê li ser *tixûb*ê Sûriyiyê ye.
7- Dêrik *navçe*ya Mêrdînê ye.
8- Dara navê *gund*ekî dîrokî yê Nisêbînê ye.
9- Mala me di *kuçe*yeke teng de ye.

**2- Nêçîra Peyvan**

1- şaneşîn, 2- xanî, 3- mal, 4- derî, 5- serşok, 6- pirtûkxane, 7- dîwan, 8 nivîn, 9- têkber, 10- palgeh, 11- hol, 12- cildank

**3- Cihên vala dagirin.**

| Welat | Netewe | Zimanê fermî |
|---|---|---|
| *Tirkiye* | tirk | *tirkî* |
| Almanya | *alman* | almanî |
| Îran | faris | *farisî* |
| Amerîka | amerîkî | *îngilizî* |
| *Japonya* | *japon* | japonî |
| Kûba | *kûbayî* | *îspanî* |
| *Kurdistan* | kurd | *kurdî* |
| Fransa | *frensî* | *frensî* |
| Îngilistan | îngiliz | *îngilizî* |
| *Ermenistan* | ermen | *ermenî* |
| Sûriye | *ereb* | *erebî* |
| Îsraîl | *cihû* | îbranî |

**B- Xwendin**

**1- Rast û çewt**

1- rast, 2- çewt, 3- rast, 4- rast, 5- çewt, 6- çewt, 7- rast, 8- rast, 9- çewt, 10- rast

**2- Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.**

1- Holanda li ser parzemîna Ewropayê ye.
2- Li rojhilatê Holandayê Almanya heye.
3- Serjimara Holandayê 16 milyon e.

4- Sîstema desthilatiya Holandayê parlementerî ye.
5- Zimanê fermî yê Holandayê holandî ye.
6- Navê paytexta Holandayê Amsterdam e.
7- Li bajarê Rotterdamê bendereke navneteweyî heye.
8- Holanda bi dewlemendiya cureyên laleyan navdar e.

**3- Beşên hevokên ku hev temam dikin bigihînin hev.**

1-d, 2-c, 3-f, 4-a, 5-b, 6-e, 7-g

**C- Hîndariyên rêzimanî**

**1- Cihên vala bi daçekan dagirin.**

1- li, 2- di…de , 3- di… re, 4- ji …. re, 5- ji, 6- bi … ve, 7- bi … ve, 8- ji … ve, 9- bi, 10- ji … ve

**2- Cihên vala dagirin.**

1- *Li* duncê rastê cildankek heye.
2- Li *ser* şîfonyerê guldankeke heye.
3- Mala me *di* avahiyeke mezin de ye.
4- Di *bin* maseyê de kursiyek heye.
5- Kolana Mêrg Ehmed *ji* navenda Sûran dest pê dike.
6- Sosin *bi* min re hat dibistanê.
7- Te çima *ji* min re negot?
8- *Di* ber mala me re derbas bû.
9- Min çakêtê xwe *bi* hilço ve daliqand.

**3- Li nexşeyê binêrin û cihên vala dagirin.**

Bajarê Mûşê di *navbera* Bedlîs, Erzerom, Agirî, Çewlik, Amed û Êlihê de ye. Li *bakurê* Mûşê bajarê Erzeromê heye. Li aliyê *rojava* Çewlik heye. Li *başûrê* Mûşê Amed û Êlih hene. Bedlîs li *başûrê rojhilatê* Mûşê ye. Li *bakurê rojhilat* bajarê Agirî heye.

## UNÎTE 8 RAGIHANDIN

**A- Dîroka ragihandinê**

**1-Wateya peyvên li jêr hîn bibin û bi her yekê hevokekê çêkin.**

Bersivên xwendekaran.

**2- Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.**

1- Bêtêl û birûske di sala 1894'an de ji hêla Oliver Lotge ve hatin dahênan.
2- Teknolojiya sînema û radyoyê bi hev re hatin bikaranîn û televîzyon derket holê.
3- Weşana televîzyonê cara pêşîn di sala 1936'an de li Londonê dest pê kir.
4- Telefon di sala 1876'an de ji hêla Graham Bell ve hat dahênan.
5- Bi dahênana telefonê re mesafeya di navbera mirovan de ji holê rabû.

**3- Di nivîsa li jor de binê lêkerên hevokên bi avaniya tebatî xêz bikin.**

hatine kirin / hatin dahênan / hat dahênan / hatin bikaranîn / hatiye kirin

**4- Di nivîsa li jor de binê lêkerên hevokên avaniya tebatî xêz bikin.**

dihat bikaranîn / dihatin şandin / dihatin birêkirin / dihatin kuştin / dihatin nivîsandin / dihatin şandin

**5- Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.**

1- Berê ji ber ku navgînên ragihandinê bi pêş neketibûn tengasî dihatin kişandin.
2- Berê li hin welatan ji bo ragihandinê ragihandinê dûxan, kevok, qasid dihat bikaranîn.
3- Qasid ji hêla rêbiran ve dihatin kuştin.
4- Name bi riya posteberan dihatin şandin.
5- Piştî dahênana telefon û birûskeyê karê ragihandinê hêsantir bû.
6- Ji ber ku navgînên ragihandinên pir bi pêş ketine, ragihandin hêsan û lezgîn bûye.

**6- Nivîsa li jêr bikin avaniya tebatî.**

Berî 15- 20 salan derxistina rojnameyê ji îro dijwartir bû. Niha kompîtur û înternetê kar gelekî hêsan kiriye. Her wiha teknîka çapkirinê jî gelekî bi pêş ketiye. Berê gelek kar bi destan dihatin kirin. Bo nimûme nûçe û nivîs bi destan dihatin nivîsandin.
Ji hêreman ji hêla nûçegihanan ve nûçe dihatin dişandin, ew jî ji hêla tîprêzan ve li ser kompîturê dihatin rêzkirin.
Li rojnameyê du kompîturên biçûk û kompîtureke

mezin hebûn. Tîprêz li ber kompîturên biçûk rûdiniştin, bi destê wan tîprêzî dihat kirin, ji hêla hevalên rûpelsaz ve li ser kompîtura mezin rûpel dihatin çêkirin. Hemû nivîs li ser kaxizê dihatin xwendin û sererastkirin. Paşê jî li cihê montajê fîlmên nivîsan dihatin kişandin û ew fîlm diçûn çapxaneyê.

### B- Kompîtur û înternet

**1- Pirsên jêrîn li gorî nivîsa jorîn bibersivînin.**

1- Amûra serdema nû ya herî girîng *kompîtur* e.
2- Di *înternetê* de gelek malper hene.
3- Ji *malperan* gelek agahiyên pêwîst tên bidestxistin.
4- Êdî li şûna nameyan tîşkename tên şandin.
5- Di înternetê de ji bo ragihandinê *peyamhinêr* jî tê bikaranîn.
6- Bi riya telefona destan *peyam* û *wêne* tên şandin.

**2- Peyvên li jêr di cihê vala de bi cih bikin.**

1- Ji bo parastina daristanan hinek divê *bergirî.* werin girtin.
2- Me pirtûka xwe amade kir û ji bo çapê şand çapxaneyê.
3- Di sala 1995'an de yekemîn televîzyona kurdî dest bi *weşanê*.kir.
4- Îsal dibe ku pîrozbahiya Newroza di televîzyonê de bi awayekî *zindî* bê weşandin.
5- Kes şer naxwaze *pêdiviya* civakê bi aştî û aramiyê heye.

### C- Weşana bi kurdî

**1- Kî dizane?**

1-d, 2-b, 3-c, 4- c

**2- Pirsên jêrîn li gorî nivîsa jorîn bibersivînin.**

1- Yekemîn rojnameya kurdan Kurdistan e.
2- Rojnameya Kurdistanê li Qahîreyê dest bi weşanê kiriye.
4- Di destpêka sedsala bîstan de li Stenbolê kovarên bi navê Jîn (1918), Hetawî Kurd / Rojî Kurd (1913), Kurdistan hatine derxistin.
5- Di sala 2007'an de li Bakur zêdetirî sed pirtûkî hatine çapkirin.

**3- Pirsên jêrîn li gorî nivîsa jorîn bibersivînin.**

1- Di dîrokê de yekemîn radyoya ku bi kurdî weşan kiriye Şerq el Adna ye.
2- Radyoya Şerq el Adnayê ji hêla Brîtanyayê ve hatiye damezirandin.
3- Radyoya Levant heta sala 1946'an weşana xwe domandiye.
4- Di dîroka ragihandinê ya kurdan de radyoyên Êrîvan, Tehran û Baxdayê pir girîng in.

**4- Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.**

1- Yekemîn televîzyona bi kurdî Xebat Tv ye.
2- Xebat Tv di sala 1992'yan de dest bi weşanê kiriye.
3- Yekemîn televîzyona peykî Med Tv ye.
4- Roj Tv, MMC, Kurdistan TV, KurdSat, Zagros Tv.

## UNÎTE 8 - SPARTEK

### A- Xebata li ser peyvan

**1- Xaçepirs**

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | M | A | L | P | E | R | | N | A |
| 2 | E | R | Ê | | K | O | M | A | R |
| 3 | M | | N | E | | J | A | N | |
| 4 | | N | Û | | K | A | L | | Û |
| 5 | M | A | S | Î | | V | Î | N | |
| 6 | Ê | | K | | W | A | | Ê | N |
| 7 | R | B | | Ş | A | | A | R | Û |
| 8 | G | E | R | Î | N | E | K | | Ç |
| 9 | | N | Û | N | E | R | | R | E |

**2- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.**

1- Televîzyon *dîmenên* bûyeran pêşkêşî mirov dike.
2- Di nivîsandina *birûskeyan* de alfabeya Morsê tê bikaranîn.

3- Bi telefonê *wêne* û dîmen tên kişandin, peyam têne şandin.
4- Ew her roj li namedanka xwe dinêre û *tîşkenameyên* xwe dixwîne.
5- Ez duh ketim înternetê min *malpera* dibistana me vekir.
6- Hogir îro bi riya *peyamhinêrê* bi min re axivî.

**B- Xwendin**

**1- Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.**

1- Mîhrîcana Cizîrê îsal di navbera 10 û 12'ê mehê tê lidarxistin.
2- Bername ji hêla Şaredarê Cizîrê Aydin Budak ve hate pêşkêşkirin.
3- Li gorî bernameyê dê ji Îran, Sûriye, Iraqê mêvan beşdar bibin.
4- Mîhrîcan îsal bi dirûşma "Azadiya zimên azadiya welêt e!" tê lidarxistin.
5- Di mîhrîcana îsal de dê folklor, şano, fîlm, pêşangeh, gotûbêj, xwendina helbestan, dîwana dengbêjan û çalakiyên zarokan werin pêşkêşkirin.

**C- Bikaranîna zimên**

**1- Van hevokan li gorî demên destnîşankirî biguherînin.**

1- Li ber mala me dibistaneke nû *hat* avakirin.
2- Par zêdetirî sed pirtûkên bi kurdî *hatine* weşandin.
3- Îsal li Amedê mîhrîcaneke mezin *tê* lidarxistin.
4- Li Amedê dê fîlmê Bahoz *were* nîşandayîn.
5- Di destpêka sedsala nozdehan li Stenbolê gelek kovarên kurdî *hatin* weşandin.

**2- Van hevokên bi avaniya lebatî bikin forma tebatî.**

1- Rojnameya Kurdistan di sala 1898'an de ji hêla Mîqdat Mîthat Bedirxan ve hat derxistin.
2- Nûbara Biçûkan di sala 1684'an de bi destê Ehmedê Xanî hat nivîsandin.
3- Radyoya Levant di sala 1941'ê de ji hêla hikûmeta Fransayê ve hatiye avakirin.
4- Heta niha zêdetirî bîst televîzyonên peykê ji hêla kurdan hatine vekirin.
5- Her sal di 22'yê rêbendanê de avabûna Komara Mehabadê ji hêla kurdan ve tê pîrozkirin.
6- Sala bê dê gelek parkên ku ji hêla Şaredariya Amedê ve bên vekirin.

**3- Cihên vala bi lêkera alîkar "hatin"ê dagirin.**

1- Li her derê kulîlk *hatin* çandin .
2- Her roj mirovên azadîxwaz *tên* girtin.
3- Îro nebe jî sibe dê çareya şêrpenceyê *were* dîtin.
4- Pirtûka Mehmed Uzun Siya Evînê *hatiye* nasandin.
5- Dibe ku hefteya bê li komeleyê civînek *were* lidarxistin.
6- Heke rojname bi rêkûpêk *bê* weşandin, dê pir bê xwendin.
7- Dema ku rastî *were* dîtin, dê gelek tişt zelal bibin.
8- Îsal bi zimanê kurdî gelek behrem *hatine* weşandin.
9- Berî du salan li Amedê Sempozyûma Ehmedê Xanî *hatibû* lidarxistin.
10- Par vê demê li gundê me hê dibistan *nehatibû* avakirin.

**4- Lêkera "hatin"ê li gorî demê bikişînin.**

Xelata Nobelê ya Wêjeyê Herta Muller wergirt (09/10/2009)
Xelata Nobelê ya Wêjeyê ku her sal bi awayekî kevneşopî ji aliyê Akademiya Swêdê ve *tê* dayîn îsal nivîskar Herta Muller wergirt. Herta Muller di sala 1953'yan de li Romanyayê hatiye ser rûyê cîhanê lê wekî nivîskareke alman *tê* nasîn. Nivîskara alman ku hêjayî xelata Nobelê ya îsal hat dîtin, dê wekî xelat 1.4 mîlyon dolar wergire. Akademiya Swêdê der barê mijarê de daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de wiha *hatiye* gotin: "Ew bi xurtiya helbestê û zelaliya pexşanê cîhana feqîran baş taswîr dike, lewma ew şayanî xelatê *hatiye* dîtin."
Xelata Nobelê ya Wêjeyê ji sala 1960'î heta niha her sal wekî kevneşopiyekê *tê* dayîn û Herta Muller 51'emîn xelatgira Nobelê ye. Heta niha nivîskarên wekî Jean-Paul Sartre, Pablo Nerûda, Samuel Beckett, Gabriel Garcia Marquez, Dario Fo, Harold Pinter, Orhan Pamûk û gelek nivîskarên din hêjayî xelatê *hatine* dîtin.


**Nivîs**
Bersivên xwendekaran

# TAYBETIYÊN ZIMANÊ KURDÎ

## Taybetiyên giştî

❖ Kurdî zimanekî hînd-ewropî ye. Di nav koma zimanên îranî de cih digire. Bi gelek taybetiyên xwe dişibe zimanê farisî, peştûyî, belûcî. Kurdî zimanekî bakurê rojavayê Îranê ye.

## NEXŞEYA ZARAVAYÊN KURDÎ




Li ser zaravayên kurdî lihevkirineke giştî nîn e. Dema mirov bala xwe dide tabloya jorîn mirov dibîne ku ji kurdiya qedîm sê şax derdikevin, şaxa aliyê rastê kurmanciya jorîn û kurmanciya navîn (soranî) pêk tîne, şaxa aliyê çepê dimilî û hewramî pêk tîne. Şaxa sêyem jî kurdiya jêrîn pêk tîne. Mijara zaravayan serê pêşîn di pirtûka dîroka kurd a Şerefxanê Bedlîsî, Şerefnameyê[1] de cih girtiye. Di wê pirtûkê de li ser zaravayên kurdî wiha hatiye gotin:

**1)** Kurmancî
**2)** Lorî
**3)** Kelhûrî
**4)** Goranî

❖ Niha bi gelemperî zaravayên kurdî wekî kurmancî, soranî, kirmanckî, hewramî û lorî têne binavkirin.

[1] Şerefxanê Bidlîsî, Şerefname, Hasat Yayınları, İkinci Baskı, İstanbul 1998.

- ❖ Kurdî zimanekî du-rayekî (absolutive) ye. Di lêkerên kurdî de du rayek hene; rayeka dema borî û rayeka dema niha.

***Mînak:***

| ***Lêker*** | ***rayeka dema borî*** | ***rayeka dema niha*** |
|---|---|---|
| *Xwarin* | *xwar* | *xw (di-xw-e)* |
| *Ketin* | *ket* | *kev (di-kev-e)* |
| *Firotin* | *firot* | *firoş (di-firoş-e)* |

Ev taybetiyeke zimanên îranî ye. Wan ji zimanên din cuda dike. Bo nimûne tirkî zimanekî yekrayekî ye. Rayeka tirkî her tim raweya fermanî ye.

***Mînak:*** *git, gel, yap, gör, söyle, getir…*

- ❖ Kurdî bi zaravayên xwe yên bakur zimanekî zayendî ye. Zayend di zaravayê dimilkî de ji kurmancî zêdetir hatiye parastin. Di zaravayên Başûr de zayend ji holê rabûye.

  Di kurdî de digel zayenda fîzyolojîk, navdêr, cînavk xwediyê zayenda rêzimanî ne. Bo nimûne, derî peyveke nêr e, mal peyvekê mê ye. Di zaravayê kurmancî de di cînavk û navdêran de zayend heye, lê belê di zaravayê kirmanckî de di lêkeran de jî zayend bandora xwe nîşan dide.

***Mînak***: *<u>No ferheng</u>, grûba xebate ya Kovara Vateyî amade kerd<u>o</u>.*[2]

- ❖ Kurdî zimanekî nîv-ergatîv e. Wate, kurdî bi tenê di demên borî de zimanekî ergatîv e. Di vê demê de lêker dikeve bin bandora bireserê ango bireser (obje/tişte) cihê kirdeyê (subje) digire.

***Mînak:***

*Te <u>ez</u> dît<u>im</u>.*

*Min <u>tu</u> dît<u>î</u>.*
*Wan <u>ew</u> dît<u>ø</u>.*
*Min <u>ew</u> dît<u>in</u>.*

- ❖ Kurdî zimanekî tewangbar e. Peyv li gorî cih û rewşa xwe qertafan digirin an jî têne guhartin. Di kurdî de mêjer û zayendên navdêran bi riya tewangê têne nîşandayîn.

***Mînak:***

*Ez kulîlk<u>ê</u> bêhn dikim.*
*Tu nan<u>î</u> dixwî.*
*Ew sêv<u>an</u> berhev dike.*

- ❖ Kurdî zimanekî qertafî ye. Di kurdî de hem paşgir, hem pêşgir hem jî navgir hene.

---

[2] http://www.vateonline.se/

### Mînak:

| ***Peyvên bi pêşgiran*** | ***Peyvên navgiran*** | ***peyvên bi paşgiran*** |
|---|---|---|
| *Îro* | *keskesor* | *derî* |
| *Vebûn* | *seranser* | *zêrîn* |
| *Zirtilî* | *xebat* | *dilêr* |

## TAYBETIYÊN KURMANCÎ

### Denganî:

Di kurdî de 31 dengên bingehîn hene. Ji bo van dengên bingehîn nîşane ango tîp hatine diyarkirin. Dengên bingehîn ên kurdî ev in:

A, B, C, Ç, D, E, Ê, F, G, H, I, Î, J, K, L, M, N, O, P, Q, R, S, Ş, T, U, Û, V, W, X, Y, Z

**Dengdar:** b, c, ç, d, f, g, h, j, k, l, m, n, p, q, r, s, ş, t, v, w, x, y, z
**Dengdêr:** a, e, ê, i, î, o, u, û
**Pevdeng:** xw
**Kurt:** e, i, u
**Dirêj:** a, ê, î, o, û

### Hevrûkirina deng û tîpan

| **E** | **Ê** | **I** | **Î** | **U** | **Û** | **V** | **W** |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| *ker* | *kêr* | *jin* | *jîn* | *du* | *dû* | *dev* | *dew* |
| *zer* | *zêr* | *şiv* | *şîv* | *tu* | *tû* | *ev* | *ew* |
| *der* | *dêr* | *pir* | *pîr* | *kur* | *kûr* | *vir* | *wir* |
| *şer* | *şêr* | *dil* | *dîl* | *kuçik* | *kûçik* | *vî* | *wî* |

**Pevdeng: xw**

xwarin, xwîn, xwişk, xwedî, xwelî

## RENGEDENG

Ji bilî van dengan hinek rengedeng jî hene, her çiqas niha di nav kurdan de li ser wan nîqaş hebin jî ji bo wan di kurmancî de tîp nehatine diyarkirin. Tîpên mîna "ç, k, p, t" du-reng in.

| **Nerm** | **Hişk** |
|---|---|
| */ç/ çem, çav, çek* | *çi, çol, çend* |
| */k/ kew, kakil, kanî, kêm* | *kar, kaş, kef,* |
| */p/ panî, pêçî, pêr* | *pehlewan, paq, par (pişk)* |
| */t/ teng, ter, tu, tivir* | *tu (hîç), tim, tas* |

Ji bilî wan tîpên “l, r” jî dureng in. Ji bilî “r” û “l”ya asayî, rengê lerzok ê van dengan jî heye. Hinek nivîskar ji bo van rengedengan tîpên dubarekirî “rr” û “ll” bi kar tînin. Her wekî “gellek”, “birrek” û hwd. Ji xeynî van dengan hinek dengên mîna “eyn, he, xeyn” ku bi bandora zimanê aramî (erebî û aşûrî) ketine zimanê kurdî hene. Ji bo destnîşankirina van dengên erebî hin caran li ber tîpên asayî dabir (‘) tê bikaranîn. Lê ev yek bi piranî di xebatên tîpguhêziyê de heye. Ji bo zimanê rojane ne pêwîst e.

Di kurmancî de du dengên ji hev nayên ber hev. Lê belê di peyvên pêkhatî de carinan rewşên awarte derdikevin. Di vî warî de di navbera zimanzanên kurd de lihevkirineke giştî nîn e. Her wiha di kurmancî de du tîpên dengdêr jî nayên ber hev, heke bên ber hev jî tîpên alîkar ango tîpên kelijandinê (h, w, y) dikevin navberê. Lê peyvên hevedudanî û di kişandina lêkeran de rewşên awarte derdikevin holê. Her wekî biaxive, diêşe, biaqil … Hin caran bi domana demê re ziman bi xwe vê aloziyê ji holê radike. Bo nimûne “diavêje” dibe “davêje”, biaxive dibe “baxive”, “biaqil” dibe “baqil” û hwd. Hinek formên mîna “têşe (diêşe)”, “tavêje (diavêje)” pêk hatine, lê ev form hê neketine zimanê nivîskî. Wisa xuya dike ku dê ziman bi xwe vê aloziyê bi domana demê re ji holê rake.

## Têkiliya nîv-dengdêr û dengdêran

Di kurmancî de têkiliya dengdêrên dirêj û nîv-dengdêrên ku mîna dengên alîkar an jî tîpên kelijandinê têne binavkirin, tim bûye mijara nîqaşan. Lê tiştekî zelal heye ku di kurmancî de van her du cure dengan her tim bandor li hev kiriye û di peyvan de bûne sedema hinek guherînan. Nemaze jî ew ên ku jêderka wan yek e. Her wekî “î” û “y”, “û” û “w” bi awayekî berbiçav bandorê li hev dikin. Her wiha li ser vê bingehê Celadet Bedirxanî gotiye, “î”ya berî dengê “y” kurt dibe û dibe “i”, “û”ya berî “w”yê jî dîsa bi heman awayî kurt dibe, dibe “u”, ew jî gelek caran dibe “i”.

Piraniya zimanzanên kurd der barê bandora van dengan a li ser hev de li hev dikin, lê belê hinek ji wan vê yekê wekî rêzikeke rastnivîsê di nav zimanê nivîskî de bi cih dikin, hinek jî vê yekê napejirînin. Me di vê pirtûka xwe de her wekî Celadet Bedirxan guhartina van tîpan wekî rêzikekê destnîşan kiriye.

Encameke din a têkiliya her du cureyên dengan jî di dirûvê hinek peyvan de derdikeve holê. Dema ku mirov bala xwe dide devokên kurdî, mirov vê yekê bi awayekî zelal dibîne. Peyvên ku bi nîv-dengdêra “h” diqedin, dengdêrên berî wê kurt in. Lê dema ku “h” ji holê radibe, dengdêreke dirêj cihê dengdêra kurt digire. Her wekî *çehv/çav, sih/sî, rih /rî, cih/cî, xwehr/xwar, buhtan/botan, cuh/co, duht/dot…* Ji van forman her du jî rast in, lê wisa xuya dike ku forma kurt ango forma bi dengdêra dirêj zêdetir cihê xwe di nav zimên de digire.

## PEYVSAZÎ

Di kurdî de hinek peyv xwerû, hinek jî dariştî ne. Peyv di kurdî de bi çend awayan têne dariştin.

1- Çend peyvên serbixwe li gorî rêz û rêçikan têne ber hev û peyveke nû pêk tînin. Ji van peyvan re peyvên hevedudanî tê gotin.

**Mînak:** gulav, çavreş, jinbira, sorgul…

2- Peyvek hinek qertafan (pêşgir, paşgir, navgir) werdigire û peyveke nû pêk tê.

**Mînak:** **zir**bav, kêr**î**, gul**an**, **î**şev, **ra**girtin, vir**ek**, nîv**e**nîv ...

3- Her wiha dibe ku lêkereke hevedudanî, qertafinan bigire û lêkereke kompleks pêk bîne.

**Mînak:** çavreşî, balafirgeh, şevbuhêrk, rojhilat, xebatkar…

## Di kurdî de dem û rawe

Di kurdî de lêker di rewşa asayî de di forma raderî de ne. Lêkerên raderî navdêr in, ji aliyê zayendê ve jî mê ne.

Dema ku lêker li gorî raweyan têne kişandin hinek dirûvan werdigirin. Di kurdî de hemû dem û rawe li ser bingeha durayekiyê teşe digirin. Di dema pêkanîna raweyan de lêker sê formên bingehîn werdigire.

1- Raweyên bûyerên pêknehatî (fermanî, bilanî, divêtî, hekanî, dema bê, xwestekî) û hwd. Di pêkhatina van raweyan de qertafa “bi” tê ber rayeka lêkerê. Heke hê dema bûyerê derbas nebûbe, rayeka dema niha ya lêkerê tê rex qertafa “bi”, lê heke dema wê borî be, rayeka dema borî tê rex. Piştre jî qertafên kes û raweyê tên.

### Ji bo bûyerên ku dema wan derbas nebûye

| Peyv û daçekên raweyî | Kes | Lêker (anîn) | Navê raweyan |
|---|---|---|---|
| | tu / hûn | bîne / binîn | fermanî |
| bila | ew (yekjimar)<br>ew (pirjimar) | bîne / binîn | bilanî |
| xwezî | | bîne / binîn | xwestekî |
| divê | | bîne / binîn | divêtî |
| heke | | bîne / binîn | hekanî (merc) |
| dê | | bîne / binîn | dema bê |
| dike | | bîne / binîn | dema bê ya nêzîk |

### Ji bo bûyerên derbasbûyî

| Peyv û daçekên raweyî | Kes | Lêker (kirin) | Navê raweyan |
|---|---|---|---|
| bila | wî / wê | bikira/ bikirana | bilanî |
| xwezî | | bikira/ bikirana | xwestekî |
| divê | | bikira/ bikirana | divêtî |
| heke | | bikira/ bikirana | hekanî (merc) |
| dê | | bikira/ bikirana | çîrokiya dema bê |

2- Raweya di qonaxa pêkhatinê de dema niha ye. Di dema niha de qertafa “di” tê pêşiya rayeka dema niha ya lêkerê û piştre jî qertafên kesane tên.

**Mînak:** dike, diçe, dibe, dixwe...

3- Hemû demên borî li ser rayeka dema borî pêk tên. Hinek ji wan demên xwerû ne, hinek jî hevedudanî ne. Rayeka dema borî hinek qertafan werdigire û bi vî awayî dem pêk tên. Di demên borî de ji ber ku di kurdî de ergatîvî heye, lêkerên gerguhêz û yên negerguhêz ji hev cuda têne kişandin. Lêkerên gerguhêz li gorî bireserê têne kişandin. Di lêkerên gerguhêz de bireser xwerû, kirde tewandî ye, ji aliyê kes û mêjerê ve lêker bi bireserê re lihevkirî ye. Lê belê lêkerên negerguhêz ji ber ku bireserê nagirin, lêker li gorî kirde têne kişandin.

**Mînak:**

### Lêkerên gerguhêz

| Lêker | Kirde | Bireser | Dem (yekjimar) | Dem (pirjimar | Navên deman |
|---|---|---|---|---|---|
| xwendin | min | pirtûk (yekjimar) / pirtûk (pirjimar) | xwend | xwendin | Dema boriya têdeyî |
| | te | | xwendiye | xwendine | Dema boriya dûdar |
| | wî/wê | | dixwend | dixwendin | Dema boriya berdest |
| | me | | xwendibû | xwendibûn | Çîrokiya dema boriya têdeyî |
| | we | | | | |
| | wan | | | | |

### Lêkerên Negerguhêz

| Lêker | Kirde | D. B. Têdeyî | D. B. Dûdar | D. B. Berdest | Ç. D. B. Têdeyî |
|---|---|---|---|---|---|
| hatin | ez | hatim | hatime | dihatim | hatibûm |
| | tu | hatî | hatiye | dihatî | hatibûyî |
| | ew | hat | hatiye | dihat | hatibû |
| | em | hatin | hatine | dihatin | hatibûn |
| | hûn | hatin | hatine | dihatin | hatibûn |
| | ew | hatin | hatine | dihatin | hatibûn |

# Dengên kurdî bi alfabeya navneteweyî ya fonetîk (IPA)

| Tîpên kurdî | IPA | Mînak (kurdî) | Mînak (IPA) |
|---|---|---|---|
| a | [ɑ] | bav | [bɑv] |
| b | [b] | ber | [bæɾ] |
| c | [dʒ] | cih | [dʒɪh] |
| ç | [tʃʰ] | çar | [tʃʰɑɾ] |
| ç | [tʃˤ] | çav | [tʃˤav] |
| d | [d] | dar | [daɾ] |
| e | [æ] | berhem | [bæɾhæm] |
| ê | [e] | hêz | [hez] |
| f | [f] | find | [fɪnd] |
| g | [g] | gul | [gʊl] |
| h | [h] | havîn | [havin] |
| i | [ɪ] | dil | [dɪl] |
| î | [i] | nîv | [niv] |
| j | [ʒ] | jar | [ʒaɾ] |
| k | [kʰ] | kurd | [kʰʊɾd] |
| k | [kˤ] | kur | [kˤʊɾ] |
| l | [l] | lêv | [lev] |
| m | [m] | mar | [maɾ] |
| n | [n] | nav | [nav] |
| o | [o] | nod | [nod] |
| p | [pʰ] | pir | [pʰɪɾ] |
| p | [pˤ] | pênc | [pˤendʒ] |
| q | [q] | qad | [qad] |
| r | [ɾ] | kirin | [kˤɪɾɪn] |
| r | [r] | kirîn | [kʰɪrin] |
| s | [s] | sêv | [sev] |
| ş | [ʃ] | şîr | [ʃiɾ] |
| t | [tʰ] | tev | [tʰæv] |
| t | [tˤ] | tarî | [tˤaɾi] |
| u | [ʊ] | du | [dʊ] |
| û | [u] | bûn | [bun] |
| v | [v] | tav | [tˤav] |
| w | [w] | wan | [wan] |
| x | [x] | xanî | [xani] |
| x | [ɣ] | xar | [ɣaɾ] |
| y | [j] | yek | [jækˤ] |
| z | [z] | zêr | [zeɾ] |